


BARÎÊ BALA

ZERDEŞTÊ KAL



BARÎÊ BALA

ZERDEŞTÊ KAL

(POÊZÎA Û NIVÎSARA VEKIRÎ)

*Berevok Nûrê SERDARYANÊ (Nûra Emerîk)
bona weşanê amade kirye.*

Yêrêvan  "VMV-PRÎNT"
2015

ՀՏԴ 821.222.5 Բալա
ԳՄԴ 84(5-Քուրդ)
Բ 200

Բալա Բարիե
Բ 200 Ծեր Զրադաշտը/Բարիե Բալա.- Եր.:
ՎՄՎ-Պրինտ, 2015.- 188 էջ:

Vê berevoka Barîê Balada ew efrandin hatine
cîwarkirinê, ku xudan van salê dawîê nivîsîne û tu ciya nehatine
weşandinê. Xênji wê hetanî nha çend berevokê wî bi zimanê
kurdî, yek jî bi wergêra rûsî hatine weşandinê. Berevokê wî
Başûrê Kurdistanê, Dihokêda ronkayî dîtye.

ՀՏԴ 821.222.5 Բալա
ԳՄԴ 84(5-Քուրդ)

ISBN 978-9939-60-294-3

© Բարիե Բալա, 2015



***Xwezil, xwezil vê duhezar panzdê salê
Dost, aşîti tijî bibe tamam dinê.
Ezman-ersê welatê min bibe zelal,
Em jî rehet buxun parî nanê helal.***

B. Bala

ÇEND GILÎ DERHEQA XUDAN Û EFRANDINÊ WÎDA

Helbestvan, nivîskar, dramatûrg û şuxulkarê kurdî civkî Barîê Bala (Balaêv Baro Elîêvîç) sala 1937-a gundê Dêmîrçîê nehya Masîsê, Ermenîstan, mala kurdaye sadedda hatye dinê. Bavê wî Elîê Paşaê Miho tevî Şerê Wetenîyî mezin bûye û sala 1943-a şehîd ketye. Dayîka wî Qaza Evdoê Bişo tenê heyşt zaro xwey kirine û mezin kirine: hevt kur û dotek.

Gava sala 1958-a Barîê Bala mekteba gunde navîn xilaz kir, hema wê salê jî fakûltêta dîrokê-filologîê ya para azîrbêcanî ya înstîtûta Yêrêvanêye pêdagogîêye ser navê X.Abovyanda tê qebûlkirinê. Paşî xilazkirina înstîtûtê sala 1963-a B.Bala çend sala mekteba navînda xebitye çawa dersdar, paşê bûye înrûktorê ziman û wêjea azêrî û kurdî ya wezîreta Ermenîstanêye ronkayê. Ew usa jî wedekî dirêj bûye dîrêktorê sovxozeke nehya Masîsê.

Sala 1989-a wextê şerê bona Qerebax'a Ç'ya mala B.Bala tevî gelek kurdê musulman barkir, ji Ermenîstanê çû. Pêşî çû Azîrbêcanê, paşê cîguhasî Qazaxstanê bû, çû bajarê Alma-Ataê. Hetanî nha jî ew wêderê dijî û bi aktîvî tevî jiyana cîvakî dibe – ew hesab dibe rîspê olka kurdaye li Qazaxstanê.

Efrandinê Barîê Bala bi dewlemendbûna janrava berbiç'evin. Helbestara tevayî ew usa jî nivîsara vekirî dinivîse. Ew him romanok ("Dayîka Werdek û kevîrê reş", "Gundê me mezin bû", "Ez û kevokê tenê" û yêd mayîn), him pêş ("Salih û Gulistan", "Seyran", "Nado û Narê", "Têlî û Miho"), him bîranînin ("Seyda Şamil", "Qencî naê bîrkinê", "Derheqa Wezîrê Nadîrîda" û yêd mayîn).

Pirtûka Barîê Balaye pêşin "Dinya min" sala 1974-a Yêrêvanêda ronkayî dîtye. Berevoka wîye duda îdî Bekûêda hate weşandinê û navê wê haye: "Kuda herim". Salê dawîêda pirtûkê wîye mayîn hatine çapkirinê: "Dîlbera min" (2008), "Dayîk" (2009), "Kulîlkên neç'ilmisî" (2011), "Deh bûyer" (2012) û pirtûka bi zimanê rûsî wergerandî "Ez û kevokê tenê" (2014). Xênjî wê, berevokê helbestê B.Bala Dihokêda (Başûrê Kurdistanê) hatye weşandinê.

Têma helbest û poêmê Barîê Bala cuda-cudaye, lê bingehî ew welatparêzî, têma dayîkê, fikrê filosofiêne derheqa jiyana merivayêda û, hilbet, evîntî.

Ew bi hizkirineke mezin derheqa dayîkêda dinivîse, tê bêjî ewê dike pêxember. Çawa şedê wê yekê em dikarin van xetê ji helbesta "Dayîk, tu welatî" bînin:

*Tu ku heyî, dinya şêne,
Tu tunenî, dinya şîne.
Rûê erdê qulbe tuyî,
Xwedê pêştir, mezin tuyî.*

Ez dixwazim dha hûrgilî ser têmatîka poêzîa Barîê Balaye welatparêzîê bisekinim.

Helbestvan wedera gav dide. Ew bi dikovanî derheqa

qewmandinê wê herêmêda dinivîse, ku îro tabetîê nadine merivayê. Gilî derheqa wan bûyeradane, ku sala 2014-a Şengalêda, Kobanîê û Mûsilêda qewimîne, rûê çida bi hezara merîê amûtam bûne şehîdê îslamîstê devbixwîn. Helbesteke bi wê têmaê ha tê navkirinê: "Merivê dinê, rica dikim, hemû werin!". Aha B.Bala derheqa rewşa penaberê êzdyada çawa dinivîse:

*Bistan devê dergûşada,
Dê şehîdîn, şîr tunene,
Kal-pîr mane nav êgirda,
Zare, zarîn, rehm tunene.*

*Sêwî ketine nav ç'îane,
Bav, dê pêş wan şerjê kirine,
Ne sî heye, ne jî sitar,
Laşa nakin bin axa sar.*

Helbestvan gelekî bi dilşewatî derheqa wê yekêda dinivîse, çî ku ser axa welatê wî diqewime:

*Zimanê me yasax kirne,
Hebûna me talan kirne.
Bombên jerê dixulqînîn,
Ser axa me dicêrbînîn.
Dengê tanka, ji teyara
Sewiqîne, zarên bera.
Em dizêrin, ew kêf dikin,
Zulmê ser me zêde dikin.
("Mirovên dinê")*

Hilbet, çûyîna helbestvane pêşin welatê kal-bava – Kurdistanê – nikaribû hukumê xwe ser efrandarya helbestvan nehîşt. Helbesta wîye “Welatê dê. Dihoka rengîn” derheqa wê yekêdane û bi hewas-hijmekar derheqa wan wargada dinivîse, çi ku ber ç’evê xwe dîtye.

*Ç’ya-banî, seyrangehên te min dîtin,
Qelfe-qelfe nazenînên te min dîtin.
Gora nemir Kek Barzanî min tewaf kir,
Li Hewlêrê, Sulêmanyê firavîn kir.
Zexoê, Şêxanê, Lalişê mêzekir,
Şeqlewaê, Saleddînî temaşekir.
Hesret dilê minda nema, kûr bîn kişand,
Ç’eva bê min ji şabûna hêsir reşand.*

Xem-xiyalê helbestvan ewin, wekî Kurdistan yektî û serbestbe. Em tenê du çarxeta bînin:

*Tew hidûdên herçar parç’a bîn hildanê,
Bê xof vebin rê û dirbên Kurdistanê.
Yek Kurdistan nexşê dinê bigre cîe,
Zincîr qutbin, bimre mejî koletîye.
 (“Xwezil, xwezil”)*

*Tank, teyare mekin gujîn, teqe, reqe,
Her çar parç’e tevî hevbin, bibin yeke.
Serokê me derkeve ji hepsa terî,
Neyar qutbin pêş heqîê, bikin zarî.
 (“Ya Rebbê Jor”)*

Poêma “Zerdeştê Kal” jî bi ruhê welatparêzîyê bilind perwerdekirîye. Her xetekêda dilêşya helbestvan tê kivşê bona wê rewşê, ku gelê kurd têdane. Ew usa jî zevtkirê wetenê me gunekar dike. Ev para poêmê ser bingeha himberîhevkirinê hatye nivîsarê, û eva yeka alîkarîê dide poêm hêsa û hewaskar bê xwendinê. Aha pareke biç’ûk:

*Em bûn sexîr, ew tîr dewlet,
Em bûn feqîr, wî girt dewet.
Av me anî, ewî vexwar,
Em bûn bedbext, ew bextewar.*

Dixwazim usa jî bidme kivşê, wekî hetanî helbestê lîrîkîê û evîntîê jî bi ruhê welatparêzîê perwerdekirîne.

*Wê ala meye kesk, sor, spî
Binikîne pir bilindcî.
Serxwebûnê elam bike,
Cejna min, te pîroz bike.
 (“Nazika bedew”)*

Efrandarya B.Balada cîkî berbiç’ev digrin şuxulê bona zaroka. Ewana kurtin, anegorî fikrandina zarokanin, rîtmîkin û hêsa tene bîranînê. Nimûnê poêzîa bona zaroka her berevokêke helbestvanda hene. Vê berevokêda ew 2 helbestin (“Hirç’ika min” û “Kurik û qeşav”) û ç’îrokeke biç’ûke (“Gul û Gulçîn”).

Fikrê filosofîê derheqa jiyan, mirinê, qencî û xiravîê, heqî û neheqîê, aqilbendîê ne tenê janra Çarxetada, lê usa jî sîkla “Hevt bûyer”-ada tene kivşê.

Efrandarya B.Bala usa jî bi ruhê zargotinê perwerdekirîye. Ew yek her efrandineke wîda tê kivşê. Xudan bi merdane mesele, meteloka, îdfoma, zûgotinoka, dua-dirozga, nîfira dide xebatê û usa jî bi hûrgilî derheqa gelek erf-edetê gelerîda dinivîse. Ew usa jî berk dertê dijî erf-edetê kevne, ziyandar: zewac-mêrkirina qewm-pismamê nêzîk (nivîsar “Bila dilî dilbe”), gava nahêlin qîz bixûnin (pîesa “Seyran”) û hwd.

Barîê Bala berk terevdarê mala qewîne û xweykirina qîmetîê malêye. Ew yek îlahî “Şîretname”-da tê kivşê, ku pêşkêşî herdu lawê xwe kirine – Elî û Anar. Para helbestê rewakirîda helbestê pêşkêşî nevîê wî kirîne hene: Qadir, Norhan, Medîna, Celîl û yêd mayîn.

Eva berevoka Barîê Balaye bi sirê pêşkêşa wîye bi dile bona xwendevanê kurd û em bawerin, wekî ewê ji alîê wanda baş bê qebûlkinê.

*Nûrê SERDARYAN (Nûra Emerîk),
endama Yekîtya nivîskarê Ermenîstanê,
endama PENa Kurd.*

*Yêrêvan,
s.2015-a.*

POÊZÎA



WETENHIZÎ



YA REBBÊ JOR

Xwezil, xwezil vê duhezar panzdê salê
Dost, aşîti tijî bibe tamam dinê.
Ezman-ersê welatê min bibe zelal,
Em jî rehet buxun parî nanê helal.
Tank, teyare mekin gujîn, teqe, reqe,
Her çar parç'e tevî hevbin, bibin yeke.
Serokê me derkeve ji hepsa terî,
Neyar qutbin pêş heqîê, bikin zarî.
Zor nemîne, mejî wînrêj, ne xwînxare,
Bombên jerê jêrda meên xare.
Welatê me şênbe, bibe rewş gulistan,
Dost û hogir kom-kom bibin li wê mêvan.
Ala kesk, sor, spî bê xanê nav alada,
Govend, dîlan tijî bibin bajar, gunda.
Bê xof, aza tew gelê xwe ez bibînim,
Eyd û şayên, pîrozbaya dûr nemînim.
Îdî sihkîm Xwedî îznîm li vê dinê,
Aza bijîm heya gava ber mirinê.

HELBESTVAN KÎYE

Ç'ev, bînaê gelê xune,
Jan û êşên gelra ku tên,
Gel ewiltir ew dibîne,
Diaxive, nahêvşîne.

Zar-zimanê gelê xune,
Ew gazine gelê bêje.
Gel ewiltir ew dibêje,
Ser kaxeta ew dirêje.

Hiş, mejûê gelê xune,
Dilê gelda çi disêwire,
Dilê wîda jî disêwire,
Fitê nade, bibihure.

Kefilnevsê gelê xune,
Piştovane, pir mezine.
Ew gelê bê helbestvane,
Bê nav-dengî, perîşane.

AX, AX, BÊ WELATÎ

Bê welatî zef girane,
Kî jê dûre, ew dizane.
Pî sirûkî, hêlîn sare,
Kuda diçe, tengezare.

Kesek halê wî pirsname,
Kîbûna wî qet nasname.
Kuç'ek ji wî hurmettîre,
Zilek ji wî bahatîre.

Bêkavî dil mêze dike,
Dil dixwaze, taqet nake.
Bê kes, bê pişt sekinîye,
Zûda dinê koçkirîye.



WELATÊ DÊ

Qedir, qîmet, kubra minî,
Ruhî, canî, xwîna minî.
Emir, jîne, heya minî,
Tawet, taqet, sebra minî,
Ez ewledê teme, welat.

Bext û miraz, şaya minî,
Mal û dewlet, milkê minî.
Zar û ziman, rewşa minî,
Agir, alav, şûrê minî,
Ez ewledê teme, welat.

Nexş, nîgar, xemla minî,
Gav û sehet, roja minî,
Dîlan, dewet, şaya minî,
Şeref, namûs tacê minî,
Ez ewledê teme, welat.

Seyran, geştî, kêfa minî,
Av û hewa, nanê minî,
Hurmet, syanet, gora minî,
Bilindaya serê minî,
Ez ewledê teme, welat.

Erf û edet, mafê minî,
Cî, miskenê gelê minî.
Dîn û îman, qulba minî,
Şewq-şemala rûê minî,
Ez ewledê teme, welat.

MERIVÊ DINÊ, RICA DIKIM, HEMÛ WERIN!

*(Rewayî ruhê şehîdên Kobanê, Mûsilê û Şengalêye bê gune
dikim. Hezar, hezar carî rehmeta Xwedê li webe,
heyfa weê bê hildanê)*

Hewar, hewar, werin, werin,
Mesekinin, hemû werin,
Boy şehîdên meye şîrîn
Hûn jî hinek tev me bigrîn.

Kirinên DAÎŞ-a mêze bikin,
Ker-lal nebin, ziman vekin,
Xwîna gelêm bûye ç'eme,
Dixulxule, leme-leme.

Ella dibên zîqa dikin,
Ekber dibên, kafkûn dikin.
Agir dibarînin jordâ,
Wa, îslam tune tu erda.

Ersê û kursî wehimîne,
Ro, Hîv îdî xeyîdîne,
Werin, werin, me ar bikin,
Vê tofanê em red bikin.

Bistan devê dergûşada,
Dê şehîdin, şîr tunene,
Kal-pîr mane nav êgirda,
Zare, zarin, rehm tunene.

Sêwî ketine nav ç'îane,
Bav, dê pêş wan şerjê kirine,
Ne sî heye, ne jî sitar,
Laşa nakin bin axa sar.

Heta kengê emê wa bin?
Ser axa xwe tengezar bin?
Em jî tev we xuliqîne,
Boy çi guneyî em wa bûne?

Me dikujin hûn deng nakin!
Destên DAÎŞ-a hûn jênakin,
Werin tev me ç'eka hildin,
Hovî, hara em qut bikin.

Dîroka me daynin pêş xew, mêze bikin,
Em nevîê Eyûbîne, me baş naskin,
Rojavaê dîsa bûye doz û qale,
Em dubar aza bikin Şerqa kale.



XWEZIL, XWEZIL

Tew hidûdên herçar parç'a bên hildanê,
Bê xof vebin rê û dirbên Kurdistanê.
Yek Kurdistan nexşê dinê bigre cîe,
Zincîr qutbin, bimre mejî koletîye.
Ala kesk, sor, spî bimilmile koşk, birca,
Dîlan, şaî tijî bibin hemû qulç'a.
Bajar, gunda, nu dibistan bêne rêzê,
Hemû gir, hûr biaxivin zimanê dê.
Goran, soran, zaz û kurmanc bibin kulmek,
Welatê me neyar derxin ça berazek.
Dê, bav bijîn aza, serbest, bêxem, tirse,
Dengê tanka, bomb, teyare neê, bese.
Dapîr, bapîr tucar mekin zare-zare,
Welatê me timê bibe geş bahare.
Dewran xweşbe, ezet, hurmet derê holê,
Ç'ûk pêş mezne pate bidin, bêjin "belê".
Dayîk lorê bigalînin boy lorika,
Xort keç'ika pîroz bikin gul, kulîlka.
Xwînxwar sihkin, lê em kîne, çi dixwazin,
Ne xwînrejîn, tenê heqê xwe dixwazin.
Axa dayîkê xalî bibe, dewa, doja,
Vî emrîda ez bibînim ewan roja.

WELATÊ DÊ. DIHOKA RENGÎN

Eva helbesta min bin hukumê çûyîna mine li Başûrê Kurdistanê hatye nivîsarê. Wî çaxî 7-8 adarê sala 2014-a Dihokêda forûma helbestvan û nivîskarê kurd derbaz bû, ku pêşkêşî cejna Newrozê kiribû. Tevî wê dibûn dêlêgatê çend welata: Kurdistanê, Tûrkîaê, Misrê, Ermenîstanê, Qazaxstanê û Lîbîaê. Ji Qazaxstanê ez bûm û endamê Serwêrtiya Assosîasîa kurdê Qazaxstanê "Berbang"-ê Evdule Balaêv. 9-12 adarê Hewlêrêda konfêrans derbaz bû, ku pêşkêşî pêşdaçûyîna proza kurda kiribû. Westê konfêransê em usa jî rastî Mehemed Evdile, Îsmail Slêman, Hesên Slêvanî û yêd mayîn hatin, pevgirêdanê efrandariêye qewîn hatine sazîkirinê. Em usa jî çûne Barzanê, ser gora mêrxasê kurdaye lêgêdar Mistefa Barzanî û kurê wî Îdrîs Barzanî.

Şikir tu dîtî, bilind bûm, wek asîman,
Xem-xiyalên min bela bûn, îdî neman.
Tew xwestinê min qedyane sedî, sed car,
Dewa, doza timê dûrbî, şa, bextewar.
Paxil veke, te hemêzkim dilê tijî,
Dewran başe, şabe, şabe tev min tu jî.
Dengê bomba, tank, teyara îdî tune,
Xwînxwar, xwînrejî lana xwêda vemirîne.
Sêwî, sexîr ber derya nakin îskîn,
Dayîk û xûşk boy bav, bira nakin zarîn.
Erf û edet, dîlan, cejnên te min dîtin,

Egît, mêrxas, pir comerdên te min dîtin.
 Ç'ya-banî, seyrangehên te min dîtin,
 Qelfe-qelfe nazenînên te min dîtin.
 Gora nemir Kek Barzanî min tewaf kir,
 Li Hewlêrê, Sulêmanyê firavîn kir.
 Zexoê, Şêxanê, Lalişê mêzekir,
 Şeqlewaê, Saleddînî temaşekir.
 Hesret dilê minda nema, kûr bîn kişand,
 Ç'eva bê min ji şabûna hêsir reşand.

* * *

Pêş Rebbê Jor çok vedidim, şikir dikim,
 Sondê dixum, xem-keserên bê welêtyê,
 Virha şûnva neynim ser zar, gazin mekim,
 Heta hebim, nexş-nîgara te bîr mekim.
 Dayka delal, bi ken, bi ken min verêke,
 Te diqetim, dil-hinavêm xirav meke.



MIROVÊN DINÊ

Werin, qaskî min sihbikin,
 Jana gelê xwe qal bikim.
 Derdê gelê min girane,
 Ne hezare, kulûrane.
 Ç'ya, banya girantire,
 Behrê bê bin pir kûrtire.
 Bê delave, bê kendale,
 Jere, mewte, tûje, tele.
 Terh vedaye, dixulxule,
 Xilaz nabe, tim dikele.
 Çiqas diçe, zêde dibe,
 Eqara wî fire dibe.
 Diaxive, qet sax nabe,
 Min bibihên, zef şaş nebin.
 Rehet rûnên, cî ranebin,
 Çar hewardor mêze bikin.
 Ç'ev, guhên xwe fire vekin,
 Hildin qelem, çend belk kaxet,
 Gotinê min kivşkin xet-xet,
 Mêzîna xwe bileqînin.
 Qenc û xirav hevderxînin,
 Hindik, gelek himber bikin,
 Giran, sivik par-par bikin.
 Çend-çend qurne hatne, çûne,
 Tel û şîrîn, rêç' hîştine.
 Şîrîn mera par nehatye,
 Tel hinavê me sotye.

Pir guhastin hatne dinê,
 Xêr û xezne bûne xinê.
 Gela barê xwe avîtye,
 Barê meî pişta meye.
 Bêjim, bêjim, kîjan dewrê
 Em hatine ser vê axê.
 Me ji wêa hizkirîye,
 Wek ruhê xwe xweykirîye.
 Xwînxara ew me stendiye,
 Ser wê rehet rûniştîye.
 Boy nefê xwe kirne çar par,
 Dihedimînin, dikin tar-mar.
 Em lê bûne bê rusqete,
 Sêfil, kole, bê hurmete.
 Hebsa bi me tijî dikin,
 Derga ser me zexm mor dikin.
 Serwêrê me dizêrînin,
 Zindanada dirizînin.
 Gelê kevnyar me nasnakin,
 Şerefa me pêpes dikin.
 Dayîk, xûşkên kedkire, rewş,
 Hisret mane boy roja geş.
 Bûk û zavan cindî, delal,
 Nabin xwedîê çît, perde, mal.
 Keç' û xortên kawê, kubar,
 Bê sûc diçin ax-berê sar.
 Zimanê me yasax kirne,
 Hebûna me talan kirne.
 Bombên jerê dixulqînin,
 Ser axa me dicêrbînin.

Dengê tanka, ji teyara
 Sewiqîne, zarên bera.
 Em dizêrin, ew kêf dikin,
 Zulmê ser me zêde dikin.
 Zarê sêwî serê rîa,
 Raç'ev dikin hatna bava.
 Wê bên, wê bên, kes nabêje,
 Dil-hinavên wan dipije.
 Çima hûn qet deng-hes nakin,
 Zulmê ser me wêda nakin?
 Rebb bi zarê xweyî rindik
 Timê gotye ev tiverik.
 "Bê sûc, gunê, kes li kesî
 Îzin tune bike pîsî".
 Dîn û îsaf weke hevin,
 Ne cudane, tim cem hevin.
 Dubar, dubar dikim rica,
 Hev bijbêrin xirab, qenca.
 Boy xatrê wî, Rebbê heq,
 Vekin, bêjin kîye neheq.
 Cezê neyar zexm bidinê,
 Em azabin ji vê zilmê.
 Em jî bibin xwedî axe,
 Ji dilê me derê daxe.

DAYÎK

Qasidê Xwedê qîmetekî
Gelek bilind tera daye.
Timê gotye cinneta heq
Binê pê daykadaye.
Wekî kesm min ricim meke,
Ne lomîne, ji min pirske,
Ezê bêjim rûê erdê,
Xwedê pêştir Xwedê dayke.
Ji te mestir kesek tune,
Wek te şîrîn tu tem tune,
Hemêza te heq cinnete,
Wê evzeldir cinnet tune.



DAYÎK, TU WELATÎ

Tiverkî, hatî jorda,
Hasil bûyî cinnetêda.
Zyaretî, pêpes nabî,
Xezna kûrî, xilaz nabî.

Nûrê hatî hilstiranê
Pêqîş bûyî pê zem-zemê.
Rebb daye te navê daê,
Bilindkirî weke roê.

Tu û welat weke hevin,
Cuda nînin, timê tevin.
Hemû tema şîrîntirî,
Nûra ç'eva bahatirî.

Bê ç'ilk, bê telpasîmanî,
Namûs, xîret, zar, zimanî.
Lorik ewil dibê daê,
Dawîê dibê welatê dê.

Tu ku heyî, dinya şêne,
Tu tunenî, dinya şîne.
Rûê erdê qulbe tuyî,
Xwedê pêştir, mezin tuyî.

LÎRÎKA



BEDEWA PIR XWERAZÎ

Zer kezya zû-zû şeke,
Yek-yek bihûn, mehez bike.
Nerm stuê min bialîne,
Of nabêjim, bixenqîne.

Çi cezaî tu bidî min,
Şîv-şekire herdem boy min.
Ew awirên teye alav
Min werdikin misk û gulav.

Naz-giravyên teye nazik,
Dil-hinavên dikin kizik.
Dilop-dilop tînin xare,
Cî nagirim şûn û ware.

Xwezil, xwezil vî emrîda
Sed yar, sed heyf vê dinêda,
Nebûyayî hogira min,
Te nedîta ev halê min.

Dema hesin min xardikir,
Rojê çend cil li xwe dikir,
Bibûyayî mêvana min,
Têr bidîta kîbûna min.

Nika emir ne ew emre,
Ç'em ne ç'eme, wê dem gure.
Kanî îdî miç'iqye,
Erd kizirye, xozan maye.

Dar hişkbûye, belg weşyane,
Gulistanê gul nemane.
Agir çûye, kuç'ik maye,
Taqet tune, beysûs heye.

Minra bibe hevalbende,
Naz-giravya nebe bende.
Lavaîke Rebbê Jore,
Dereng herim gora sare.

HA GULÊ

Ha Gulê, ha Gulê, ha Gulê canê,
Gul-kulîlka Kurdistanê.
Biska bade, zulfa şeke,
Xizêm dayne, ç'eva kilke.
Were, were, hîvya teme,
Dîl, bengîê huba teme.

Ha Gulê, ha Gulê, ha Gula zerê,
Gul bedewa tew Hewlêrê.
Xal sûreta min dûr meke,
Bikirçîme, poşman meke.
Were, were, hîvya teme,
Dîl, bengîê huba teme.

Ha Gulê, tu min meêşîne,
Dest û zozan megerîne.
Dem hatye, ne buhure,
Agrê hubê natemire.
Were, were, hîvya teme,
Dîl, bengîê huba teme.

BEDEWA, BEDEWA

Min tu dîtî nav zerya,
Çokêm sistbûn, dilêmin hejya.
Pêş ç'evê min bû ronaî,
Zimanê min kir lavaî.

Dimeşyayî nazik-nazik,
Dil-hinavêmin dibûn kizik.
Kasil-kasil te mêzekir,
Kal ruhê min te tezekir.

Huba te ez kirim sêwî,
Tev min hejyan dar û devî.
Xwezil bibî li min mêvan,
Têr bibînim bejna talyan.

Rebb ricakim dubar, dubar,
Bê te dinê nekim firar.
Ser axa dê pir bimînin,
Gora min te rex hev daynin.

BARANA DEV BAHAR

Hey, barana
Dev baharê,
Geh lêdikî,
Geh vedikî.

Him şil dikî,
Him za dikî.
Bisk, kezîên
Delal yarê.

Him dikenî,
Him şadibî,
Ez jî tev te
Firnax dibim.

Zû hêrs dibî,
Zû digirîy,
Ez jî tev te
Pejmûr dibim.

Xwezil, xwezil
Ser awakî
Timê, timê
Tu bimayî.

Ez nolî te
Bibûyama

Dilopekê
Paqij, zelal.

Timê, her car
Danîa ser
Herd sûretên
Cindî yarê.

Kesî pêşya
Min negirta,
Neêşanda,
Ne leqanda.

Ser ç'evên te
Buru hene,
Ne defanda,
Ne hejanda.

Mirazê min
Hasil bûye,
Hesret dilê
Min derketa.

Heta dawyê
Wir bimama,
Emrê şîrîn
Dûr nemama.

TU JI GULÊ BEDEWTIRÎ

Sehra sibê hê vebûbû,
Misk û emper quloz dibû.
Digeryam nav daristan,
Mêzedikir hemû qulç'an.
Roê tîrêj neşandibûn,
Ç'ivte-ç'ivte ç'ivîka bûn.
Bilbil nîvcî xew rabûbûn,
Kew hêlîna melisî bûn.
Bakî hênîk dilîlîa,
Ref digirtin teyrik-tûya.
Karxezala kale-kal bûn,
Dû makên xwe paşda mabûn.
Tew bînbera zîz bandikir,
Hevdu silav, pîroz dikir.
Gezo îdî nedhat xanê,
Nûr werkirbû şev baranê.
Daristan rewş xemilî bû,
Dîdemeke nih vebûbû.
Avya şevê dihat xanê,
Lezdiket boy barkirinê.
Sosin, rihan, qerenfîla
Rêzgirtibûn dor sorgula.
Belgên gulaî avî ser,
Eynî nolî lêvên tebûn.

Ew dilopên berjêr dibûn,
Tevda, tevda hêsrên te bûn.
Xala reşe nav gulêda,
Bedewyêda ç'evên te bûn.
Xwest dest bidmê, taqet nekir,
Lê sekinîm, temaşekir.
Dît ew gule, tu jî gulî,
Lê tu ji wê bedewtirî.



WERE CEM MIN

Şev buhurye, ro derketye bejneke,
Avya şevê koç' barkirye carekê.
Ez, tu mane nav kulîlkên ter-teze,
Bejna zirav xemilye geveze.

Negaret

Were cem min, were cem min, te ban dikim,
Gul-sosina boy te, boy te baq dikim.
"Naêm-naêm", "naêm-naêm" nebêje,
Dil-hinavêm mehelîne, nepêje.

* * *

Xezal çûne, xort derketne nêç'îra,
Kew dikanin, bilbil dûrin hêlîna.
Te dibînim, xuber-xuber dimaşim,
Ez bengîê ç'ev û buryên te reşim.
Were cem min, were cem min, ban dikim,
Gul-sosina boy te, boy te baq dikim.
"Naêm-naêm", "naêm-naêm" nebêje,
Dil-hinavêm mehelîne, nepêje.

* * *

Dil kewrekim, meêşîne, bese, bes,
Ramûsanek min keremke, ew jî bes,
Şabim, şabim mirazê min bû hasil,
Min dîtye bedeweke xas esil.
Were cem min, were cem min, ban dikim,
Gul-sosina boy te, boy te baq dikim.
"Naêm-naêm", "naêm-naêm" nebêje,
Hêsrên şewat ser sûreta merêje.



XILAZ NABIM JI MITALA

Roj mitale, şev mitale,
Nabin aga, ne zelale.
Qasekî min dûr nakebin,
Dil, hişê min dernakebin.
Tev min diçin erşê jore,
Fitol, fitil tene jêre.
Telin, jerin mîna mewtê,
Pir şîrînî, wek şerbetê.
Digalînin, dilûvînin,
Tawet, sebrê min distînin,
Na edilin, nasitirin,
Rehet nabin, naseqirin.
Hespê qule, em swar dibin,
Mikan, mikan peya dibin.
Hemû qulç'a hevdişînin,
Qenc, xirab cem hev datînin.
Geh dibin dost, geh jî neyar,
Him zivistan, him jî bahar.
Dibin derzî, dibin dirêş,
Tînin merez, didin jan, êş.
Îlaç, loxman boy wan tune,
Ez ku heme, ew jî hene.
Berya gotye: "Dûr mitale
Timê dijî wek sed sale".
Ew şûr, qeme kêra tûjin,
Kê hewilîn, wî dikujin.
Bextewar ew kal, ahile,
Wekî dijî bê mitale.

NAZIKA BEDEW

Pejmûr nebe, meke zarî,
Hergav naên şevên tarî.
Him hîv dertê, him stêrkên geş,
Tave hîv tîn, diçin şev reş.

Wê bîn rojêne eşqe û şa,
Tavê dayne zozan, deşta.
Dayka kurda kubar-kubar
Wê bimeşe gund û bajar.

Wê ala meye kesk, sor, spî
Binikîne pir bilindcî.
Serxwebûnê elam bike,
Cejna min, te pîroz bike.

Emê destê hev bigrin,
Tew kolana bihêwirin.
Hîvî bikin Rebbê Jore
Eme ji hevdu meke dûre.

Ser axa dê, tevî tewa
Bibin xwedyên keç'an, lawa.
Xizmet bikin gelê xwera,
Şênkin hemû qulç' û dera.

BEDEW, MILAHÎMÎ, LEL Û DURE

Him kivş dibî, him kivş nabî,
Him şa dibî, him şa nabî,
Bêje, bêje, çi qewimye?
Ev çi hale tera hatye?

Bese, bese, hîvya teme,
Lewzek şîrîn, bendê teme.
Hergav, herdem tu tev minî,
Dil, mejûêm cuda nînî.

Îdî, îdî nazya meke,
Wek min kesek te hiz nake.
Min nav rinda tu bijartî,
Pir şîrînî, him şerbetî.

Hene rojên sivik, giran,
Geh berf dibe, geh baran.
Her rojekê navek heye,
Her demekê temek heye.

Dilê min xwe cuda meke,
Daîna Rebb şikir bike.
Gav, roj sed car temennebe,
Giran rûnê, sivik nebe.

BERFA BÊ DEM HATÎ

Rûê teyî spî, cindî bû,
Te çima ew kire reş?
Xemla teye bêqusûr bû,
Bê dem, pî da ser axa reş.

Ew mêvanê, bê ban ku tê,
Ew bê qedrî, bê qîmete.
Dewrana te buhurîye,
Ezmanê şîn şêlû meke.

Hemû bînber xew rabûne,
Ruhê wana meêşîne.
Bila heryek bê xof bijî,
Hilde barê xweyî tijî.

Tu mezina çarbiranî,
Ne sivikî, pir giranî.
Şûna xweda rehet rûnê,
Nekeve nav fêslên dinê.

Kesekî ne hîvya teye,
Xwe hatî, ew gunê teye.
Deyil, dawa hilde, here,
Îdî paşda venegere.

Wekî şabin darên tezî,
Kalî bike her qulç', her cî.

Dema xweda pê xêr were,
Şayê bîne, dem xweş here.
Çiqasî lez ku bilivî,
Tuê ewqas me şîrîn bî.

* * *

Sibe nû ron bûbû. Ez ji xewa baharêye nolî hingive şîrîn
lezo-bezo rabûm, piştî pencera oda xweda rûniştîm. Xwest
dilekî birçî tebyeta nû hişyarbûyî mêze bikim. Lê dewsa qibe-
qiba bilbila, kake-kaka kewa, ç'ivte-ç'ivta hemû teyrik û tuên
xew rabî, min ezmanê şîn nav ewrê reşe tarîda, erdê sêfil nav
berfa spîda dît. Xêleke xurt pejmûr bûm. Û poşman-poşman ev
helbesta nivîsî.

30.03.2015,
Baj.Alma-Ata.



REWAKIRIN



*Ezîzê Zîo, zane, hêca,
Bira û hogirê bê himber,
Şêst salya te pîroz be!*

Hezar pîroz, rojbûna te, birê delal,
Gel hizdike lawê xweyî aqil, kemal.
Ç'yakî girî, têy xanê nav ç'yada,
Nabetilî, sê didî çar hêlada.
Êl dibêje: ya Rebb, şikir, şikir tera,
Ev xasmêra, ev comerda te da mera.
Esilzade xweydike eslê xune,
Rya gelda feda dide ruhê xune.
Heramzade bêşerefe, minafiqe,
Mal, şênîa dihedmîne, qetla dike.
Çiqas cara bêhelandin, bibe kere,
Eqara xwe unda nake zêrê zere.
Boy nefê gel dikişînî timê zehmet,
Qesiryara nîşan didî qedir, qîmet,

Armanca te merivayî, welathizî,
Nav ulumda lehengekî ser evrazî.
Kemala te dîroka me kirye xinê,
Hemû dayîk lawê mêrxas nayînin dinê.
Ez dilekî pir pakijî, him dostanî
Culet dibê, lawê Zîo, qehremanî.
Zane hêca, şêst sal boy te gele nîne,
Heta sedî pê xwe zexm bişidîne.
Wekî me jîy, tu sed salî,
Boy wê tu xwe gunekarî.

04.06.2013



Rewayî kurxalê xweyî qedir baha
Eylazê Mehemedê Ûsivê Biro dikim.

Esil xasa, xas dikevin,
Rewşê didin gelê xune.
Nolî Şamê vedikevin,
Bilind dikin navê xune.

Her kesîra nabe qismet
Hurmeta gel qazanc bike.
Pir pêwîste hiş, merîfet
Bikaribe xwe xweyke.

Comerd bûne pir girane,
Culet navê nemir tîne.
Dirav, ruh, can qîmetire,
Goştê canî şîrintire.

Tu comerdî, piştovanî,
Qedir baha, ber mêvanî,
Şuxla xêrê paş namînî,
Mal, milkê xwe nahêvşînî.

*Rewayî yek salya Slêmanê Rostemê Hetemai
piç'ûk dikim.*

Hey, Slêman, Slêman,
Were mala me mêvan.
Ber te daynim av û nan,
Ez heyrana wan ç'evan,
Ez heyrana wan ç'evan.

Em hemû te hizbikin,
Dilê xweda cî bikin.
Bixwe, vexwe pir-hindik,
Bibe xortekî rindik.

Bibe mêrxas, qehreman,
Him şêrbe, him pelewan.
Nemam, nezera dûrbe,
Şîrînê dê, bavê be.

Nefê bide gelê xwe,
Bîr meke qet eslê xwe.
Çiqas diçî, bilindbe,
Gel kirinên te şa bibe.

*Elî, kurê min merivê îtbar,
Tîm dûr here ji bêîtbar.*

Heşerîkî nav garanê wî çetire:
Şuxulê wî tindirûz bû, gur, agire.
Ezim dibê dike lafên pir xwe razî,
Hebûna wî zikirmewte, dirêş, derzî.
Bê şerm, bê xof, der-dorê xwe mêze dike,
Çi kete ber, dişewtîne, ziqa dike,
Dibê ez vir, li Bexdaê Xelîfê kor,
Xwe dide pêş, nade kesî mecal û dor.
Bê hîm, vala, hewal dide, nahêvşîne,
Bira, viza, ewir-ewir digêrîne.
Xênî xirab, tişteke destê wîya naê,
Fitê nadê, ne dayîke, ne jî xaê.
Zû û dereng, kîbûna xwe dide dere,
Berya gotye: "Kerdîmîne timê kere".
Xwedê boy ker xuliqandye palan, şivdar,
Rojê sed car, tûka rûye, lê nake kar.
Xîret, îtbar, ji namûsê gelek dûre,
Ruhda qirêj, ç'evnebare, qelpe, kûre.
Murvên usanra tu meke hogirîye,
Ew kesên ji wîya dûre, cinetîye.

NÛRÊ XANIM

Zerya rewş, birazya mine delal,
 Navê birêm li te bibe sed car helal.
 Te emekê min bilind kir wek cewahir,
 Welgerande ser zimanê Pûşkînê gir.
 Spas, spas, hezar spas dibêm tera,
 Rebb oxira teda vêxe şam û ç'ira.
 Derengbe jî, bigihîjî mirazê xwe,
 Nav şayêda derbaz bikî gav, rojên xwe.
 Sêfil nebî, nenewgirî, ne binisî,
 Timê têrbî, ne kizirî, ne ç'ilmisî.
 Bilind bikî serê bavo, apo Barî,
 Şerezeî, nazenînî, tevda horî.
 Dilpaqijî, aqilbendî, xezna tijî,
 Nav emirda dibin leheng dotên kurd jî.
 Berya gotye: "Tu nîn bide tim nanopêja, yekî zêde,
 Rebb bendara hiş, kemalê hekhev nade".
 Hinekara behir, kanya zelal dide,
 Hinekara dilopeke kêmtir dide.

* * *

Dema min pirtûka xweye Nûra Emerîkê Serdar ji zimanê kurdî welgerandiye zimanê rûsî "Ez û kevokê tenê" dît, bêhed û bêhesav kêfxweş bûm. Ev helbesta rewayî zehmet û merîfeta wê dota kurde maqûle, destemele, pirzane kir.

16.04.2014
 Baj.Alma-Ata.

LOXMANA HÊJA

(Rewayî dota qazaxe dilovane, pir mirovhiz
 Aşirova Qeregoz Sêyîdqasimovaê dikim, kîjan ku boynet
 saxlemya min emekê wêî dilovanîyêî bê qusûre)

Hey can, loxmana, dest sivike, pêcî marmûd,
 Nazenîka ç'ev, burî reş, dil bê hudûd.
 Pêç'îê xwe ser dilê min bigerîne,
 Bê jan kutê, dermanê wê zû bibîne.
 Taliqê xwe spartye min nevsî te,
 Şefê bide, bineqşînim nîgara te.
 Gelek kirinên mine hela nîvcî hene,
 Bibe kefil, xilaz bikim, eşq û kene.
 Pir merezgir xilaz kirine ji mirinê,
 Daye wana emrê şîrin, sewqa dinê.
 Vê mereza bê eman min dîr bixîne,
 Destê bigre, ber jîyanê verêxîne.
 Gelê minî qencî heze te bîr nake,
 Wê navê te dilê xweda tim xweyke.
 Paşê bibim ez mêvanê dinya heqe,
 Kirnêm bijîn li vê dinya pir neheqe.
 Gel sih bike ez kî bûme, boy çi hatme,
 Min ji wîra xezne hîştîye, paşê çûme.

KEK NADIR, ZANE, EYAN

(Rojbûna te pîrozbe!)

Cîa pêş te xwe mældikin,
Behir navê xwe bîrdikin.
Bê delavî, bê serbinî,
Kubarya gelê xunî.

Tu ne dehrî, ne jî kanî,
Dehir, kanî dimîç'iqin.
Kana tijî, kûr xezneî,
Kan û xezne namîç'iqin.

Ulmê xweda bê himberî,
Nav zanada zanê girî.
Lawê kurdî, comerd, mêrxas,
Eslê xweva paqijî, xas.

Rehma Xwedê dayka tera,
Anî dinê, dayî mera.
Te bilindkir nav-dengê me,
Wek xanîyî boy gelê me.

Armanca te edîlayî,
Dinya heye, tu jî heyî.
Vekir sêrên ulme tarî,
Pir qedirî cem şayîr Barî.

Stêrka geşe ser navê te,
Li ezmanê ç'îkî zelal,
Wê binse, şewqê bide,
Kurdistana teye delal.

Pîroz, pîroz rojbûna te,
Nemam, nepak dûrbîn ji te.
Heta hebî li vê dinê,
Nav şayêda bibî xinê.
Xem, kederên tel bê wede
Peya nebin ber dergê te.
Tev Helîma xweye cindî
Qut bikî tu sala sedî.

06.01.2015



DAYKA HÊJA – HELÎMA EMO

(Rewayî emir û jiyana dayka kurde pir emekdar, ulmdara meşûre, zaneye bê himber, xanima ulmdarê eyan Nadirê Kerem Helîme, xatûna timê enî vekirîye, serbilinde welatparêz dikim)

Tel û şîrin buhurîne pir rojên te,
Nehatîye guhastinê timtêla te.
Dilê paqij, te Rebbê Jor bawer kirye,
Kêm û zêde, çi şandîye, qebûl kirye.
Şevên bê xew ser dêmê te rêç' hîştine,
Keda helal por, gulîên te spîkirine.
Bapîrada maye pirs baha, xêre,
“Şêr ku şêre, va çi jine, va çi mêre”.
Keda xweva gepek mêra zêdetirî,
Culet dibêm, hezar carî bilindtirî.
Esil xasî, bê ç'ilk digrî nav-dengê xwe,
Boy gelê xwe nahêvşînî ruh, canê xwe.
Dil paqijî, zelal, safî, lafa dûrî,
Ruhê xweva dayîkeke lel-dur, nûrî.
Hindik pesna, ez nabînim layîqê te,
Wekî bi wan bixemlînim nîgara te.
Dilovanî, merhemetî, pir hêcayî,
Milethizî, heyfî, başî, bê hempayî.
Timtêlya te, ezet, hurmet, hindik hene,

Erf-edetê gelirî cem te mane.
Hemû dîtî dîndara te nabin têre,
Ev kemal te bilind dike gelek jore.
Rebbê Jorîn, dubar dikim, hîvî, rica,
Emrê mayî derbazkî tim eşq û şa.
Helalê te, hemû lawên teye kubar
Bêxem bijîn, serfînyazbin, zef bextewar.
Dergê şaê vekirîbe her gav pêş wan,
Mirina bê dem tucar nabe mêvana wan.
Nav edlêda ruzê wan bê Rebbê Jorîn,
Gav, rojên we nolî hingiv bibin şîrin.



Ahmedê Hepo, biraê minî hêja!

Sed eferim, beranê kelî, zexmî zor,
Li meydanê dîsa dikî ceng û dor.
Helal, helal, şîrê daykê helalbe te,
Te bilindkir nav û dengê tew gelê me.
Qeşav helya, qulç' tijî bûn, ava zelal,
Kulîlk vebûn, behra xweda keda helal.
Welathizê wek te xwezil pir hebin,
Emirda wê kubarya gelê mebin.
Egît, mêrxas, him comerdî, merde mêrî,
Pêş tu kesî netewyayî, cîda şêrî.
Emrê bade te nekiryê li vê dinê,
Dilê gelda tuê bêy xweykirinê.
Kanya ulmî, têr, tijîyî, vala nînî,
Çiqas qurne bên, herin, tuê bimînî.
Xas mêrara, welleh, heystê sal hindike.
Ser axa dê, nod jî, sed jî ne geleke,
Pîroz dîkin rojbûna te hezar carî,
Pêş te timê vekirî bin dîwan, derî.
Rebbê Jor te ji nepak, qelpa biparêze,
Çend pirtûkên nû tu dîsa bikî rêze.

* * *

Dema 21.06.2014-ê têlêvîzîona dewleta Azîrbêcanê derheqa dostê minî nebîrkirî Ahmedê Hepoda sehetekê gelectir rêportajeke berfireye pir alî da, ez wê demê pir firnaq bûm. Wekî

per û baskên min hebûna, ezê elbêra bifiriyama bajarê Bekûê, minê Ahmed têt-têr maçkira. Û bigota:

- Birê delal, sed eferim tera. Berya şaş negotine: "Mêr dikevin, tim ji şêra şêr derdikevin, tim ji şêra". Tu mêrekî serê sed merîyî.



*Elîê Mehemedê Îbo,
Rojbûna te pîrozbe!*

Xwezil dubar bigeryana em Çeylaxê,
Berjêrbûna ser kanya bûz bolaxê.
Tasek ava sar vexwara, hêsa bûna,
Me kî dîbû, ew hemûya wira bûna.
Apo Quran zîz bixanda ayet-ayet,
Dayîk Nazê danya sifra tijî nêmet.
Ber her mala bihat xanê govend, dîlan,
Kesk, sor û zer bixemilya tew Arxaşan.
Qelfe-qelfe zerî-domam bimeşyana,
Keç û xorta naz-giravî hev bikrana,
Dengê şivan, bêrîvana nas bihata,
Kevanîê xanim, xatûn şîr bidota.
Kîler, kulîn tijîbûna hasla salê,
Nevîê gir-hûr bilîstana dora malê,
Syar dîsa têketana ceng û lecê,
Kîê ewil bigihîne cî belgîê bûkê.
Hemû dilxaz beravbûna dor sifra te,
Min tevî wan pîrozkira rojbûna te.
Dil bigota: bira, hevtê sal hindike,
Heta nodî, welleh-bille ne geleke.
Ser axa dê emir bikî sedî jortir,
Tevî Zeroxanya xweye helal ked kir.

*Bi dilekî baristan,
Barîê Bala.
01.06.2014.*

TAHIRÊ SLÊMAN

*(Rewayî cejna dehsalya daxuliqandîna
rojnama "Dîplomat" dikim)*

*Rewşenbîrê gelê kurdî pir hêja, bilind qedir û hurmet! Ez
vê cejna keda teye dehsalaye bêqusûre, pir kardar dilekî paqijî,
hizkirî pir û pir carî pîroz dikim.*

*Ev deh salin bi saya huner û xemxurya te "Dîplomat"-ê
şûrekî tûj daye destê xwe. Xwînxar û xwînrejê gelê me rast û
ç'ep dide ber şûrê xweyî heqîyî bê amin. Ev hunurê her kesî
nîne, wekî nolî te vê rya kaş-kerîme, sirînda bê minet bimeşe.
Şîrê dayîkê te hezar carî helalbe. Xwedê oxira başe, serfînyaz
têxe qismetê te û rojnema te.*

*Birê delal, sed car pîroz ev cejna te,
Nevsên nepak dernekevin oxira te.
Ev deh salin boy gelê xwe bûyî karkir,
Her pîşkeke te difire alav, agir.*

*Agirê te tew agira şewat tire,
Zimanê te şûra, qema zef tûj dide.
Dişewitînî, ker-ker dikî, dihelînî,
Qenc û xirav berî tewa tu dibînî.*

*Xwînxar, xwînrej qetilkara ricim dikî,
Ser pir sêrên veşartine tu vedikî.
Gelfiroşa, bê şerefa dikî sosret,
Heta dawîê nehecqînî nabî rihet.*

Loma bûyî hizkirîê gelê kurde,
Dewa te heq, xwesteka te pakij, rinde.
Rebbê Jorîn, hîvî dikim dubar, dubar,
Ser axa dê aza bigrî binge û war.

Ez dilekî şa xwe tera bigihînim,
"Kurdistan"-a rojnema te bigerînim.
Hêsa bibim, rehet rûnê, "ox can" bêjim,
Ser neyara kîn, kudreta xwe birêjim.
Bizanibim boy gelê xwe xizmetek kir,
Gel bawerke, nabin bira ne hirç', ne gur.

Biraê minî delal! Xwezil Xwedê firsendê bide min û te:
em welatê xweyî azadda vê cejnê awazekî gelekî bilind bi navê
dewletê xwe resmî kivş bikin.



BER GORA SEROKÊ NEMIR

*(Rewayî 110-salya rojbûna serokê gelê kurd
Melle Mustefa Barzanîê nemir dikim)*

Tew hatîê bê şik herin,
Gel jimarê naê naskirin.
Wekî naske tew dinê wî,
Gerek hebe serokê wî.

Serok timê naên dinê,
Dur her cî naê dîtinê.
Serok ruhê gelê xune,
Ew tunebe, gel jî tune.

Ez nabînim ewê pesnê,
Bipesinim ez te pê wê.
Boy gelê xwe bûyî ç'ira,
Şemal didî hemû qurna.

Boy azaya kole, qelsa,
Ketî zîndan, ketî hebsa.
Ranezayî ne roj, ne şev,
Xwînxarara ajot doz, dew.

Welatê xwe bûy dere,
Dît xirabî, xem, kedere.
Xwestina xwe paş nemayî,

Ne westyayî, ne tewyayî.
Lawên kurde boke-beran,
Neyarên te kirin deran.
Kap kirine stu, xeniqandin,
Bajar, gunda xişikandin.

Rabe, welat mêze bike,
Şikir kurd tew bûn yeke.
Ala meye kesk, sor û spî
Dimilmile hemû qulç', cî.

Nêt-meremên teye delal
Bûn rênîşa tew gelê te.
Bin ezmanê ç'îkî, zelal,
Gul vedide welatê te.

Keç'-xortên tûnsiz xilifîn,
Didin ser te gulên rengîn.
Pêş te serê xwe xar dîkin,
Merzelê te tewaf dîkin.

Kulme axa ser gora te
Tiberk dibim malbeta xwe.
Wekî kurdên welête der
Kulîlkê al tim daynin ser.

QADIRÊ KALKO, DELALÊ KALKO

*Qadir nevîê minî ewile. Loma jî ez vê helbesta xweye
şîrefîye, baha qîmete, pir cawdar çawa xelateke nebîrkirî wîra
teme dihêlim. Wekî ew nav emirda timê rya raste, bêqezya
bide pêşya xwe. Têda serfînyaz bimeşe. Paşerojêda hemû bira
û xûşkên xweva rêda bide meşandinê. Hurmeta ulm weke
hebûna xwe bilind bigre.*

LAWO

Ulm behra bê ser-bine,
Bê delave, kendal tune.
Kesê têda nikar here,
Xweyî nake, davê dere.

Rya wîya pîj, sirîne,
Bişiqitê piç'ik-piç'ik,
Dest, pîên te nebin birîn,
Nagihîjî hêla şîrîn.

Destpêkê pir diçin dirêj,
Nîv menzîlê diwehimin,
Dikevine rêca qirêj,
Bêşerm dibên: zane emin.

Nişa ulm helaliye,
Qet hiznake derew, lafa.
Heta dawîê hogrê teye,
Bikişînî, wekî cefa.

Gelek tezî, pêxas, bê hiş
Vê behrêda dixuldirin.
Nabin avjen, wek zilek qirş,
Li ser avê hevdizvirin.

Derew, pî digire, lê nameşe,
Armanca wê roja reşe,
Bi ser bine, şame, faşe,
Têda çûyî, zû vedreşe.

Pêxasara nebe hogir,
Behra wane xwîne, agir,
Wê te têxne roja xune,
Tuê bibî nolî wane.

Timê bigre rya raste,
Rast livyayî qet naweste.
Nekeve nav kola, koca,
Tu xêr naê ji bedesla.

NORHANÊ KALKO

Şikir bûy tu sê salî,
Hêdî, hêdî dibî hilî.
Her roj, şevê kemaleke,
Birê ç'ûkî, nesya meke.

Hemû salên virha ku bên,
Bila bêxof, eşq û şa bên.
Jan û êşan dûrbî, dûrbî,
Pisporekî, şereze bî.

Dê, bav te tim şa bibînin,
Letoş, Qadir bihebînin.
Ez jî destê te bigrim,
Ber dibistan biêwirim.

Esman ser te vekirîbe,
Bê top, gulle, ç'îk, sayîbe.
Ser axa dê emir bikî,
War, warkoza li wir çêkî.

MEDÎNA KALKO

(Rewayî rojbûna nevyâ xweye rindik
Medîna piç'ûk dikim)

Şikir heyşt sal te qutkirin,
Salên şîrîn verêkirin.
Pî datînî sala neha,
Êşik, ûşka dûrbî virha.

Şa, bextewar mezin bibî,
Şîrin, şerbet, tem hingiv bî.
Neç'ilmisî qet tu cara,
Bibî xûşka çend, çend bira.

Hemû dersa pênc bistînî,
Heval, hogra piş nemînî.
Navê te li textê pesna
Bê nivîsar fêza tewa.

Kalko şabe boy torê te,
Maçke sûret û ç'evê te.
Timê firq bî ji hevala,
Şemal bidî nolî ç'ira.

14.10.2013

CELÎLÊ PIÇ'ÛK

(Rewayî yek salya rojbûna Celîlê Qadirê Evdileyî rindik
dikim, kîjan ku navê mamê wîyî gêrîla Celîl (kod navê wî
Zagrose) lê kirye)

Mezin bibe, Celîlê mêr,
Bibe zilamekî wek şêr.
Nav-dengê xwe bilind bike,
Dê-bavê xwe tim şa bike.

Jan, êş, qezya dûrbîn ji te,
Gel kubarbe boy kurkê te,
Sed eferim, tera bêje,
Tu wî, ew te qet navêje.

Lawo, dinya tîpan nîne,
Navê kêye te danîne,
Hene gelek gelî, Keraş,
Boy gelê xwe tim here pêş.

Wî navî tu bilind bike,
Zyarete, nizim meke.
Ew şervanê azaêye,
Qendîl, Zapê gêrîlaye.

Dema welat bibe aza,
Wê bê têr-têr maç'bike te.
Boy xweyîkî axa aza,
Wê tivinga xwe bide te.

FARÎZ FORTÛNA

Nema mine pêrozbayê stranbêjê ciwanî, pir merîfet
Farîz Fortûnaê şîrîn awazra:

*"Farîz, hizkirîê dê û bavê xweyî şîrînî delal! Min
van paşwextya rojnema "Jîyana kurd"-da wêneê te dît.
Wêderê usa jî gotar derheqa teda hatibû nivîsarê. Min bi
hewaskarîke mezin xwend. Rastî nêteke pir hîvî, homit dayî
hatim. Gotarvan culetekî bê xofî, diloan dinivîse: "Şikir,
şikir, îdî Tarkan, Rûsso û Sosoê me jî heye". Wê demê erş û
kursî têra şabûna min nekir. Çendekî şûnva min têlêvîzîona
dewleta Qazaxstanêda klîpên te jî dîtî. Ez jî culetekî
bawerkirî hatime ser nêta gotarvane cîda kivşkirî. Lema
min şabûna ev helbesta rewayî kemala teye pir merîfet
kir. Bira Rebbê Jorîn vê oxirêda sehet, qewet û saxlemya
bê qezya hergav têxe qismetê te. Xortên mîna teye navê gel
bilindkirî mera pir pêwîstin. Xwezil ev awazê te bigihîje
ezmanê Kurdistanê meye azaye, delal, bibe kubarya her
kurdekî şerefî, namûsî, pir welathiz.*

Bi hurmeteke hêjaye, bê ç'ilk,

Barîê Bala, 30.10.2013".

"ŞIKIR, ŞIKIR, FARIZ FORTÛNAÊ ME JÎ HEYE"

Dengî xweşbe, xortê delal,
Av vexwarye kanya zelal.
Loma dengê te zengile,
Dertê ji kûraya dile.
Xezna gelê te tijîye,
Çi bixwazî têda heye.
Şax-şaxîye, cewahire,
Tiverike, lel û dure.
Wî awazî Evdalê kal,
Qulingara bûye heval.
Îsa, Arif, Kawûs axa,
Hej xistine zera, şaxa.
Şayîr Mecît tev Sîsa Hûr
Ban kirine Başûr, Bakûr.
"Kurdistanê me zeynete,
Xêre, xezne, berekete".
Eşîşanê, Meyremxanê,
Canê, Besê, Gulistanê,
Gîhandine pakî dinê
Zelûlîa Kurdistanê.
Dema Şivan dike qîrîn,
Dilê neyar dibe birîn.
Diricife, xwe şaş dike,
Destê dayka kurd maç dike.
Kawe, Dîyar, Xelîl Xemgîn,

Fehrat, Armanc, Beyto, Bengîn,
 Şemdîn, Kazo, pirê hêja
 Ders dane te, wan lehenga.
 Egît, mêrxas, şêr, pilinga,
 Loma ketî zara, dila,
 Pir qedrî cem Barîê Bala,
 Bilind, bilind awaza te.
 Ez heyrana wî dengê te,
 Xwezil, xwezil awaza te
 Bigihîje welatê me,
 Tew malada, her şênyada.
 Bê pesnandin kemala te
 Xwedê mera bide nisret,
 Rojên aza, sehet, qewet.
 Em tev herin welatê dê,
 Têr bibînin wê cinnetê.
 Tu eşq û şa bilîlînî,
 Dil-hinava bihelînî.
 Ez helbestên xwe bixwînim,
 Hesret dilê xwe derxînim.
 Dilê min, te hêsa bibe,
 Xelata me boy gel ev be.

MÊVANÊN DELAL

*(Dema 2012-ê salê, cotmeha hezîranê, ji Herêma
 Kurdistan aza helbestvan Kek Hesên Slêvanî, Sulêman
 Îsmail Sulêman û jûrnalist Evdîle Selam Salih bûne
 mêvanê Rêspûblîka Qazaxstanê, ew usa ji bûne mêvanên
 me, kurdên, ku Qazaxstanê dijin. Min ev helbesta wê
 demê rewayî wan kir.)*

Hûn xêr hatin, delalên me,
 Pê-parê we ser ç'evên me.
 Eme zûda hîvya we bûn,
 Qeşav helya, derge vebûn.

Werin, ez we têr-têr maçkim,
 Pêş we bejna xwe xar bikim.
 Bîna welêt we bistînim,
 Rebbê Jorîn şikir bînim.

Jan û êşên me hesyaye,
 Ev hetevî mera daye.
 Rîên dirêj tew kin bûne,
 Ewrên tarî bela bûne.

Bila dubar were rehmê,
 Tew kurd xilaz bibin zulmê.
 Neyarên har bînin ser heqyê,
 Welatê me naske dinê.

ÇARXET



Eman, destê vê merezê
Ruhê min xar vê merezê.
Lokmanekî baş ku hebe,
Wê min dûrxê vê merezê.

* * *

Xwîna bilind bûye bela,
Min dûr naçe ez teşqela.
Wededa min ç'ar bikira,
Zêde nedibû eva kula.

* * *

Xwedê rehmî, bê qîl, qale,
Bê şîrîkî, bê hevale.
Wekî xwe jê dûr bigrî,
Nabî xwedî ewled, male.

* * *

Delalê min hatî, çûn,
Kesek nema, hemû çûn.
Kê boy gelê xwe kar kir,
Tenê ew man, ew neçûn.

* * *

Hemda Xwedê pir fireye,
Ew şihedê gunê teye.
Rya xirab venegerî,
Dawîê nîbe, xudyê teye.

* * *

Zulm pî digre, lê nameşe,
Behra wê roja reşe.
Kesê ku rêda diçe,
Dawîê timê vedireşe.

* * *

Gelekê me bûne padşa,
Wek erş-kursî em bûne şa.
Ça rûniştin li ser texte,
Me reşkirin, rozgar, bexte.

* * *

Dinya, hemû te ewirîn,
Lez û dereng çûn, buhurîn.
Kesê keda heram xwarin,
Zû ç'irûsîn, zû temirîn.

* * *

Kê cot mekir, erd mekola,
Dem derbazkir vik û vala,
Ew nagre qedrê nîne,
Birçî, tezî tim dimîne.

* * *

Zane xemla gelê xune,
Wekîlekî pir mezine,
Ew gelê ku bê zaneye
Nav gelada ew tuneye.

* * *

Rewşa ç'ya berf, barane,
Hebûna gel erf, zimane,
Ziman şîrê dayîkêye,
Dayî, sendî yek xudaye.

* * *

Kaltî, pîrtî ferze, heqe,
Ç'ya cîê xwe naleqe,
Hemû gemar têne xanê,
Kengê berf ku difeliqe.

* * *

Delalê min, vê rêda
Yar tim diçû, vê rêda,
Herdu ç'evêm qerimîn,
Îdî naçe vê rêda.



ZERDEŞTÊ KAL

(Poêma)



ÎDÎ RABE

Xwendevanên delale, pir hêja! Ez bi dilekî kulî, kovani, melûlî û pir perîşan dixwazim derbara xêlek bûyerên, ku nikaye vê dinya bê serobine, pir fireda bûne para gelê min, kîjan ku nelayîqî hemû rabûn, rûniştandin û xwestinên mirovaêne nikane, bi zimanê poezîaê nazikva wera hûr gilî qal bikim. Lê ez îlaca redbûna wan bûyerên, ku gelê min heya nika pê dizêre, tenê û tenê dubar zindîbûna hizkirî Xwedê pir qedrî, nebîrkirî Zerdeştê Kalî Nûranîda dibînim. Wekî ew bi rusqeta Rebbê Jor dubar ji gora sar rabe, rûdana xweye mînanî berfa yek şevêye paqije, bê telpe, çîle spî ji axa sar dawêşîne, pêş Rebbê Jor çok vede. Dilekî melûlî, pejmûr jê hezar-hezar carî hîvî û rica bike, wekî Xwedê Mezin hinekî rica wî qebûl bike, gelê wîyî koleyî, bê piştovan bê rehmê, axa gelê wî ji gemar û qirêja neyarên devxwîn aza bike. Kurd jî bibe xwedîê axa xweye dîrokîye, dewlemend.

BEŞA YEKÊ

Rabe, rabe, Zerdeştê Kal,
Mêze bike vê dinya qal.
Ew dinya dîtye te,
Lê çi dibe pey çûna te.

Niheq heqyê dixenqîne,
Nav êgirda dihelîne.
Îsaf, murwet pir kêmane,
Şeref ketye bin pîane.

Qetil roj-roj zêde dibin,
Dergên xêra qet venabin.
Xwînrêj bûye hukumdare,
Reh davêje ç'ep û xare.

Dirav ulim kirye sîê,
Kesek xwedîê lê dernaê.
Xirav girtye şûna xune,
Qenc mirye, deng jê tune.

Dizî bûye erf-edete,
Qavî bûye pir hurmete.
Nekir dikin sewqê, kêfê,
Karkir birçî diçin dinê.

Ç'ûk rûdinên destê jore,
Mezinara nadin dore.

Diaxivin bê sî, sewe,
Şev, roj kirine nolî heve.

Rastî dike zare-zare,
Ne pî davê, ne jî zare.
Fêla dike hingavtîe,
Bê xof dijîn, tirs nemaye.

Nîvî pirtir murvê dinê,
Boy parî nan dibin finê.
Kes pirsname halê wana,
Jan û êşa, derdê wana.

Kanên Xwedê daye benda,
Xercdikin boy kêfa, rinda.
Qismekî jî dikine ç'ek,
Pê dirêjin xwîna neheq.

Însaf yek selefek nîne,
Bira birê dixapîne.
Beravdike lep û dure,
Zil lê dibe çewal, têre.

Dinya ketye nav qezyaê,
Dike-nake, bin dernaê.
Wekî wabe, armanc ferze,
Wê şûna xwe biguhêze.

Qeyde, qanûn hindik mane,
Merhemetî tu cî tune.

Durûtîe penc vedaye,
Ne tu, ezim zêde bûye.

Xwînxar bûye femandare,
Agir, ala jê dibare.
Boy xêra xwe çerxa dinê
Difetlîne ç'ep û xare.

Bawerkirin bûye zilek,
Şert û şîrût bûne kelek.
Pismamî hatye hildanê,
Dost, hogirtî naên xanê.

Vîjdan bûye kor, ker, lale,
Maye bê cî him bê male.
Bike bîra şeve reşda,
Bê dem dike nale-nale.

Rast, helalî bûne hinek,
Kefilnevsî maye hevek.
Boy wê tu kes fikir nake,
Hukumdayî bûye ç'eke.

Laf, rezîlî, derew û vir
Rûniştine fêza lel, dur.
Dengê wan bomba zeximtîre,
Top û gulla zef qewatîre.

Li ku dibin, ew mêvane,
Bahar dibin, zivistane.

War, şênnya dîkin wêran,
Qîrîn diçin erşê-ezman.

Decal, fêlbaz tev rabûne,
Dinya nav xwe par kirine.
Heryek hukmek dimeşîne,
Pî davêjî, herder xwîne.

Rebbê Jorîn kes natirse,
Kî çi dike, kes napirse.
Şeveqbûne şeverêşe,
Rya herda kes nameşe.

BEŞA DUDA

Kesek halê me pirs nake,
Neyarê me ceza nake.

* * *

Zorê kirin em musulman,
Derî, rê, dirb pêş me dadan.
Dawyê tew bûn birê heve,
Em ji nav xwe kirin dere.

Kenyan, gotin: ev gel kîye,
Ku xulîqye, ku hatîye?
Dîroka me reş, heş kirin,
Şewitandin, bin ax kirin.

Kî cî rabû, bû gurê har,
Dewsa avê xwîna me xar.
Dilê meda şûr kûr ç'ikand,
Gir tew kuştin, hûr welgerand.

Bira kujî kire nav me,
Rya xirab danî pêş me.
Em ji hevdu cuda kirin,
"Ev gel tune" elam kirin.

Kîbûna xwe me bîr avît,
Bûn neyarê gelê xune.
Gulla ewil ser wî avît,
Dest xirabkir mala xune.

Hiş, mejûê me derxistin,
Mejûê xwe danîn dewsê.
Herdu ç'evên me derxistin,
Ç'evên xwe zû danîn dewsê.

Em xapandin, kor, ker kirin,
Welatê me tîş-tîş kirin.
Loma îro hemû dera
Kurd lê bûne gelek para.

Ereb dibên: "Hûn erebin",
Fariz dibên: "Esil farizin",
Tirk jî dibên: "Tirkê xasin",
Kîbûna me me napirsîn.

Me undakir welatê xwe,
Bûne dîlê ber deryaye.
Mêvan mane ser axa me,
Dil-hinavên me helya.

Etles, qumaş me hazir kir,
Ji me stendin, wana xwe kir.
Hebûn birin, welat rût ma,
Gel bê sitar ser rîa ma.

Belengazî mera anîn,
Agir, alav ser me danîn.
Em dizêrin, bes nabêje,
Roj, şev xwîna me dirêje.

Em bûn sexîr, ew têr dewlet,
Em bûn feqîr, wî girt dewet.
Av me anî, ewî vexwar,
Em bûn bedbext, ew bextewar.

Em ç'ilmisîn, ew beridî,
Me birc çêkir, ew bû xwedî.
Me ked hed rê, mane peya,
Wî kêr nekir, firî hewa.

Erd me kola, wî mêzekir,
Me xwîdan rê, wî kêf sewd kir.
Tim zêdekir navê hepsa,
Em avîtnê, derî dada.

Gul me çandin, tim wî bînkir,
Ç'ek da me, got: "Hevdu qutkir".
Nift me derxist, wî neft hilda,
Şabû, def û zurne lêda.

Dar me ç'ikand, wî behre xar,
Zik mezin kir, bû gurê har.
Rê me kişand, ew têda çû,
Me pir kasil nihêrî dû.

Welatê me bû goristan,
War û şênî kirin wêran.
Ah, zarê me naçe kesî,
Kesek li me nabe xwedî.

Me dikujin, em gunekar,
Qetla dikin, em qetilkar.
Ser axa me dikin bazar,
Vê rezîlyê kes nabîne.

Erş û kursî dişewtînin,
Bombê jerê dibarînin.
Part-part dibin cinyazê me,
Ceza nadne xwînxarê me.

Rebbê Jor bû dostê tewa,
Gi xilazbûn doz û dewa.
Navê me tê, deng jê naê,
Pî, gavekê ber me naê.

Berê xwe me guhastine,
Nabê, nabê "ev gel kîye?"
Şeveqên me bûne tarî,
Me dûr naçe ev hejarî.

Gelek qurne hatin û çûn,
Zulma serme kuta nebû.
Hemû dergên girtî vebûn,
Dergek pêş me qet vene bû.

Ya Zerdestê pir Nûranî,
Rabe, ji Rebb bike hîvî.
Dubar, dubar veke zare,
Jê ricake hezar care.

Ezmanê me zelal bike,
Neyarên me qutke, redke.
Em heqê xwe bibin xwedî,
Xirab bimre, bijî rastî.

* * *

Gelî dosta, janê pirin,
Hezar nînin, çend kulûrin.
Ez van jana kêra bêjim,
Weca dilê xwe çaw... birêjim?

FOLKLOR

(7 BÛYER)



BÛYERA YEKÊ

AXA Û XULAM

Rokê axê pir xwe razî
Xulamê xwe dike gazî.
Dibê: "Karê sibê bike,
Nolî hercar hespê zînke,
Oxira me xêlek dûre.
Boy xwe nan, av têxe tûre,
Şeveqê ber derê minbe,
Bisekine, hîvya minbe".
Xulam serê xwe mêl dike,
Qirkê êvraz belê dike.
Ew ranazê ewê şevê,
Dibe hogrê stêrka hîvê.
Şev li wîa dike yek sal,
Gelek dereng dibe zelal.
Berî banê dîkê sibê

Zîn datîne pišta hespê.
 Disekine ber dergê wî,
 Raç'av dike hatina wî.
 Dereng dertê axê dire,
 Diqore pir qure-qure.
 Bilind dike qîrîn, qûjîn,
 Wek sekî dir dike mirîn.
 Emir dike: "Hespê bîne,
 Dizgînê wê bikişîne.
 Xurckê dayne ser milê xwe,
 Qet bîr meke kîbûna xwe.
 Ber piê xwe rind mêzeke,
 Menzîl dûre, zû-zû gavke".
 Diçin, diçin, rê red nabe,
 Axa hespê peya nabe.
 Tarî erdê ku hildçine,
 Peya dibe ew ji zîne.
 Dibê: "Bese, ez westyame,
 Ser hespê pir leqiyame.
 Belkî hinek hêsa bibim,
 Sibê ser zîn xwe bigrim.
 Ezê razêm, tu hişyarbe,
 Ç'evê teyî li hespê be.
 Binihêre tew der-dora,
 Îtbar tune diza, gura".
 Xulam hespê ditewlîne,
 Ber zînda xwe ditelîne.
 Berî axê diçe xewê,
 Bîrê dertê gotina axê.
 Qasek şûnva hişyar dibe,
 Berbi hespê lez direve.

Hespê cîda ew nabîne,
 Nake gazî, ne qîrîne.
 Vedigere dîsa ber zîn,
 Zikê birçî dike qurîn.
 Pakî şevê çûnê şûnva,
 Axa nîvcî, nav xewêda,
 Xulam bilind, hêrs ban dike,
 Pirsê hespê ji wî dike.
 Xulam nava xof, tirsêda,
 "Hesp cîdaye, - dibêjêda.-
 Ez ku heme, arxayînbe,
 Kes nikare hespê bibe.
 Rehet razê, fikra meke,
 Teyr nikare min nukulke".
 Tevzî feqîr dixenqînin,
 Dora axê dibin, tînin.
 Ber xurcê xwe diqiflîne,
 Zîn hildide, xurc dimîne.
 Dibê: "Sibê min xurc hilda,
 Zînê ese bimîn cîda.
 Axa hespê ku nabîne,
 Wê serê min hilqetîne.
 Wê laşê min bin ax bike,
 Kevir, kuç'ka ser min komke".
 Xêlek şûnva dîsa axa
 Hêrs radibe ser herd pîa.
 Herd ç'evên xwe mehez dike,
 Dîsa pirsê hespê dike.
 Xulam dibê: "Rehet razê,
 Mefikire seva hespê".
 Axa dubar dike xurîn,

Vedileze mîna heywîn.
 Valî-walî xwe bordike,
 Dest û piên xwe badike.
 Zexim dike ire-ir,
 Wek hirç'ekî nêrî hure.
 Hindik dibe sibe ronbe,
 Axa dîsa xew radibe.
 Dibîne xûlam telyaye,
 Bûye gulok qifiliye.
 Ça qareqît nalipite,
 Tenê dike qurte-qurte.
 Sert dipirse: "Çi qewimye?
 Ew çi kule tera hatye?
 Rabe, hespê zîn, basûdke,
 Xurckê hilde, hereketke".
 Xulam wî tirs mêze dike,
 Hêdî serê xwe badike.
 Dibê: "Ez ku xurckê hildim,
 Lê zîn, gemê kêra bidim?"
 Axa dubar dihurmute,
 Ew dimîne wî bikuje.
 Emir dike: "Hespê bîne,
 Teng, basûda bişidîne,
 Oxira me gelek dûre,
 Rya me tew xişrê hûre".
 Xulam serê xwe badike,
 Kasil, kasil elam dike.
 Dibê: "Axa, biborîne,
 Dizî zûda hesp birine".
 Axa îdî cunu dibe,
 Zexm diqîre, îdî radibe.

Dibê: "Ew çi hewaldine,
 Ecel rabe ser pîane.
 Hespê bîne, zû-zû zînke,
 Xurckê hilde, destbi rêke".
 Xulam li wî mêze dike,
 Difirfite, xwe badike.
 Ji wî zexmtir dike qîrîn,
 Nolî şêra dike nirîn.
 Tûr hildide, dikeve rê,
 Nanihêrî rûê axê.
 Venagere rya hatî,
 Zîn, xurcîkê davê ser wî.
 Axa zîz sert wî badike,
 Qema zîvîn lê werdike.
 Xulam fikrê nade wîa,
 Rê dide ber gava, pîa.
 Têlmaş dibe perîşane,
 Hêrs rûdinê ser çokane.
 Zîn, xurcîkê dinihêre,
 Nizane wan ça hilgire.
 Zîn hildide, xurc dimîne,
 Xurc hildide, zîn dimîne.
 Ber xwe, pêş xwe reş dibîne,
 Binefişka hildikşîne.
 Zîn, xurcîkê hildigire,
 Xwe şaş dike, kalî here...

Berya gotye:
 "Kî çi diçîne, wî diçîne,
 Dawîê cezê xwe distîne".

BÛYERA DUDA

"HEQ HEYE, DÎWAN TUNE"

Qalkir ferih wa qal dike,
Vê bûyerê zelal dike.
Hebûne du kurkên hempa,
Bûne hogrên roja, şeva.
Nexwarine bê hev av, nan,
Tewa xwezî anye wan.
Herdu bava, herd dayîka,
Cil kirîne boy herd kurka.
Tev xwarine, tev razane,
Gavek hevdu dûr nemanê.
Roj, meh diçin, sal pir dibin,
Herd weke hev givre dibin.
Digihîjne rû, simêla,
Dinihêrin hemû hêla.
Cilê xwe zû diguhêrin,
Qenc û xirav hev dijbêrin.
Dîlan, cejna xwe nadin paş,
Nav derdixin ça xortên baş.
Sergovendê nadin kesî,
Mêze dîkin keç'a dizî.
Kubar, kubar êmin dibên,
Sera xwe kesîra nabên.
Keç'a dibînin nav êlêda,

Dîlan dîkin rojekêda.
Sal dû hevdu zû difirin,
Zarok zû-zû zêde dibin.
Kesîbtî wan zor dike,
Têr nabînin nanê zike.
Herd rojekê mînanî bira
Dibên: "Em herin ji vira.
Belkî parî nan qazanckin,
Zarokê xwe pê givirkin".
Rojekê ew zû bin şevê,
Tevî hevdu dikevne rê.
Gelek diçin, hindik diçin,
Hev naqetin, tevhev diçin.
Pir rojên ba, berfen, tarî
Ji emrê xwe dîkin zarî.
Dertên ser du rîên cuda,
Dikewgirin halê xweda.
Welêt dibin gelek dûre,
Parîê dawîê derdixin tûre.
Nîvî dîkin, tevhev duxun,
Dest hevduda wa sond duxun,
Wekî nemrin, sax bimînin,
Ew vê sondê biqedînin.
Deh sal şûnva vê rojêda,
Vê mehêda, vê demêda,
Vira hevdu raç'av bikin,
Çi anîne hev nîvîkin.
Paşê herin nav êla xwe,
Bilind bigrin tim serê xwe.
Her yek rêkê diborîne,

Boynet parî nan bibîne.
 Yek dimeşe ber Başûre,
 Yê din diçe ber Bakûre.
 Herhek diçe welatekî,
 Wir bibîne şuxulekî.
 Dema ber mal ku vegerin,
 Xîret, namûs cot bigerin.
 Heryek xwera cîk dibîne,
 Çi dişuxule, wî distîne.
 Yek kara xwe berav dike,
 Meha, sala hesav dike.
 Hindik dixwe, kêr rûdinê,
 Ruh, canê xwe dike finê.
 Berav dike xêlê zêre,
 Diran diçin, pişt lê xare.
 Bejna taylan unda dike,
 Şiklekî nuh li xwe dike.
 Boy zarê xwe ax, of dike,
 Çi distîne, berav dike.
 Yê din kêr-kêr dişuxule,
 Nasekine, naedile.
 Zû bîr dike boy çî hatye,
 Çima welêt dîr ketîye.
 Çi kar dike, tewî duxwe,
 Diberide, dinepîxe.
 Xirabara dibe hogir,
 Jê dibare alav, agir.
 Kêf û sewdê paş namîne,
 Qenc û xirab nahêvşîne.
 Meh, sal diçin, dem îdî tê,

Emrê çuyî paşda naê.
 Hişyar dibe, tûrî vala,
 Dikeve nav kûr mitala.
 Xwe dihesê, dem hatîe,
 Gerek sondê bîne cîe.
 Bixaz, nexaz, dertê ser rê,
 Bigihîje şûna sondê.
 Şeva, roja rê gav dike,
 Bona sonda xwe heq bike.
 Yê dinê jî dikeve rê,
 Lez, bez diçe şûna sondê.
 Hemîn rojê, hemîn demê,
 Fedî nakin surê, sermê.
 Cîe sondê hev dibînin,
 Hêsrên şewat dibarînin.
 Xêlek şûnva dostê yekê
 Keda xwe datîne ortê.
 Dibê: "Birak, tu jî bîne,
 Qirar yeke, dudu nîne.
 Em keda xwe tevhev bikin,
 Paşê hevdu nîvî bikin.
 Serfînyaz herin welatê xwe,
 Bilind bikin nav, dengê xwe.
 Dostjîa xwe dubar bikin,
 Rehet, kubar emir bikin".
 Xayîn li wî mêze dike,
 Diranê xwe sipî dike.
 Dibê: "Dostêr, biborîne,
 Dostaêda êtiv nîne.
 Welleh, min çî kar kirîye,

Berav nekiryê, tew xwaryê:
 Kêf û sewqê dûr nemame,
 Wext, wedeê te temame.
 Ezê te vir kormendîkim,
 Tûr, berîka xwe tijîkim.
 Dîsa bikim kêfa xune,
 Mezin bikim zarê xune.
 Pirskin, bêjim: min nedîtye,
 Ez nizamim kalî çûye”.
 Heval ji wî rica dike,
 Dibê: “Keda min nîvîke.
 Nîvî tera, nîvî minra,
 Dîsa bijîn nolî bira”.
 Qayîl nabe vê gotinê,
 Dibê: “Îtbar tune dinê.
 Tuê welêt min rusakî,
 Tewî destê min xilazkî.
 Mirine goh seqirye,
 Kedkira ked nexwarye”.
 Feqîr digrî, dike zarî,
 Dubar, dubar dike hîvî.
 Lavaî wî qet kar nakin,
 Dilê kevir qet nerm nakin.
 Xayîn Xwedê fêdî nake,
 Gotina xwe cî-cî dike.
 Laşê wîa davê ser rê,
 Berbi welêt dikeve rê.
 Digihîje nav êla xwe,
 Zû pirs dike hogirê xwe.
 Hemû dibên: “Nehatîe,

Kes nizane ew li kuye”.
 Xêlek digrî, ax, of dike,
 Pêş zarên wê xwe mêl dike.
 Dibê: “Rya me cuda bû,
 Qet nizanim, ew kuda çû.
 Dema qetyan em ji heve,
 Kasil-kasil gotem eve.
 Dema ji mal ez bûm dere,
 Jina min da ev xebere.
 Got: mêro, ez duhalyame,
 Wê zêdebe zarokê me.
 Min sparte: ewê zarê
 Bilind bigre tim qedrê wê.
 Boy navê we lez mekeve,
 Xwedê daye, bila hebe.
 Min ku anî risqê wîye,
 Ezê daynim navê wîye.
 Rica dikim, tu bêje wê:
 A, va dayne navê zarê.
 “Heq heye, dîwan tune”.
 Biqedîne gotina mine”.

* * *

Rojeke xweş, roja Xwedê
 Padşa, wezîr dertêne rê.
 Welêt digerin çendekî,
 Tev bimînin herd li cîkî.
 Dema ew dikevin gunde,
 Dêk ban dike kurkê rinde:

“Ay, heq heye, dîwan tune,
 Ay, heq heye, dîwan tune,
 Îdî were, hîvya teme.
 Ez qurbana navê teme,
 Ne xwarina te sar dibe,
 Wê lîstikê îdî berde”.
 Padşa dibhê ku wî dengî,
 Wezîrê xwe dike gazî.
 Dibê: “Hînbe, ew dê kîye,
 Kê ew nava wî danîye.
 Wê zû bîne tu cem mine,
 Bîqedîne emrê mine”.
 Wezîr daykê zû dibîne,
 Emrê padşê diqedîne.
 Padşa daykê qebûl dike,
 Mena nav ji wê pirs dike.
 Dayîk vê bûyera mezin
 Diaxive bi serobin.
 Padşa rehet wê dibihê,
 Şaş dimîne li vê qehpê.
 Emir dike xayîn bînin,
 Stûê wîya hilqetînin.
 Bê hed, hesab tê xezevê,
 Malbeta wî naê rehmê.
 Heqê sêwya jê distîne,
 Welatê xwe dûr dixîne.
 Tewî dide dayîka jare,
 Dibê: “Meke ah û zare.
 Li heqê xwe bibe xudan,
 Xayînara tune îmkan.

Qet bîr meke vê kalamê,
 Şikê meyne kîrnê Xwedê.
 Xêr û guna ew dikşîne,
 Par, par dike, hê dimîne.
 “Heq heye, dîwan heye”,
 Hinek zû, derengî heye.
 Zulum bê caw qet namîne,
 Herkes cezê xwe dikşîne.
 Kî çi dike, li xwe dike,
 Axê ser xwe eleke dike.
 Şuxulê qelpa nagre pîê,
 Dawî timê paşmanîê.



BÛYERA SISYA

PADŞA KUR AZA DIKE,
DAYKA MELHÛM DARDA DIKE

Welatekî dûrî ç'eva,
Hinek şênî, hinek ava,
Deşt, zozanên wê pir bûne,
Kanîe wê sar av bûne.
Daristana tehr vedaye,
Xuşe-xuşa dehra bûye,
Bilbil gula çûne gula,
Bilind bûye dengê kewa.
Murvîn wê kedhiz bûne,
Dilovane, şeref bûne.
Li wir jîye dêke osin,
Hevsûdîye, pir dûr pesin.
Der-cînara kar kirye,
Ew şêmîkê dûr meçûye.
Dû hemûya hewaldaye,
Fîl xirabe, kîn, rik bûye.
Ç'evnebare, pir derewbêj,
Kotî, pintî, dilva qirêj.
Tûrî tijî vir, viz bûne,
Dîtî jî wê cuda çûne.
Kesî jî wê hiznekirye,
Dergê wê venekirye.

Nekirye pirs-hewale,
Nehîştine bikev male.
Derdê wê mêr zû rêkirye,
Hîvya dergûşekî maye.
Dergûş dibe ku deh sale,
Agir, alav jê dibare.
Tore, telîm bê par bûye,
Dê çi rêtye, ew hildaye.
Hevalara tim şer kirye,
Kîn, kudretî, xezev bûye.
Dema pozxwîn hatye male,
Kolanêda bûye qale.
Dest xar kirye bêrîka xwe,
Dizî kirye pêşekê xwe.
Ewil hêkek anye male,
Dê xweş hatye ev ewhale.
Cî rabûye, kur maç kirye,
Gotye: "Kurêm, sed eferim,
Timê bibe destmikerim.
Vê rê baştir rê tunene,
Birçî mehel dayîka xune".
Çend roj şûnva kurê tolaz
Dikeve mal gelek kêfsaz.
Mirîşkekê derdixîne,
Dê bextewar xwe dibîne.
Dîsa wî gerî hemêz dike,
Tivdarekê xurek dike.
Temê şîrîn têr-têr duxun,
Serda tasek av veduxun.
Cînara zik dive avê,

Tew nepetyê tînine dê.
 Dema dibe rû, simêlê,
 Tirsek pêş wî dibin mêlê.
 Çi kete ber, nahêvşîne,
 Coxvêl dike, tewî tîne.
 Dê wî timê dipesine,
 Dîbê: "Kurê, dîsa bîne".
 Cem hevala dibe nav "baş",
 Dê xwedike etlez, qumaş.
 Dixemile nolî bûka,
 Têpa dide mezin, ç'ûka.
 Rojek kurê devxwînî, har,
 Hewşa padşêda dibe xar.
 Deveke wî vedke, tîne,
 Xûlam dûrva wî dibîne.
 Padşa dibihê vê cawê,
 Dide hukmekî xezevê.
 Dîbê: "Diz zû bigrin, bînin,
 Kap têxne stu, bixenqînin".
 Xulam diz tînin meydanê,
 Wekî bidne xenqandinê.
 Padşa hêrs zû hukum dike,
 Diz destê xwe bilind dike.
 Dîbê: "Heye ricake min,
 Bila dayka min bê ce min.
 Jê bixwazim ez xatrê xun,
 Maç kim zimanê dayka xun.
 Şîrê wê xwe helal bikim,
 Çend weysetê xas jê bikim".
 Padşa hîvyê qebûl dike,

Demekê wê sebir dike.
 Dîbê: "Berdin, dayîka wîye,
 Bê çi dibe, lawê wêye".
 Dema tînin dê cem wîye,
 Ew jê dike vê hîvyêye.
 Dîbê: "Bide zimanê xwe,
 Maç kim, rehetkim dilê xwe.
 Paşê herim axa sare,
 Pêş te nebim gunekare".
 Dayîk zimanê xwe didê,
 Ew qut dike, davê erdê.
 Padşa şaş dibe ecêbê,
 Dikeve nav behra xemê.
 Serê xwe nerm bilind dike,
 Vê ecêbê kur pîrs dike.
 Dîbê: "Çima te awa kir,
 Eva zulma dayka xwe kir?"
 Diz vedike ewê sêrê,
 Dîbê: "Esil dize ev dê.
 Min hêk anî, wê got "bîne",
 Mirîşk anî, kir "amîne",
 Berx, mî anîn, ez pesinîm,
 Ga, hesp anîn, nesekinîm.
 Har bûm, tu kes hesab nekir,
 Eva xwelî ser xwe werkir.
 Min çi anî, wê got "bîne",
 Negot "dest jê vekişîne".
 Wekî pêşya min bigirta,
 "Dizyê meke" tim bigota,
 Minê helal qazanc kira,

Boy xwe sitarek çêkira.
 Nedihatim ez îro vir,
 Nediketim vî agrê gur.
 Rica dikim, mehêvşîne,
 Hukmê xwe biqetîne.
 Bira stuêm hilqetînin,
 Min rezîlî pir nebînin.
 Ew ne dêye, hirç'e, gure,
 Melhûmeke dil kevire.
 Qenc ne gotye emrê xweda,
 Xwezil nebya ew ji dêda.
 Zimanê wê wekî hebe,
 Wê mehêle kes hewalde.
 Timê xirav reşandîye,
 Qenc zarê wê derneketye.
 Xar û vexwar bû elbetan,
 Bîrkir hene rojên giran.
 Ew ji wêra pir hindike,
 Bila wabe, ew ç'ileke".
 Wê demê padşê pir aqil
 Dide hukê xweyî aqil.
 Dibê: "Berdin ewî xortî,
 Darda bikin dayka kotî".
 Emrê padşê tê qedandin,
 Kêfxweş dibin piç'ûk, mezin.

Berya gotye: "Diz nabe mal,
 Lê xwedîê malê ji maltîê derdixe".
 "Emrê dizîê, qavîê çil roje,
 Sîa wê weke buşkulekêye".

BÛYERA ÇARA

"BERÊ BIPÊJE, PAŞÊ BIRÊJE"

Rojeke Xwedêye nav rojada gelekî başe, şîrînda padşa
 wezîrê xwe banî cem xwe dike. Xêlekî hevpeyvandinê şûnva
 armanca bankirina xwe wîra qal dike. Ew hevdura qirar
 dikin, wekî rojekê berî xewê rabûna xulam, olam û mirovên
 padşalixêye din dilqê dewrêşada dizî ji padşalixê û bajêr derên,
 bê deng, bê hes çendekî welatê xwe bigerin. Hal û jîyana
 hemwelatîê xwera bibine nas. Ew gelek bajara û gunda digerin,
 rastî pir bûyerên baş û nebaş tên. Geh şadibin, geh jî pejmûr
 dibin. Rojekê digihîjne bajarekî ne ewqasî avaî, ne jî mezin.

Dema rex sûreke kevirîye bilindda ku dibuhurin, padşa
 dibîne ser sûrêda mirovek nav cilên kivitike, qirêjda velezyaye,
 razaye. Çiqas mêş, moz ser wî datînin, ew qet eynî xwe dernaxe.
 Ne hişyar dibe, ne jî xwe dilipitîne. Padşa vedigere cem wî,
 xêlekê lê mêze dike. Him hêrs dibe, him jî gunê wî lê tê. Ji
 berîka xwe kaxetekî morkirî derdixe, lê dinivîse: "Kurê min, tu
 mirovî – here nav mirova. Heywanî – here nav heywana". Kaxet
 datîne ser sîngê wî û oxwera xwe berdewam dike. Xort xêlekê
 şûnva hişyar dibe. Dema dixwaze rabe, kaxet dikeve erdê. Kaxet
 hildide, diçe cem mellê bajêr. Dema melle kaxet dixwîne, ç'evê
 wî dertêne ser tepa wî. Zû ji cîê xwe radibe, ber wî pate dide,
 hed destên wî maç dike. Dibê:

- Ez xulam, tu kurê padşê. Te çima xwe kirye vî halî?

Tafilkê jêra destê kincên nuh distîne, xêlê dirav didêda.
Halekî durûda wî verê dike.

Xort îdî dizane, wekî kaxetda çi hatye nivîsarê. Rastî kê
tê, dibê:

- Ez kurê padşême.

Melle jî kê dibîne, dibê:

- Ew xort kurê padşêye.

Hemû mirovên bajêre navûdeng, dewlemend dema rastî
wî tîn ber wî serê xwe xar dîkin, paşê banî meclîsên hurmete
mezin dîkin, fêz tewa didine rûniştinê. Mal-dewlet, xelatên pir
baha serda hildişînin.

Ew mesele digihîje mezinê bajêr. Ew jî tê dîtina wî xortî.
Kaxet dixwîne. Xêlê mal-dewlet danê şûnva cîkî bajêrî herî
bedewda qesreke layîqî kurê padşê dibaxşînêda. Nava wedekî
kurtda xort dibe dewlemendekî bajêrî herî mezin. Îdî kes nikare
mal-dewleta wî hesab bike.

Ew mesele diçe digihîje padşê. Padşa pir hêrs dibe, wî zû
banî cem xwe dike. Banî celata dike, wekî serê wî lêxin qutkin.
Dema padşa ku dixwaze emir bide, ew destê xwe bilind dike.
Jê hîvî dike, wekî ew îmkanê bide rica xweye kutasîê elam
bike. Padşa xwestina wî qebûl dike. Xort ew kaxet berîka xwe
derdixe, dide padşêda. Padşa kaxet dixwîne, xêleke xurt dikeve
nav mitalada. Paşê serê xwe bilind dike, bin lêvada hevekî
vedibeşîre. Wî efû dike. Dibê:

- Bendê Xwedê, gunê min te hat. Loma min ew kaxeta
nivîsî, danî ser sîngê te. Got belkî tu şerm bikî, herî tevî mirova
bibî, ji vî halî derêy. Destbî xebatekê bikî. Te hetanî nika çi
kirye, îdî bese. Here, rehet bijî. Dest van fên-filaza xwe bikişîne.
Îdî bese navê minra bilîzî. Cara duda, wekî van kirinên xwe
biwekilîni, êz îdî te nabaxşînim.

Vê demê ez weyseta kal-pîraye baha qîmet dikeve bîra
padşê:

“Mirov desta dişimite, xwe digre,

Pîa dişimite, xwe digre,

Lê wekî dev dişimite, îdî nikare xwe bigre”.

Padşa şaşya xwe fem dike. Dibê:

- Berya rast gotye: “Berê bipêje, paşê birêje”. “Berê
bipîve, paşê bibire”.



BÛYERA PÊNCA

AQIL TACÊ ZÊRÎNE, SERÊ HEMÛ KESÎDA TUNÎNE

Mirovekî pir aqilî, zef dunê zaneî, dewlemend hebûye. Ferqut du ewledên wîye kurîn hebûne. Ew rojekê herdu lawên xwe banî cem xwe dike. Dibê:

- Gelî lawên mine delale, pir hêja! Min emrê xweda gelek rojên germ û sar dîtine. Lê ez ber tu tiştî feqîr, pejmûr nebûme. Tu cara ji xebatên giran, sivik netirsyame. Çi qirar kirye, ew jî zêde-zêde qedandye. Pir-hindik ev mal-dewlet boynet we qazanc kirye, wekî hûn paşeroja xweda tu çetinaya mekişînin. Nika ez îdî kal bûme. Ezê nikaribim serwêrê vê mal-dewletê bikim, wekî wê destê xweda xweykim. Boynet wê jî min qirar kirye ez hebûna xwe gişkî têkme sê para. Heryek me para xwe hilde, lê bibe xweyî. Lê ezê para we ser vî şertî wera bidim: we para xwe hildanê şûnva gerekê her qulç'ekî welatê xweda xwera malekê çêkin, wekî paşî mirina min hûn bikaribin serê xwe pê wan mala xweyî bikin.

Ew ewil para kurê xweyî mezin didê. Dibê:

- Kurê min, ev para teye. Here, her qulç'êke welatê xweda xwera malekê çêke. Kengê diravê te xilaz bûn, wê demê paşda were. Ezê tevî te herim, hemû malên te binihêrim bê te şîreta min çawa mîaser kirye.

Ew diravên para xwe hildide. Her bajarekî, her gundekî welatê xweda xwera maleke pir bedew çêdike. Perê wî xilaz

dibin, paşda vedigere. Dilekî eşqî, şa diçe huzûra bavê xwe. Elametîê didêda, wekî gotina wî qedandye. Çendekî şûnva ev tevî kurê xwe diçe hemû malên wî çêkirine û dinihêre – mal bedew hatine çêkirinê. Her tiştî timtêşa xwedaye. Lê nav wan çend rojanda kesek derê wan venake, kesek wanara selamekê jî nade. Ew paşda vedigerin.

Bav banî kurê xweyî piç'ûk dike. Diravên para wî jî didêda. Şerta xwe wîra jî dibê:

- Kurê min, bîr meke. Ezê tev te jî herim malên te jî binihêrim, ha!

Kur para xwe hildide, oxira xwe didomîne. Digihîje kîjan bajarî, kîjan gundî, pêra-pêra pirs dike: “Vî bajarîda, vî gundîda kurên başe navûdeng kîne?” Ew wan dibîne, tevî wana çend rojan duxwe, veduxwe, derbazî cîê din dibe. Bi vî cûreyî hemû diravên xwe xilaz dike. Paşda vedigere, tê huzûra bavê xwe.

Çend roj derbaz dibin. Bav rokê dibê:

- Kurê min, nika nobeta teye.

Kur û bav digihîjne kîjan bajarî, kîjan gundî, kurên wire başe bi navûdeng wan bi def, zurnêva qebûl dikan, dertêne pêşwazya wan. Dibine meclîsa girane. Pir hurmet hemû cîa usan tene qebûlkinê. Armanca xwe qedandinê şûnva paşda vedigerin.

Bav dîsa her kura banî cem xwe dike. Kurê mezinra dibê:

- Lawo, te şertê min neqedandye. Para xwe agir berdaê şewitandye. Xwelya wê jî daye bê. Lawo, mala bê çûyî, bê hatî, bê mêvan, bê cînar qesreke cinnetê be jî qîmetê wê weke qîmetê holç'îkekê jî nîne.

Kurê piç'ûkra dibê:

- Lawo, sed eferim tera! Te şertê min, xwestina min zêdetir qedandye. Lawo, holç'îk tijî çûyî, hatî, mêvan, cînare, bi

heval-hogir qesreke cinnetê baştir û zeltire. Mirovê bê dost, bê heval-hogir – teyrekî per-bask şikestîye. Berya gotye: “Dostekî baş birakî nebaş çêtire”. Min tew kirinên te dîtin. Ez îroda para xwe jî didime te. Ezê îdî mala herdda rehet razê. Te jî dewsa xwe mezinê malê kivş dikim. Biraê xwe ber ç’evê xwe bernede. Nav emirda timê xweyîfê lê bike.

“Aqil emirda nîne. Gerekê cîda hebe”.



BÛYERA ŞEŞA

KURÊ DAYÎKA XWE PIR HIZKIRÎ

Dê û bavê kurekî tenê hebûye. Bavê wî gelekî wede zûtir dinya xwe diguhêze. Ew û pîredayîka xwe tenê dimînin. Wext, wede tê digihîje. Dayîka wî îdî pir pîr dibe. Qewet dikeve, nikare ji cîê xwe rabe. Ew sebetekê çêdike, wê dike sebetê. Hildigire û sibê hetanî êvarê danayîne erdê, tamam rojê ser pişta xweda digêrîne.

Xêlek sal derbaz dibin. Dê îdî lap hal dikeve, dibe pûnç’ikekê. Dilê wê debar nake. Ew rojekê digrî, ji wî rica dike, wekî ew wê ji sebetê derxe, wekî îdî ewqasî zehmet mede xwe. Ew bixwaze, nexwaze rica dayîka xwe qebûl dike. Êvarekê halekî pir pejmûrda wê ji sebetê derdixe. Dê xêlek, duda li wî dinihêre.

Ew dayîka xwe mêze dike, kelogirî dibe. Naxwaze dayîka wî wî usan kelogirî bibîne. Dizîkava dertê devra. Xêlekê bîna xwe distîne, hêsa dibe. Walî-walî, der-dorê xwe dinihêre, ç’evê xwe dûr-nêzîk digêrîne. Dibîne, wekî wî pêştir kesek tunene. Nav hêsrada hêdîka herdu destên xwe quloz dike. Ban gorî Rebbê Jorîn dibe, dibê:

- Ya Rebbê Jorîn, îdî her tişt teva agaye. Tu dizanî, wekî ev çend salin min dayîka xwera çiqas ezyet kişandye? Lê ez tenê tiştekî ji te hîvî dikim. Dixwazim bizanibim – ez çawa ewled ber ezyatê dayîka xwe derketime yanê na?

Ji jorda dengêkî zelalî, ferihî, şîrîn nazil dibe. Dibê:

- Bendê min, ev ezyatê, ku ev çend salin te dayîka xwera kişandye, ne weke ezyatê dayîka teye şevêkêye, ku wê wê şevê tera kişandye. Dema tu ku zar bûyî, dayîka te şîrîn razabûye. Tu hişyar bûyî, girayî. Ew ji xewa şîrîn nivcî rabûye, tu mêjadî. Pêç'eka te vekirye, guhastye. Îdî ranezaye. Heta sibê ber hêleşana te rûniştaye, tera "lorê-lorê" gotye. Geh hênciye, geh hişyar bûye. Netika wê darê pêç'eka te ketye. Ew ezyatê, ku te kişandye, ew weke ezyatê wêî wê şevê nîne.

DAYÎK

Ji te mestir kesek tune,
Te şîrîntir tu tem tune.
Hemêza te heq cinnete
Wê evzeldir cinnet tune.



BÛYERA HEVTA

XEZALA BIRÎNDAR Û BEQA XWERAZÎ

Rojekê beq dîsa mînanî hercar nav herya hezekêda xwe valî-walî hildqewêşe. Bilind, nizim banzdide, dike qure-qur. Noqî bin kevza kolên tûzika dibe. Dertê, hinekî bîna xwe distîne, dubar noq dibe. Herî û belç'ikên tûzikê tijî ser serê dibin. Halekî elîwetî, pir qirêjda xwe kendalê golêra digihîne. Nişkêva xezaleke birîndare nav xwîna sorda gevezbûyî dibîne. Xezal dike inte-int, xwe valî-walî bordike. Wê ça êşa gulle herçar pîên xwe, geh evraz, geh berjêr dike, ji kûraya dil keserên şewat dikişîne. Ç'evên xweye reş belek ji heqara derdixe.

Beq tê ber xezalê disekine. Xêleke xur ç'evê wê dinihêre. Zaravekî şîrînî, dostanî halê wê dipirse.

Xezal halekî pir giranda derbara nêç'îrvanê dilkevîrî, bîsafda wêra qal dike. Beq serê xwe geh bilind, geh evraz dike. Rûje-tûj ç'evê xezalê dinihêre, kesereke kûr dikişîne. Bejna xweye elîwete, xaro-marî rast dike, dubar ç'evê wê dinihêre, dibê:

- Eh, xûç'a mine delal, ez nizanim ev nêç'îrvanên ç'evrijyaye, dilkevîr çi ji min - xezala nav avên sare, zelale paqij, çi ji te - xezala bê gunê - dixwazin? Çima nahêlin em hinekî rehet bijîn?

Xezal zorê ç'evê xwe vedike. Serê xwe hevekî bilind dike, dîsa kesereke kûr dikişîne. Kasil-kasil wê mêze dike. Dibê:

- Bendê min, ev ezyatê, ku ev çend salin te dayîka xwera
kişandye, ne weke ezyatê dayîka teye şevêkêye, ku wê wê şevê
tera kişandye. Dema tu ku zar bûyî, dayîka te şîrîn razabûye. Tu
hişyar bûyî, girayî. Ew ji xewa şîrîn nîvcî rabûye, tu mêjadî.
Pêç'eka te vekirye, guhastye. Îdî ranezaye. Heta sibê ber
hêleşana te rûniştaye, tera "lorê-lorê" gotye. Geh hênicye, geh
hişyar bûye. Netika wê darê pêç'eka te ketye. Ew ezyatê, ku te
kişandye, ew weke ezyatê wêî wê şevê nîne.

DAYÎK

Ji te mestir kesek tune,
Te şîrîntir tu tem tune.
Hemêza te heq cinnete
Wê evzeldir cinnet tune.



BÛYERA HEVTA

XEZALA BIRÎNDAR Û BEQA XWERAZÎ

Rojekê beq dîsa mînanî hercar nav herya hezekêda
xwe valî-walî hildqewêşe. Bilind, nizim banzdide, dike qure-
gur. Noqî bin kevza kolên tûzika dibe. Dertê, hinekî bîna xwe
distîne, dubar noq dibe. Herî û belç'ikên tûzikê tijî ser serê
dibin. Halekî elîwetî, pir qirêjda xwe kendalê golêra digihîne.
Nişkêva xezaleke birîndare nav xwîna sorda gevezbûyî dibîne.
Xezal dike inte-int, xwe valî-walî bordike. Wê ça êşa gulle
herçar pîên xwe, geh evraz, geh berjêr dike, ji kûraya dil keserên
şewat dikişîne. Ç'evên xweye reş belek ji heqara derdixe.

Beq tê ber xezalê disekine. Xêleke xur ç'evê wê dinihêre.
Zaravekî şîrînî, dostanî halê wê dipirse.

Xezal halekî pir giranda derbara nêç'îrvanê dilkevîrî,
bêisafda wêra qal dike. Beq serê xwe geh bilind, geh evraz dike.
Rûje-tûj ç'evê xezalê dinihêre, kesereke kûr dikişîne. Bejna
xweye elîwete, xaro-marî rast dike, dubar ç'evê wê dinihêre,
dibê:

- Eh, xûç'a mine delal, ez nizamim ev nêç'îrvanên
ç'evrîjyaye, dilkevîr çî ji min - xezala nav avên sare, zelale
paqî, çî ji te - xezala bê gunê - dixwazin? Çima nahêlin em
hinekî rehet bijîn?

Xezal zorê ç'evê xwe vedike. Serê xwe hevekî bilind
dike, dîsa kesereke kûr dikişîne. Kasil-kasil wê mêze dike. Dibê:

- Beqê, welleh, belkî ez bi vê gulla nêç'îrvanê şewate,
kûr hinekî jî bêşyama, lê te bi wê himberîkirina xweva mirina
min nêzîk kir.

Ji herdu ç'evên xweye reşbelek du hêstra berjêr dike.
Ç'evê xwe digre, dinya xwe diguhêze.

Berya gotye: "Gulla neyara qarê netutişta çêtire".



ŞÎRETNAME



*Ez van çend şîretên xweye baha qîmet çawa spartin
didîme herdu lawêd xweye delale hêja Elî û Anar, wekî
ew nav emirda wan xwera têxne
rênîşa xweye heqe û bê qerez.*

1. Lawên mine pir femkirîye, qedir bilind! Ewil, ewil
hûn qet bîr mekin, wekî lawên kêne, ji kîjan eslî û
kîjan malbetêne, hûn kêne, hûnê bibîne kî.
2. Dema dixwazin tişteki kêrhatîyî nuh bikin.
Ewil rewşa dinê û rewşa xwe ber ç'evên xwera rind-
rind derbaz bikin. Bipalînin, bigivişin, ne pêwîst jî
cuda bikin.
Dubar, dubar hildin, daynin, bipîvin, hê bibirin. Qenc,
xirab hevdu derxêrin. Xêr û zîyana xwe himberî
hevdu bikin. Dest dide – bikin. Na mekin sewdaê we
ku hevdu girt. Hê armanca xwe elamkin û biqedînin.
3. Tu tiştî hevdu veneşêrin. Sêra dilê xwe xwe pêştir
kesîra nebêjin. Deva, ç'eva menihêrin. Deva nihêrî
dawîê paşîa dihesirin. Qet mehêlin mîkrobên ezim,
ezimê têkeve nav xwîna we. Wê ruhê we birizîne.
Timê hevdu hizbikin. Hevra heyfbin. "Destê tenê

deng jê naê". Seva hevdu ruhê xwe nehêvşînin.

"Yekbûn jîyane". "Ç'evê derya, xwelî serya". Neferê xwe mîna gula xweykin. Îmkanê medin, wekî hewceyî tu kesî û tu tiştî bimînin.

4. Malêda jin timê dimîne jin, mêr dimîne mêr. Hevsarê xwe qet destê xwe bernedin. We ku berda, hûnê îdî çetin bikaribin beravkin. Însafa jina bedesil tune. Syar bû, îdî peya nabe.

5. Pevgirêdana xwe pismamên xwera gelekî qayîm bikin. Bila we mexeyîdin. Timê serîa jê nebirin. Hûn çiqasî neçin, ewê ewqasî ji we dûrkevin. Xerîb têt-têt, dibin pismam. Xerîb pismamê roja têî arxanê. Roja çetinda te zû bîr dike, lê pismam piştovanê roja teyî çetine. Kurmamê we pismamên weye here nêzîkin. "Însanê bîyanî bidî goştê canî, axir, oxir poşmanî".

Nav emirda dostên min zef hindik bûne. Ji wan dosta ez dixwazim navê hineka bikişînim: Ahmedê Hepo, Emerîkê Serdar, Barîyê Mehmûdê û Têmûrê Îbrehîm. Min ji kurmamên xwe gişka hizkirîye. Lê ji wan weke xwe Hesên hizkirîye. Ew boynet min kurmam nîbûye, esil bira bûye. Wî pir zehmetê min kişandye. Cî hatinê wî seva min sîngê xwe daye ber gullê.

6. Xwedaê xwe qet bîr mekin. Xwedê çi da, wî jî ezet, hurmet qebûl bikin. Nebine ebgewrî. Timê şikirbûna xwe bînin. "Her tişt ziravî dişkê, lê insan qalimayî dişkê".

Xwedê xwehizkirî nakeve tu tengasya. Merhemetî emrê dirêje. Fexir, lafa, vira, viza gelekî dûrbin. Dawya wan bêhurmetîye. Xwedê rastî û paqijayê

hizdike. Timê mêrxas û comerdbin. Evdê tengasîda alîkarîê bikin. Xwedê jî wera alîkarîê bike.

Timê dûrî şuxulê neqenc herin. Mirovê xirabra dostaê mekin. Mêvanhiz bin. Lê hemû kesî neynine mala xwe. Mirovên qenc, xirab hene, îtbara xwe unda mekin. Timê rya qencda bimeşin. Nekevne bin sya malê dinê. Îtbara malê dinê tunene.

7. Hizkirina welêt û gel bila bibe armanca weye yekemîn. Rya welêtda şehîd bibin. Ew kesê bê welate – bê qedrî, bê qîmete.

Dayîk, welat weke hevin.

Cuda nînin, timê tevin.

Nûra ç'eva bahatirin.

Ç'ûkara ç'ûk bin, mezinara mezin bin.

We rica dikim: vê şîretnama min emel bikin. Per û baskê Xwedê ser webe.

*Bavê we
Barîê Bala.
20.05.2014.*

Bira temê dê, bavane,
Roja tengda piştovane.
Ew xelate Rebb şandye,
Pir bahaye, ne erzane.

Ocaxê xwe mekin qunç'ik,
Helal bînin piç'ik-piç'ik.
Keda helal xilaz nabe,
Çiqas diçe, zêda dibe.

Esil hînbîn, hê nîn bidnê,
Ew nanê we pêpes nake.
Kengê ketne tengasîê,
Wê destê we birge, rake.

Qencî tucar unda nabin,
Zirav dibîn, lê qut nabin.
Ew kulîlkê bê dem vedbîn,
A bê rehin, zû zerdibîn.

Femkin, çima hatne dinê,
We çi daê, diçin ji wê.
Wekî recên weye kûrbîn,
Tucar naên bîrkinê.

Namûs, qîret, xemil, rewşîn,
Şuxlên xêrê timê başîn.
Tev êlêbîn, tev bimeşîn,
Jîna bê êl rojên reşîn.

Gelek nebin bê heysete,
Bê qudûmî, bê rûmete.
Ew kesê bê dewlet, male,
Çi bê xatî, çi bê xale.

Paqijayî eynî gule,
Merhemetî neynika dile.
Jîyan nabe bê armance,
Aqil, zer, dur him jî tace.

Dema we hat qîret bikin,
Sitarekê xwera çêkin.
Bilind bigrin nav-dengê xwe,
Telpa meynin ser eslê xwe.

Rebb aqlê pir nade tewa,
Avê wek hev nake cewa.
Kesê şûna xwe nizanbe,
Pêş geleka duqat dibe.

Şev tim şeve, roj jî roye,
Dinya hingiv, him jî toye.
Xwedê daye bendê xweye,
Hûn jî qismek hildin jêye.

Pî, nebêjin çoka me xin,
Qenc û xirab hevdu derxin.
Giran, sivik, dost, hogirin,
Kîjan xêre, wî hilgirin.

Wek qewata xwe bar hildin,
Nîv rê wî kesîra medin.
Bersîv danê lez mekevin,
Tenê boy xwe bersîv bidin.

Xwîna paqij dirêj nabe,
Esilda xas, xirab nabe.
Gelek dajon hespê xune,
Dûrnakebin eslê xune.

Esil xirab namîne tew,
Tew emrê xwe derbazkî tev.
Fîrêqetbû, te nas nake,
Wê erbeta ser te çêke.
Kesên usan hûn dûr herin,
Rya xwe ser biguherin.

Qencîê bikin, bavên avê,
Dem hatinê wê we kêr bê.
Bê sitara pêpes mekin,
Boy xatirê Rebbê Jorîn
Dest bavêjne, erdê rakin.

Malê dinê, qerax nebin,
Îtbara xwe qet pê neynin.
Malê pirî, serî xure,
Dawî timê agrê gure.

Hergav naê tava şîrîn,
Dayîk naynin kurên zêrîn.
Rojek berf tê, rojek baran,
Him tofan tên, him jî dûman.

Merhemetî, lep û dure,
Hemda fire, emrê pire.
Xayîn tucar nabin qence,
Mereza tel kîn û wece.

Evdê zane bihebînin,
Ew neynika gelê wane.
Qulixa wan dûr nemeşînin,
Zîrar naê, qet ji wane.

Her kes cezê xwe dikişîne,
Wa, hukmê dewr-zemîne.
Mala mekin xiraveye,
Xirav nabe mala weye.



BOYNET ZAROKA



HIRÇ'IKA MIN

Gulovere, ç'ev xare,
Ane koke, ne jare.
Pê pene, guh kinike,
Gizmizîke, rindike.

Zû-zû dike ire-ir,
Xwe bordike, dibe hur.
Valî-walî direve,
Gelek naçe, vedgere.

Qulç', quncika hevdixe,
Ç'evbirçîye, têr naxwe,
Belç'ika weldgerîne,
Sêvetirşka dibîne.

Dilitime, holdibe,
Dikeve, zû radibe.
Tirsa berfê, baranê
Xwe davêje nav panê.

KURIK Û QEŞAV

Qeşav, qeşav, qeşavok,
Bese bikî ecêbok.
Îdî zû-zû bihele,
Tevî avêbe, here.

Tava rindik bê derê,
Kulîlk vebin her derê.
Herme nav hevalê xwe,
Qît bidim kevoka xwe.

Kevoka min cindîye,
Bavo minra kirîye.
Sibe, sibe difire,
Gelek naçe, vedgere.

Hêsa herim dibistan,
Nekevim ser pî, destan.
Hildim hola xwe rindik,
Holbikim hindik, hindik.

Dayîka xwe hizbikim,
Dersdara xwe hêrs mekim.
Tew dersa pênc bistînim,
Hevala paş nemînim.

Kaliko min maç bike,
Bavo min qet ec meke.
Hemû bêjne min “şêro”,
Pesna bidne min herro.



GUL Û GULÇÎN

(Ç'îrok)

Yek hebûye, yek tunebûye, du kevotkên per-bask bedewe nexşîn hebûne. Navê yekê Gul, ya din Gulçîn bûye. Wana hevdu gelekî hizkirine. Wekî rojekê Xwedê hevdu nedîtana, bîna wan zef teng dibû. Çawa dibêjin, dinê dora wan fitil dida.

Her sibe zû yekê banî ya din dikir, wekî herin boynet cûcîkên xwe qûtekî bînin. Difiryan, diçûne nav mêrga, çîmana, zevî û daristana, digeryan. Heta êvarê çend cara cûcîkên xwera qût dianîn. Dîsa vedigeryane êwira xwe. Êvarê bar tijî paşda vedigeryan. Wan bi vî cûreyî wedên xwe derbaz dikirin, cûcîkên xwe givre dikirin, firê dixistin.

Sibekê Gule hîvya Gulçînê bû, wê bê, wê banke. Lê ji Gulçînê tu deng û his naê. Gul lezo-bezo radibe, diçe mala Gulçînê. Dibîne – Gulçîne nav germayêda velezyaye, inte-inta wêye. Ew zû-zû cîê wê tindirûst dike, temerzîke şile, sar datîne ser netika wê. Pişt, dest û pîên wê mizdide. Qasekî şûnva bîna Gulçînê tê ber. Radibe, Gulê hemêz dike, dibêje:

- Welleh, tu hevaleke gelekî başe, hêjaîye, bê qusûrî. Loma ji ez te pir hiz dikim. Vê xemxurya te ez tu cara bîr nakim. Herya gotye: “Hogirtya helale, paqij roja tengda tê kivşê”.

Serê xwe ber xar dike, zû-zû cûcîkên xwera qût dide.

Dîsa berbi êwira xweye herro difirin, êvarê bar tijî
vedigerine cem cûcîkên xwe, qûtên wan didinê. Cîên wan
datînin. Ev jî ziktêr ç'evên xwe digtin, şîrîn-şîrîn radizên.

*De, delalê (-la) min, deme,
Were, dayîka te te maçke, tu jî razê.
Ez jî hinekî hêsa bibim,
Rehet bîna xwe bikişînim.*

NIVÎSARA VEKIRÎ



NADO Û NARÊ - TRAGÊDIA

QETLA BÊ GUNE

(Bira xûşka xweye bê gune dukuje)

SÊ PERDE. ŞÊŞ BEŞ

ROLA DIQEDÎNIN:

1. **NADO** – 26 salî, dersdarê dibistana gunde navîn.
2. **NARÊ** – 19 salî, xwendevana înstîtûta dûreke.
3. **BEDIR** – bavê Narê, nexwendî, kevinhez.
4. **BESO** – Dayka Narê, nexwendî, heyf, milahîm.
5. **TÊMIR** – 22 salî, birê Narê, nîvxwendî, needilî.
6. **XEZAL** – 19 salî, hevala Narê, tevî Narê dixwîne.
7. **KEREM** – 26 salî, dersdar, hevalê Nado.
8. **ŞEMO** – 30 salî, nîvxwendî, şerûd, diz.
9. **BEKIR** – Bavê Şemo, nexwendî, xwe qerax.
10. **ALMAST** – dayka Şemo, nexwendî, vizek.
11. **KEK EZÎZ** – 60 salî, dirêktorê dibistana gund.
12. **MELLE EHMED** – 70 salî, diravhez.
13. **ELÎ** – binelîê gund, jêra Bekequmsî dibên.
14. **PÎREJINA EWIL** – 80 salî, meta Bedir.
15. **PÎREJINA DUDA** – 75 salî, xatya Bedir.
16. **BERBÛ** – 24 salî, xûşka Nado.
17. **KOMA SAZBENDA Û DENG BÊJA.**
18. **XÊLE MIROVÊN** – dema qewmandinê dikevîna oda Narê têdbûye.

(Nasname – Şemo hemû qewmandinada naê xanê).

DESTPÊK (ÊPÎLOG)

Dema min pê nûs hilda destê xwe, wekî vê bûyera nolî jerêye tel, mînanî agirê cehennemêî şewatî ne temirî ku binivîsim, elbêru herdu destên xwe bilind kirin, bangorî Rebbê Jorîn bûm. Awazekî zelal jê hîvî û rica kir, wekî li min were rehmê, sihet û qeweta bê qezîa bide min û ez bikaribim bin wî barê giranî, qîmet baha serfînyaz derêm, nîvê rê westîyam nebêjim, daneynim. Rûspîtîke comerde, nûranî bigihînme oxirê. Pêş gelê xwe rûreş û deyîndar nemînim. Ev helbesta nîvîsî:

Ya Rebbê Jor, bide nisret,
Hemda fire, sihet, qewet.
Ez vî barî cî hilînim,
Westyam nebêm, zû daneynim.

Qudreta xwe zêde bike,
Rya pêş min zelal bike.
Kuç, sirîna meke rêze,
Murvê hevsûd biparêze.

Bê jan, êşa nav dilê xwe,
Bigihînme tew gelê xwe.
Hîvî bikim dê û bava,
Ewil hînbîn ruhê lawa.

Vê dinya nû mêze bikin,
Heqê lawê xwe nas bikin.
Ew jî bibin fireqete,
Mekin, mekin wan bedbexte.

Mirazê wan hasil bikin,
Nav emirda bextewarkin.
Ez jî sihkîm pêş gelê xwe,
Hinek qedand min deynê xwe.

Ev bûyer destpêka nîvê qurna bîstîe duda da, nav kurdên gundekî Rêspûblîka Qazaxstanê qewimîye. Gelek mirovên wî gundî heya nika jî bûyer bîr mekirine. Dilekî êşyaî, şewatî, pejmûr wê qal dîkin.

Dema ez hatime Rêspûblîka Qazaxstanê, min ji xêlê mirova derbara wê bûyerê bihîst. Çûme wî gundî. Derbara bûyerêda xêlek mirovên ahil û cahilra axivîm. Wan bûyer despêkê heta dawîê qal kirin. Eyan bû, wekî gelek tevgelên bûyerê wî gundîda dijjan. Rastî wan hatim, wanra axivîm. Wan jî bûyer çawa bûbû, poşman-poşman qal kirin. Ji min rica kirin, wekî ez navê wan nivîsara bûyerêda mekişînim. Min rica wan qebûl kir. Loma jî xênji navê Têmir tu nav nekişandin, çimkî qetilkarê bûyerê xût Têmir bi xweye.

Min li vir hewce dît, wekî gotineke kal û bavên meye lel û dure, bahaqîmet çawa heye, usan binivîsim. Dilekî êşyaî bigihînime gelek bav û dayên kurde ji emirê nû paşdamayî:

“Bila dilî dil be,
Kiras cawê qul be,
Doşik erd be,
Lihêf ewir be,
Belgî kevir be,
Xarin nanê ceh be.
Rojekê hebe,
Deh roja tune be,

Lê bila tenê
Dilî dil be.”

Telebextra, heya nika jî nav gelê meda bav û dayîkên dilkevire usan hene, ew ewledê xwe zane-zane bi destî xwe zorê davêjine nav agirê cehennemê. Ew temamya emrê xwe nav ax, keser û zulma giranda derbaz dîkin. Saxe-sax ezabê mirinê dikişînin. Dişewitin, ji emrê xwe tu tema şîrîn nabînin. Zelûl dibin. Mehf dibin. Halekî tragêdîk dinya xwe diguhezin.

Îdî deme, wekî hemû rewşênbîrên kurd, egîtaîke bê xof, cesaretekî şerezeî bê tirs miqabilî wan bav û dayîkên ji emrê nû tu tişt femnekirî destbî şerekî hêlê bikin. Wan bînine ser rya heqîyêye bê qezîa.

Wekî ew gele cara xwesteka lawên xweye dûrî erf-edetên gele kevnîyare wedê bibihurîra qaîl bibin. Wekî ew rya emrê xwe xwexwa bijbêrin. Mirazê xwe şa bibin. Bibine bextewar. Dawya wan nebe tragêdîa.

PERDA YEKÊ BEŞA EWIL

Perde hêdî-hêdî vedibe.

Mala Bedirê ewqasî jî timtêşa nikava ne xemilî, nav ronayêda zelal tê xanê. Ser polê malê xalîçeke xilmet hatye taxistîne. Stoleke çar nikil, çend stûle danîne, xalîçeke nexşîne dîwêrda darda kirîe. Destê jorê dîwanek û du krêslô hene. Narê û Xezal dîwanêda rûniştine, dengêkî nizim şîrîn-şîrîn diaxivîn, dem-dem jî dikenin.

Narê – (*Dengekî milahîm*). Qîzê, car-carana temê mektebê usan têne min. Serê bavokim. Hindik dimîne, lap xwe unda bikim. Şev dikevime nav xewnên gelekî şîrîne xilaz nebûyî. Dibînim, çûme mektebê. Ez û Nado quncikekî sekinîne, nolî her gav hevdura diaxivin. Zarokên koma yekê, duda nêzikî me dibin, valî-walî direvin. Min dinihêrin, dikenin. Dîsa pey hevdu direvin, me dûr dikevin, diçin. Vê demê zengilê ders destpêbûnê lêdikeve. Nado zû-zû berbi oda dersdara diçe. Destê wîda jûrnal, elbêra paşda vedigere. Minra çav dike. Diçe sinifekê. Nişkêva hişyar dibim. Der-dora xwe dinihêrim, xwe xwera dibêjim: xwezil hişyar nebûma... Xewneke dinda dibînim ez û Nado nav baxçekîdanin. Qive-qiva bilbila tê. Eme ser kanîkê sekinîne avê hevdu direşînin. Dû hev dû dikevin. Ew min digire... Hêdîka berdide, dîsa hişyar dibim. Êh, xûça min, xwezil min mekteb hinekî dereng kuta bikira. Ev xewn jî qet nedîtana. Dîsa nolî her car, xwe bixemilanda, çeltikê xwe hilda, biçûma mektebê. Hevalên xwera biavaxiyama. Nado bidîta, dersê bihatama. Dayka min xurekekî tem çekira. Bida ber min, gulîên min mehez kirina. Carana jî ez maç kirima. Êh, êh, xûça mine delale, pir min hezkirî, çi bêjim. Xwezil, wan wedê buhurî...

Xezal – (*Kene ken*). Peh, peh, peh, xûça mine delale hez kirî hêja. Xwezila min te bê. Welle, hindik dimîne, ez îdî çavnebarîa te bikim. Wekî tu zû-zû xewnên usane nolî hingive şîrîn dibînî. Qîzê, ew îdî ne xewnin. Çawa melle Rzgo dibêje, “felqekê cinnetêye” hûn dikevinê. Gul, Gulistan gazî hevdu dikin. Tu Nadoye navda rûniştîne. Dû hevdu dikevin. Avê ser hevduda direşînin. (Dikene). Kîjan dil bengîê nexaze, wekî xewnên usan zû-zû nebîne? Lê nolî me, em her sibê diçine mektebê, hevdu dibînin, awirava selamê didine hevdu?.. Roja me usan xilaz dibe. (Dikene). De wekî tuye usane heyra

Nadodayî, gazî Xwedêke, bila xewnên te bibine rast, eşkera. Hûn bê tirs zû-zû hevdu bibînin.

Narê – (*Dengekî gazin*). Êêê, qîzê, te dîsa dest henekên xweye metnezeye pêkenok kirin, erê?! Qîzê, ez çi dibêjim, tu dereqa çida difikirî? Dilê tera çi derbaz dibe, wî jî didî der. Dixwazî seva dilê te rehet bibe, bêjim, tu Kerem jî li wir bûn, we jî hevdu avreşandî fikir, erê?! Na, na, welle, ez nikarim derewên usa bikim. Kêra bigihêjî xewna min jêra qal kî. (Dikene).

Xezal – (*Çavê Narê dinihêre, vedibişire*). Xûça min, dixwazim vê siba bedew mizgîneke xêrê bidime te. Lê, nizamim, tuê wê çawa qebûl bikî. Yeşîn, tuê min xelat bikî, erê? Şika min tune. (Nişkêva radibe berbi dêrî diçe). Na, na, bila her tişt ser girtî bimîne. Dîzik dev girtî bimîne, rinde.

Narê – (*Dû wê ban dike*). Qîzê, te lap hişê xwe undakirye? Kuda diçî?! Tîrê davêjî, kevanê vedişêrî? Çima dilê min diteqînî? Bêje, bêje, bê tuê vê sibê zû çi mizgîna xêrê bidî min, wekî ez şa bibim? Bê wê jî ev xêlê wedeye, mitala dilê min qul kirine. Cî nabînim xwe ji destê wan xilaz bikim.

Xezal – (*Dikene, paşda vedigere*). Qîzê, dîn nebe. Hinekî sebir bike, hemda xwe fire bike. (Wê hemêz dike). Te heneka min lap kire rastî. Aqilê xwe beravî serê xwe ke. Ezê qet razî bibim, wekî tu ewqasî posîde bibî, têkevî nav mitala? (Hêdî ji berîka xwe kaxetekî hev pêçîaî derdixe, dirêjî wê dike. Narê kaxet destê wê digre. Vedike. Lêdinihêre. Dîsa vedigerîne wê. Xezal dengêkî nizim kaxet dixwîne). “Selam, Narê can. Min biborîne, wekî ev demeke dirêje ez nikarim rastî te bêm. Edetê gelê meyî gelekî giranî, xirabî, cawdare. Ez qet culet nakim kolana wera jî bibihurim. Minra usan tê kivşê, wekî çavên mirovên gundê me gişka min dinihêre. Wê min bibînin, hezar

nebenda dû min bixînin. Delala min, îdî tu mitala meke. Min mesela me despêkê hetanî nika gişk dê û bavê xwera qal kirî. Hemû qewmandina despêk û kutabûn heye. Kes nikare bêje îro yanê sibê çiyê biqiwime. Ewe amedene, hema îro jî bêne mala we daxwazî elamkin. Ezî hîvya bersîva teme. Dilekî tijî hezkirî, pir bengî. Nadoê te..." (*Vê demê devra dengê Beso tê, ew Narê ban dike. Narê kaxet destê Xezalê digre, zû-zû berîka xweda vedişêre. Beso dikeve hundur, Xezalê dibîne. Vedibişire*).

Beso – (*Şa-şa*). Metê qurban, tu kengê hatî? Welleh, hewşêda eze ewqasî mijûl bûme, min qet hatina te nedîtye. Tu jî nehatî cem min. Dizî-dizî, zû-zû revyayî bal Narê. (*Dikene*). Dîsa ew çi piçe-piça weye, guhê hevduda dibêjin? Ez bextê weme, ew piçe-piça we qet xilaz nabe? Xwezila min bizanbûya hûn derheqa çida ewqasî xeber didin, dilê minê hinekî rihet bibûya. (*Xareve tê, Xezalê maç dike. Berbi kulîne diçe*). De, qet nebe, wera fîncane çay bînim. Çaya meye hazire. Hinekî şûnva xurekê meyê jî hazir be. (*Destê wêda sinya çayê paşda vedigere. Herd vê dinihêrin, dikenin. Fîncanê wê digirin, didine ber xwe. Nişkêva Bedir dikeve hundur*).

Bedir – (*Dengekî hizkirî*). O, ho, gelî qîza! Welleh, ez we eziman digeryam, lê hûn hema erdê hêsa, rihet rastî min hatin. (*Vedibişire. Xar dibe netika Xezalê, sûretê Narê maç dike*). Narê can, min nexeyde. Ne tu dizanî, ez Xezalê ji te gelectir hez dikim, loma jî berî te netika wê maç dikim. Lawo, bila Xwedê bextekî usanî şîrîn têke qismetê we, wekî hûn qet hevdu meqetin. Timê bal hevdu bin. (*Xezal û Narê wî hemêz dikin, maç dikin, kene-ken mal dertên, ew û Beso dimînin*).

Beso – (*Bedir dinihêre, dengêkî nizam*). Mêro, bêje, bê dîsa te çi qewimî, wekî ewqasî reş xitimîyî? Tijî bûyî? Te çi cavên pak, nepak bîhîstîne? Ez te rind nas dikim. Tu bê sebeb,

ewqasî posîde nabî! Rengê xwe naguherî. Welleh, rengê te qet xaşa min naê. (*Berê xwe diguhêze, ber xweda hêdî*). Min feqîra Xwedê, kengê ew rûçikê teyî bedew, ken-eşq dîtî, wekî nika jî bibînim!

Bedir – (*Hêrs Beso dinihêre*). Weyla ecek lê ketê! Hela min wê binihêrin! Ew jî min begem nake? Qelfê xwe min dike. Gunekar ezim, tu nînî! Qîzê, ez Bekirê Elome! Yek rastî min hatî dizane ez kîme, yek jî navê min bihîstî! Gelek merya hez kirin, wekî minra dostî, hevaltî bikin. Tu jî wî hişê xweva min begem nakî, erê? (*Awirne tûj didêda*).

Beso – (*Dikene*). Peh, peh, hêdî, hêdî, malik awao! Erdê biqelişe, em gunene! Ev çi kilamên tezene tu dikakînî? Kuro, "Dîzê got, binê min zêre, kevgîrê got: Lê ez ji ku tîm?" Çi dibêjî, bêje, kesek nolî min te rind nas nake. Ev nêzîngî sî salîye tevî hevdu dijîn. Lê min, ew hunurê ku tu dibêjî, qet carekê teda nedîtye. (*Vedibişire*). Daha rind dibe, tu hinekî dakevî jêrê, werêy aşê Xaço. (*Nizim dikene*). Mêro, daha rind dibe, wekî dilê xwe vekî, fikra xwe minra zelal şirovekî, ez jî weke zanebûna xwe misiletekê bidime te. Hezdikî – gebûlke, heznakî – ewê jî îdî tu dizanî! Yeke, dilê teda çi disêwire, dawî tu wî jî dikî.

Bedir – (*Dengekî nizam*). De, wekî dixwazî, min çi dîtye, ezê tewî tera bêjim. Keçê¹, îro nav gund Bekirê Elo ez xewle kirim. Gelek wehjarîa şûnva rûe min nehêrî, vebîşîrî, got: "Bedirê bira, em mirovên gundekîne. Zarotîa me tev buhurîye. Kal-bavên hevdu nas dikin. Hêlekêda jî pismamtya me heye. Bira, fikra me heye em wan nêzîngaya berbi we bînin". Min gotê: "Kuro, çima cara yekêye hûn tene mala min? Derî minî pêş we vekirîye. Keremkin, çi wext dixwazin, werên". Ew vebîşîrî, got: "Biv hatina me ne ji wan hatinaye. Em dixwazin wera pismamtya xwe dubar bikin". Min îdî fikra xwe ne daê, elbêra jê dûr ketim.

Jinik, min sebeba tijî bûna xwe got, qal kir. De, tu aqilê xwe beravî serê xwe bike. (*Dikene*). Misileteke başe, hêja bide min.

Beso – (*Çavê wî dinihêre, nerm dikene*). Êêê², mêro, min hê tu femkirî rengê te çima usan hatye guhastinê. Malik awao, qîze sore, zere, bedewe, cîê bilindda dixwîne, aqile, kemale. Ser barîa serda, qîza mêrekî nolî teyî bi nav û denge. (*Dikene*). Weyla min hetevê. Welleh, mişterîê wê hazirî serra sekinîye. Berya gotîe: “Morîa qul erdê namîne”. Îro Bekirê rastî te bê, sibê Heso, dusibe Kesoê bê ber derê te. “Qîz sêva sore, ser darêye”. Hemû destê xwe davêjinê, qismetê kê be, ew jî hildide. Mêro, lê wekî tu mislieta min bikî, wê dereqêda fikir kirin gelek zûye. Guneye, jê vegere. Bila xwandina xwe xilaz bike, xwe rind nas bike. Aqilê wê tam bê serê wê. Tu bavî, wê demê çawa dixwazî, usan jî bike. Yeke, qîz mala bavêda mêvane. Zû-dereng, lê serê rêye. Wê here... Lê kuda?.. Lê kêra?.. Kîjan oxirêda wê here?! Ewê jî îdî Xwedê dizane. Kêra nivîsîye, ew jî ê bibe. (*Vê demê Têmir nişkêva derî vedike, dikeve hundur. Ew elbêra dengê xwe dibirin*).

Têmir – (*Hêrse-hêrs*). Daê, bavo, ew çi qewimye? Hûn dîsa orta xweda dizî-dizî xeber didin? Kîjan meselê hel dikan? Min dibînin, elbêra dengê xwe dibirin? Yeke, hûnê sêra dilê xwe minra nebêjin. Neheq jî ji we dipirsim. Biborînî, wekî min hûn nerehet kirin. Gotinê jî, hûnê qest, berê min bidine rêke kaş, sirîne usane çetin, wekî ezê nikaribim qet wê rêda herim. Bixwazim, nexwazim paşda vegerim, wera razî bibim. Kutasê bême ser gotina we, erê? De bi xatirê we! (*Radibe, dixwaze here*).

Bedir – (*Hêdî milê wî digire, dengekî nermî milahîm*). Kurê minî delal, lawo, tu kuda diçî? Gelekî lez mekeve. Çima dîsa seklavî bûyî? Bêrxêvet, bêrxêvet xeber didî? Wan gazinên

bi loman dikî? Me hetanî nika kîjan gilî, kîjan sêra malê bê te kirîe? Kuro, lawo, em deng nakin, tu deng dikî? Ka me kengê tu malda dîtî, wekî bi te beşewirin? Vê xebardana te kî bibihê, wê elbêra bêje: “Yeqîn kurê wanî ya hevseneye, yanê jî bê dûye, wekî sêra mala xwe wîra nabêjin”. Çima usan bê îsaf xeber didî? Wekî tuyî usan heîrîyî, keremke! Were bal bavê xwe rihet rûnê. Tew gotinên min rind-rind bibihê. Ezê îdî sêra piste-pista me gişkî tera vekim, bêjim. Şikir, tu îdî xortekî mezinî. Bejnêda ser min dikevî. Aqilda jî... (*Ber xweda*). Weylê min bextewarî. Tu çi qirarî derxî, emê wî qirarê te qebûl bikin. Çawa bêjî, emê usan bimeşin. De keremke. Hişî xwe topî serê xwe bike. Rind-rind fikir bike.

Têmir – (*Cîê xwe radibe, tê cem bavê xwe rûdinê. Hinekî bi ekis*). De keremke, bêje, bêje, bavê minî, min pir hezkirî. Bê ew çi meseleye, wekî hûn nikarin safî bikin? Dixwazin min bişewirin? Welleh, pake-pake. Şikir Xwedê, dêmek ez jî heme. Hûn îdî min jî meriv hesav dikan. Banî arîkaryê dikan. Başe, başe. (*Dikene*). Bavo, daê, lap arxanîbin. Qet tu şayîşa mekişînin. Kurê weyê xwestina we elbêra biqedîne. Diqewime, hûn çavekî kurê xweyî aqil dinihêrin?! Na, na, şaş nabin. Çavê xwe rind vekin, min binihêrin, bê kurekî weyî çiqasî zaneyî, mêrxas heye. (*Destê xwe sîngê xwe dixêre, cîê xwe radibe, hêrse-hêrs dixwaze here*).

Bedir – (*Hêdî milê wî digire*). Lawo, kurê min, ne min tera got cîê xweda rifet rûnê, lez mekeve, bavê xwe rind bibihê. Îzê îdî çi heye, gişkî zelal vekim, tera bê icir bêjim. Tenê tu guhê xwe rind-rind veke, min bibihê, wekî bikaribî rêkê bidî pêy me. Lawo, Bekirê Heso Nara xûşka te Şemoê kurê xwera dixwaze. Lê tu çi dibêjî? Welleh-bille, îdî tu sêrên meye te veqartî tunenin, wekî te pê nehesînin. Tu badilhewa hêrs dibî.

Kurê min, de saffike. Bê tuê bêy ser çi qirarî? Tu çawa saffikî, çawa bixwazî, emê usan jî dû kaşa te herin. Ezê Xwedaê xwe gelekî razî bimînim, wekî ewledekî nolî teyî aqilî, kemal kirye qismetê min. (*Eks dikene*). Roja tengda dikare kêrî min bê, min tengasya derdixe. (*Beso tevî xeberdana wan dibe*).

Beso – (*Dengekî milahîm*). Kurê minî aqilî, delal. Te bîhîst, bavê te tera çi got? Her tişt tera eyan bû yanê na? Tu kurê meyî tenêyî. Narê jî xûşka teye tenêye. Xênji we tu ewledên me tunenin. Bextê wêyî jî destê tedaye. Em îro hene, sibê tunenin. Nika rûnê. Kûr-dûr bifikire. Bê tu têy ser çi qirarî. Lê min fikra xwe bavê tera gotî. Bîr meke, nika jî tera dibê. Derheqa vê meselêda qirarê kutasî derxistin hela gelek zûye. Xûşka te guneye. Bila xwendina xwe xilaz bike. Aqilê wê bê sêrî. Paşê hûn çawa dixwazin usan bikin. (*Berxweda*). Ew xeme, hela wê demêye. Belkî heta wî çaxî ew xweyê bikaribe bextê xwe hel bike.

Perde berjêr dibe.

Dik nav tarîstanêda naê xanê.

PERDA EWIL BEŞA DUDA

Perde hêdî-hêdî vedibe.

Mala Bedir rizma xweye berêda çawa hebûye, usan zelal kivş dibe. Bedir, Beso û Têmir dîwanêda rûniştine, hevdura dengêkî nizim diaxivin. Carana destê xwe bilind dikin. Devra dengêkî mêra ban dike: “Xwedanê malê, xwedanê malê!” Derî tê kutanê. Bedir zû dêrî vedike.

Bedir – (*Vedibişire*). Keremkin, keremkin.

(*Beso û Têmir radibine pîa. Bekir û Almast selamê didin, dikevine hundur. Dîwanêda rûdinên. Bekir çavê Beso dinihêre, dixwaze gilîkî bêje. Beso serê xweva êşareta “bisekine” didêda*).

Bekir – (*Dengekî nizim*). Bedirê bira, me bibaxşîne, em mêvanê ban nekirîne, loma dereng hatine. Gelekî nekeve nav mitala. Malik avao, tu eme xerîbin. Berîa gotî: “Mêvanên dereng hatî kîsî xwe duxun”. Kêfa xwe lap kok xweyke. (*Vê demê Narê û Xezal kene-ken dikevne hundur. Selamê didin. Derbazî oda Narê dibin. Bekir xêleke xurt metel-metel dû wan dinihêre. Nefeseke kûr dikişîne*). Bedirê bira, kuro, dibînî qîz çawa zû mezin dibin? Loma berya gotî: “Qîz rojê weke cehekî, kur weke genimekî mezin dibe”. Kuro, heta duh, pêr, her yek wane weke karikeke bizinaye rûtik bûn. Lê nika, maşella, çavê merya jê têr duxe. Her yek bûye xezaleke xas baxçê padşakî ter. Welleh, îdî xwexwa banî mişterîa dikin. Xwezila min wan kortên bextewar bê, wekî ev xezalên pale-pûlê bibin qismetê wan. (*Vedibişire*).

Almast – (*Awirên tûjva wî dinihêre, eşaretîa “Bese, îdî dirêj meke” didêda, curekî gazin*). Kuro, Bekir, tê kivşê, tu jî ji bextê xwe, roja xweyî ne qayîlî, erê?! Kuro, rojê sed carî papaxê xwe bavêje hewa, wekî ez bûme qîsmetê te. Kîê tu bikirai? Kî wan çopirên rûê te dinihêre, têr duxe. (*Nerm dikene. Bedir hinekî soro-moro dibe. Serê xwe berjêr dike*).

Beso – (*Kesereke kûr dikişîne*). Bekirê bira, qîz wê wextê dibe bextewar, wekî dikeve maleke başe, merîfete, qedir-qîmet, zane. Rastî xortekî çêl, merdaneyî, xwe naskirî tê. Bedewî ne bextewariye. Car-carana qîzên bedewe, xanim-xatûne noli xezala dibine qîsmetên xortne usane kotî, gunê merya wan tê. Wekî hêca nînin, qet avê destê wan bikin. A, wê wextê, qîz qîmetê xwe unda dikan. Dêda bûna xwe poşman dibin. Heta kutasîa emrê xwe nav ax, keserada dijîn, mehf dibin. Xwedê bextê kê kêra nivîsî! Qenc xiravra, xirav qencra!

Almast – (*Dengekî gazin*). Beso, xûça min, welleh, te dilê min lap noli kizikê heland, kire cize-ciz, dinê dor serê min çû, hat. Qîzê, wedê meda, welleh, eme lape çavgirtî bûn. Me ji dinê qet tu tişt fem nedikir. Lê nika, qîz diçine mekteba, koma neha, deha kuta dikan. Zêdebarîa ser, lap cîê bilindda jî dixwînin. Navê vê jî pak nizanîm – Enstetuye, çê?..

Bedir û Bekir – (*Bi hevdu*). Weylê eçek we ketal! Nevxêrîk weda hata. Dêmek, hûne jî bi gilî, gazinin, erê?! Lê, werên, eceba ser eceba binihêrin! Gunekar emîn. Em we çima bikine xanim, xwedanê mal-hala, nika jî hûn wa bêjin, gazina bikin. Welleh-bille, hûne heqin, eme neheqin, îdî buhurîye. Poşmanya dawîê feyde nade. (*Dikenin*).

Almast – (*Bekir dinihêre*). Kuro, armanca hatina xwe

bêje. Bese têkevî kol-kosa, ka kevin bidî bê. Tu Bedir bipesinî, Bedir jî te. Welleh, em we herdu jî rind nas dikan. Qet nerehet nebin. Ne em jî vî gundîda mezin bûne...

Bekir – (*Dengekî nizm*). Bedirê bira, hezar carî bibaxşîne, welleh xanima min (*dikene*) rast dibê. Em armancê gelekî dîr ketin. Lê qet tu ji me pirs nakî: “Gelî mêvanên mine dereng hatî, we xêre, vê ewarê derê min vekirî? Belkî gilîk, gazineke we heye, keremkin, bêjin?”

Bedir – (*Dikene*). Bira, te usan dîrva destpê kir, çima em hevdu nas nakin? Îro nişkêva rastî hevdu hatine? Kuro, mêvan mêvanê Xwedêne, Xwedê berî wan risqê wan dişîne. Hûn ser serê min, ser çavên min hatine. Dergê minî pêş mêvanên noli weyî timê vekirîye. De keremke, armanca xwe bêje! Wekî qet nebe ez alîkarîke sivik bidime we, yanê jî misileteke qenc bidime pêşya we. Wekî hûn ji min razî bimînin, meêşin, ne xêdin.

Bekir – (*Çavê Almastê dinihêre. Almast wîra çav dike, “Bêje, bêje”, ew dil-dîne xwe tev tîne*). De wekî usane, welleh Ezîm, bille Kerîm, ezê hema vî serîda armanca hatina me wera zelal vekim bêjim. (*Navbirî*). Ne bikime miste-mist, ne jî bikime inte-int. Berya gotye: “Şerîet bermê naxwaze”. Gilîê paqij Xwedê jî jê hez dike. Bedirê bira, Besoya xûşk, Têmirê brazî, şikir Xwedê, hûn Şemoyê min rind nas dikan. Ew ber çavê we mezin bûye. Nav mirovên gundîa, nav heval-hogirada xwedanê çi hurmetêye. Gişk serê wî sonî duxun. Çawa xûşka min Beso hinekî berê ji bext got, bexî wîyî pêşin usan jê girt. Em rastî nepaka hatibûn. Lê, sed carî şikirdayîna Xwedê, em zû jê xilaz bûn. Nika em, hûne angorî hevdu. Cînarê

hevdune. Kal-bavên hevdu pak nas dikin. Me hûn gotine, derê we vekirye. Derheqa Narêda jî îdî tu xebardan nikare bibe. Wê nebe jî. Xanimeke paşe-pere sekinîye. Wekî hûn rêza bibînin, em dixwazin qewmtîa xwe wera dîsa teze bikin. “Hûn kêr, em penêr”. Welleh, kî Şemo, Narê tevî hevdu cîkî bibîne, wê şa bibe, bêje, “Rebbê Jorîn ev herd bedewê nazik tenê boynet hevdu xuluqandine”. (*Vedibişire*).

Bedir – (*Dikene*). Bekirê bira! Welleh Ezîm, bille Kerîm, berya rast gotye: “Kurmê şîrî, heta pîrî”. Kuro, te hela keysetê xweyî zarotîê ne guhêrye? Berê çawa bûyî, usan jî mayî. Wî çaxî jî te gilîê xweyî paşê berê digot. Lema jî hevalên xwera zû-zû pevdiçûyî. Him dihatî kutanê, him jî dikuta. Cixelîêda kesek weke te nîn bû. Bi wê cixelîê te hemû pere û kavên me ji me dibirin, em rût diman. Tê bîra te, carekê jî ez tu pevçûn? (*Dikene*). Dawîê îdî tu dizanî.

Bekir – (*Nizim*). Bira, lê ez çawa bikim? Hinek merî dimizmizînin, xwe valî-walî davêjin. Ez nikarim usan bikim. “Mis-mis” nabêjim, hema carekêva “Mistefa” dibêjim. Yanê erê, yanê na! Gur çî bizîne xwarye, mêra şûrê xwe rast girêdaye. Xwedê jî rastîê hez dike. De min armanca hatina me vekir, wera got. Ya dinê îdî hûn dizanin. Nika eme benda wene. Kal-bava gotye: “Xwedanê qîza sultanin”. Dîsa dibên: “Hûn kêr, em penêr”. Xwedê me posîde paşda venegerîne.

Bedir – (*Çavê Beso û Têmir dinihêre*). Bekirê bira, te nolî mêra gilîê xweyî kutasîê hema berê vekir, kese got. Welleh, ew gelekî xaşa min hat. Na, na, tê kivşe, te xeysetê xweyî zarotîê hinekî guherye. (*Dikene*). Tuyî berê ne wa bûyî. Lê min hela fikra xweye kutasîê ne gotye. (*Tilya xweva Beso û Têmir*

nîşan dide). Were, em vê meselê gelekî lez mexêrin. Em jî hevdu bişewirin, paşê cawê wera bişînin. Bila Xwedê silametîê bide.

Almast – (*Dengekî hêdî*). Mêro, welleh pîrsa rast bîna gula jê tê. Bedirê bira rast dibêje. Em mala xweda razî bûne, hatine. Ne gerekê ew jî hevdu razî bibin. Lê gerekê em vê meselê venekin, kesîra nebêjin. Mirovên qenc, xirav hene. Wê meselê feramûş bikin. Kengê em hevdu razî bûn, wî çaxî kî dizane bila bizanbe.

(*Xatirê xwe dixwazin, diçin. Bedir, Beso û Têmir tenê dimînin, dengekî nizim diaxivin*).

Têmir – (*Hinekî sert*). Bavo... (*Navbirî*). Malik avao, welleh min vê xebardana teye îro qet tiştek fem nekir! Ew çî sewdayê tezeye te destpê kirye? Wî mêrikî fikra xwe eşkera vekir mera got. Te jî fikra xwe nolî mêra vekira wîra bigota... Yanê erê, yanê na! Bila mêrik arxanî biçûya. Îdî ew çî valî-walî avîtine? “Herin, hinekî min sebir bikin, emê hevdu bişewirin”. (*Navbirî*). Hetanî nika tu kengê bi me şewirîyî, wekî nika jî bişewirî? Dîtî yê bêjin: “Welleh, Bedir bavekî çiqasî başe, bê neferê xwe gaveke zêde navêje...” Te timê çî xwestîye, ew jî kirye! Welleh, ezê gelekî şa bibim, wekî xortekî mînanî Şemoyî mêrxas bibe zavê min. Ezê îdî rast-çep lêxim. Îdî tu kesekê nikaribe derê pêş min, bade-bade xeber bide. Şemoê herdu çavên wan qulekêra derxe, kor bihêle!

Bedir – (*Beso dinihêre*). Jinik, lê tu vê meselêra çî dibêjî? Kurê teyî “aqil” berxwe neda, wede zûtir dilê wîda çî disewirî, gişk vekir hilşande ser sivrê. Dilê teda çî heye? Tu jî gişkî veke bêje, wekî em bêne ser qirarekî, bikaribin wan meryara cawekê bişînin.

Têmir – (*Şa-şa ji cîê xwe radibe*). Bavo, daê, ez gilîê xweyî kutasîê dîsa wera dibêjim û diçim. Ezî razîme. Ser sewdakî bisekinin. Vê bazarê rindtir bazarê rastî we naê. (*Hinekî hêrs dêrî vedike, mal dertê*).

Beso – (*Dengekî nizim*). Evdê Xwedê, ez çi dikarim bêjim? Bavê qîzê tuyî. Yeke, tu çawa bixwazî tuê usan jî bikî. Çi av min sar dibe, çi jî germ dibe. Diha rind dibe, wekî ez xwe ber baranê qet şil mekim. Lê ez dîsa jî xweya gilîê xweme. Diha baş dibe, wekî tu lez nekevî, hinekî sebir bikî. Berya gotye: “Mala Xwedê ser sebrê ava bûye”. Hêdî-hêdî destê xwe têla Narê xe. Berê biemlîne xwe, paşê nerme-nerm fikra xwe jêra bêje. Mêro, welleh, ji ewledên nika qet tu tişt naê femkirinê. Qîze, îdî nêzîkî bîst salîye, ya ber miraze. Îdî her tiştî fem dike, dizane. Dibînî kiteb destê wê nakebin? Belki qet gotina te qebûl nekir?! Tuê wî çaxî çawa bikî? Diqewime... Paşwextîê bîne ber çavê xwe!

Bedir – (*Hêrse-hêrs ji cîê xwe radibe*). Keçê, ew çi gilîên tezene tu hederen, pederen xeber didî?! Tê kivşê, te lap hişê xwe unda kirye, erê?! Ça, ewê gilîê min qebûl meke?! Ezê elbêra stuê te û wê kêreke kova jêkim. Herd guhên xwe lap fire vekin, rind-rind bibihên! Aqilê xwe beravî serê xwekin. Ezî wî wedêf heyfî, başî, pakim, ku av ser serê minra welnegerîaye, hêrs nebûme. Ku hêrs bûm, qet bavê xwe jî nas nakim. Tu wê yekê diha baş dizanî. (*Navbirî*). Dêyî, qîza xwe rind-rind bide femkirinê. Bila nav êla giranda min bêhurmet meke. Yanê na, ezê erbetêke usan bikim, wekî hetanî nika ne kesî kirye, ne jî bihîstye. Usan bide femkirinê, bila tu deng-hisê wê derneên, tenê “ez qayîlim” bêje. Xwedê yek, xeber yek! Bila lap sibê jî bên desmala xwe bînin daynin!

PERDA DUDA BEŞA SISYA

Perde hêdî-hêdî vedibe.

Mala Bedir rizma xweye berêda zelal tê xanê. Tu guhestinê nû lê ne hatine kirinê. Berê çawa bûye, wê timteşê da jî dimîne. Bedir, Beso dîwanêda, Têmir kresloêda rûniştîe. Dengekî nizim diaxivin. Narê pêş wan ser pîa sekinye, dike îske-îsk, hûre-hûr digirî, pê desmalê hêsirên xwe paqij dike.

Narê – (*Girî-girî lavaya bavê xwe dike*). Bavo can, ne tu timê serê min mizdidî, dibêjî “qîza mine delal, welleh, ez xwe pirtir te hez dikim. Xwezil, dewsa Têmir tu kur bûyayî. Qîza mi jî kurê min him aqiltir, him jî bedewtîre”. Lê nika çima tu usan zû hatî guhastinê? Min hezkirin bîra te derket?! Ne ez dixwînim. Çima xwendina min nîvcî dihêlî? Min bedbext dikî? (*Dîsa digirî*). Bihêle ez xwendina xwe xilaz bikim. Dû wê dilê te çawa dixwaze, usan bike. Min didî kêda, bidê da. Wekî wî çaxî ez xebera te nekim, serê min qutke. Xwîna min tejî, tûlê te helal be!

Bedir – (*Cîê xwe radibe, milê wê digire, bisk û kezîên wê nerm mehez dike, dengekî merhemet*). Qîza min, bavê te xwedanê gilîê xune. Ez tucar nahêlim xwendina te nîvcî bimîne. Lê tu tenê xebera min bike. Pirsê bavê xwe erdê mexêre. Ezê wanara wî şertî jî girêdim. Lap arxayîn be. Wê dereqêda qet tu fikra meke. Kêfa xwe gelekî kok xweyke. Şemoê te timê bibe înatîtê, bîne. Şikir, maşîna wî jî heye. (*Narê dîsa digirî*). Ew ne jî wan xortane, wekî gilîê xwe neqetîne.

Têmir – (*Dengekî bi mene*). Xûşka mine delal! Bavo gelekî meêşîne, wî bibihê. Tu ku xebera wî bikî, tucar poşman nabî. Xelqê te tilya nîşanî hevdu bike. (*Vedibişire*). Çima tuê xortekî Şemo zêdetir bikî? Xwedê tera daye, îdî çi nazya dikî? (*Dikene diçe*).

(*Narê dîsa digirî, awirên tûjva dû wî dinihêre*).

Bedir – (*Dengekî bilindî hêrs*). Qîzê, çaku gilîên min qet te kar nakin, erê?! Qet tu tişteke nakeve vî qafê teyî vikî-vala?! (*Destê xwe ber serê wê dibe*). Çiqasî digrî, bigrî. Dixwezî lap xwe ber ava zim-zimkê jî hildî, yeke, ez çawa dixwazim, wê usan jî bibe. Xeberdan, girîê zêdeye bê faydene. Diha baş dibe tu cîê xweda mînanî xanima aqil, kemal, rihet rûnêy, hezkirina min qat-qat zêde bikî. A wî çaxî dilê minda tu çawa heyî, ruê sed carî zêdetir bimînî. (*Dengê girîê Narê lap bilind dibe, Bedir lap hêrs dibe*). Qîzê, “ez dibêm hingî-hingî, tu dibêjî boçik singî”? Bese wan lîlika bibarînî! Ez çawa dibêjim, wê usan jî bibe! Tu dibêhî, yanê na?! (*Milê wê digre berbi xwe dikşîne, Disekine*). Tû, nele bê... (*Dibêje*). Here, vê şîn şepûla xwe îdî darê girêde, xwe gelekî meêşîne. Navê wê xwendinê jî îdî cem min qet mekşîne. Te xwexwa şuxulê xwe xirab kir. Nava êla giranda, cem qenca, xirava min bêhurmet meke, ha! Zef zêde bikî, welleh, ezê dest-pîên te girêdim, zorê bibim bavêjme mala Bekir. Heta hebî, nahêlim pîê te vê şêmîka minda têkeve hundur. Te bihîst?! (*Berbi oda wê didefine, ser Besoda hêrs dibe*). Dibînî, cewrika te çi dike?! Ev gişk gunê teye!

Beso – (*Dengekî nerazî*). Mêro, dibînî, nika çi diqewime? Hal çiqasî giran dibe? “De were, vî terşî, vî diborîra derbas bike”. Bê tuê bikaribî yanê na? Wexta min digot, hela gelekî lez mekebe, tu cawê meşîne, hinekî kûr-dûr bifikire, hêdî-hêdî

destê xwe têla Narê xe, paşê cawê bişîne. Tu germ dibûyî! Te gilîê min nebihîst. Dîsa ya xwe kir. De nika keremke! (*Navbirî*). Nizanim, ev lezketin kêra lazim bû? Qîze sore, zere, bedewe, serbarîya serda qîza mêrekî noli teye. (*Lêvên xwe hildine*). Çi wext bixwazî, mişterîê wêyî serra sekinîne. Ev Şemo na, Şemokî dinê! (*Hinekî hêdî*). Mêro, lê dixwazim tişteki bêjim. Welleh, tîrsa te taqet nakim. Ditirsim tu dîsa minra tenzereke xaro-marolêxî. Çi bê ber devê teyî bedew, tewî ser minda valakî. Tişteki mehêlî. Welleh, wê rojê, Xezalê ser girtî eşaretek da min. Min him bawer kir, him jî bawer nekir. Çi bêjim. Îtbara dinê tune! Ruhê cahilayî tijîye. Hukmî ser dilê wan kirin gunekî herî mezine.

Bedir – (*Hêrs-hêrs*). Qîza nemeriva! Dîsa ew çi pîrsa tezeze, wekî tu ditîrsî, culet nakî minra bêjî? Keremke, keremke! Ez dil-canê xweva te dibihêm! Metirse! Wî mejûyê xweyî vikî-valava hederen-pederen, hûre-hûr, dilop-dilop dirêjî, şîrîn-şîrîn dilîlînî?! Diqewime, cewrika te xwe şewitandye, erê?! Wey-wey! Tê kivşê ezî razame! Welleh Ezîm, bille Kerîm, wekî tişteki usan hebe, xwedanê gilîê xweme! Qesem navê Xwedê kim, ezê tafîlkê berê serê te, paşê serê cewrika te pê kêreke ko jêkim, of nabêjim! Goştê we bavêjime ber tejî, tûlê dermalê! Nahêlim tu kes destê xwe bide we! Dest daya jî tevî we bikim! Te bihîst yanê na?! Lê, hema ewe li min kêmbûye! Çiqas serê minê sax be, ezê erbeta bibînim! Hişê xwe beravî serê xwekin! Cîê xweda aqil, rihet rûnên! Boy ruhê xwe bifikirin! Ezê...

Beso – (*Hinekî culet*). Mêrê minî delal, usan zû hêrs nebe. (*Cûrê ber dilda hatinê*). Çima hesp te usan zû direvîne? Hinekî sebir bike. Hezdikî min lap bukujî, ne kujî, ça dikî, bike. Lê îdî rastîê vekim tera bêjim. Duh Xezalê dizî Narê minra

got: "Qîza te û Nadoê dersdar zûda hevdu hezdikin". Mesela ese eve. Îdî çawa difikirî, bifikre. Ez çi bikim? Bêje, gunê min çîye? Wekî tu serê min jêdikî, goştê min jî didî tejî, tûlê ber derê mala xwe, loma jî qîza te usan mehkem sekinye, serê xwe kevira dixêre. "Na" dibêje. Nika tu dizanî, qîza te dizane. Herd hevdu aqil bikin. Bi sond, bi selawet, ez îdî tucar tevî mesela we nabim. Ne reş dibêjim, ne jî sipî dibêjim. Şuxulê weye. Hevdura ziman bibînin. Min gilê xwe got!

Bedir – (*Dengekî hêrsî bilind*). A, ha! De wekî usane, we zû bigota! Dêmek, we îdî bin pirada malok çêkirine! Welleh rinde! Şikir! Şikir! Îdî boçka dîk hate xanê! We tûyî bin zimanê hevdu kirîe, loma usan xwe heyîf nîşan didî! "Tu dizanî, tu dizanî" dibêjî! "Ewleda teye, çawa dixwazî usan bike". We îdî av bin min reşandye! Welleh we lap hişê xwe unda kirîe! Sema, qîza sema! Ez bav-kalên Nado nas dikim?! Yanê ew bav-kalê min nas dike?! Ez bi çî wî amin bibim, wekî qîzê bidime wî mielimê gund-gund gerîa! Îro li vî gundiye, sibê gundekî dinê! Îja, ezê hemû şuxul-emelê xwe berdim, gund-gund dû sema te bigerim, erê?! Hazir mişterî minî ber derê mine. Em deh bavên hevdu nas dikin. Cînarê salanin. Qenc-xiravîên me timê yek bûne. Rojên tengda pişta hevdu sekinîne. Sema te vê malê derte, dikeve wê malê. Wê timê ber çavê me be. Îdî vê rindtir çi dixwaze? Vê bazarê baştir bazar heye? Dîsa jî dibêjim, wê hezkirin, wê mezkirina xwe mejûyê xweyî dew lêketî derxin! Sewdaên usane pûçe, vikê-vala ber guhên min tu avê naxun. Min îdî mêrikara cawa xwe şandye! Sema te bimre, ya erdêye, bimîne, şûna wê tenê mala Bekire! Min wî serîda wera qetse xwe danyê! Ew sewdaê weyî arode, qîr, berfê bişewite jî, tucar serê xwe nagre! Xwe ber baranê şil mekin! Hûnê biqîlînin! Min

hespê cina sîyar mekin! Destê xwe aqil, kemal, rihet daynine ser dilê xwe, bazara minra qayîl bibin. Rojê sed carî rabin, rûnên, Xwedaê xwe şikir bikin. Rehmê bidine dê, bavên min. Nanekî bixun, yekî nezir bidine tî-birçya, bila dua we bikin. Dîsa dibêim, sed-sed carî şikirbûna xwe bînin.

Perde berjêr dibe.

Mala Bedir nav tarîstanêda naê xanê.

PERDA DUDA BEŞA ÇARA

Perde hêdî-hêdî bilind dibe.

Mala Bedir tê kivşê. Bedir, Beso û du pîrejinên nûranîe dîwanêda rûniştîne, hevdura diaxivin. Vê demê ji devra dengê nerm ban dike: "Xwedanê malê!" Derî hêdî tû kutanê. Bedir zû dêrî vedike. Hinekî paşda vedikişê. Kek Ezîz, Bekir, Melle Rzgo, Almast û çend mirovên gund dikevîne hundur.

Bedir – (*Vedibişîre, dengê hêdî*). Keremkin, keremkin. (*Bekir çavê wî dinîhêre, hinekî pê xwe xweî dike. Bekir destê wî digire berbi xwe kaş dike*). Kuro, malik avao, tu xwe usan dîr digrî, dîtî bîjin tu qey cara yekêye hatî vira. (*Dikene*). (*Mêr ser stûla, krêsloa, jin dîwanêda rûdinên. Beso zû ji dilê xwe radibe, berbi kulîne diçe, wekî tivdarekê mêvana bike*).

Bekir – (*Dengekî hêdî*). Xûça min, hela zûye, lez mekeve. Berya gotî: “Berê kirik, paşê xurik”. (*Beso paşda vedigere. Bedir, Bekir çavê hevdu dinihêrin, vedibişirin. Bekir çavê Kek Ezîz dinihêre*). Kek Ezîz, tu çawa rûsipîê gund gişkî, usan jî rûsipîê minî. Çawa wekîlê min, tu Xwedî extîyarî. Keremke. Derheqa hatina armanca meye vir gilîê xwe bêje, her tiştî zelalke. Bila hemû bizanbin, em boynet çî hatine.

Kek Ezîz – (*Dengekî nermî maqûl*). Bekir, ez gelekî te û xûşka xweye Almast razîme, wekî we çawa rûsipî ez dame pêşya xwe, anîme mala Bedirê bira. Xwedê we merivaê kême meke. Bi zana aqîlê min, armanca hatina me Bedirra eyane. (*Navbirî*). Bedir can, berê ewil, ser hezkirina Rebbê Jorîn, paşê bi xwestina malbeta Bekir, me pîê xwe îro boynet armanceke şîrîne here delal danye vê şêmîka te. Ez aminim, wekî emê hevdu fem bikin, bêne ser mexsedekê. Înşanllah, tuê me posîde paşda venegerîni. Emê eşq, şa ji şênî te herin, wekî Xwedê li hevdu bîne. Em dixwazin wekî keça teye bedew, şagirta mine hezkirî, Nara teye delal Şemoê kurê Bekirê dostî tera bixwazin. Kal-bava berê-berda gotye: “Qîzek ya kurekîye”. Extîarî ya teye. Welleh, dîtî heweseke mezinva bêjin, “Xaliq Alem ev herdua hema boynet hevdu xuluqandine”. (*Vedibişire*). De, gelî hazira, min deynê xwe qedand. Ez gilîen dinê dispêrime we. Şuxulê mayîn ewê jî îdî hûn dizanin. Pirsê kutasîê dikeve alîê Bedirê bira. Eme hîvya bersîva wîne. Ew çî bêje, çî qaydeyî lêxe, emê ber defa wî usan bireqîsin. Berya gotî: “Em penêr, ew kêr”. Çawa dixwaze, bila usan bibire. (*Dikene*).

Bedir – (*Serê xwe bilind dike. Dîna xwe dide hemû hatya. Dengekî nizmî zelal*). Gelî biraên mine pir qedir! Hûn ewil ser serê min, ser çavên min hatine. Kek Ezîz çawa rûsipîê Bekirê, usan jî rûspîê mine. Em herd jî şagirtê wî bûne. Çî

pewîst bû, wî hemû got. Xebera rûspîa kirî, poşman nabe. Ez û Bekir hevalê hevduye zarotîne. Hinekî pismamtya me heye. Timê cînarên hevdu bûne. Şuxula xêrê xêrê tîne. Bila Xwedê şuxula zyanê nede. Wekî we tewa rewa dîtye, boynet vê meselê derê min vekirye, Xwedê jî zane, hûn gişke bal min ezîzin. Xwedê bimbarek, pîrozek bike! Ez jî boynet xatir û hurmeta we ezim qîzeke, wê jî qurbana we dikim. Dubar dibêjim – bila Xwedê bimbarek, pîrozek bike!

Kom bi hevra – Xwedê rû te sipîke! Bila Rebbê Jorîn hezar carî bimbarek, pîrozek bike! Xwedê te merivtaê, qewmtîê kême neke!

Bedir – Hûn vê gavê jî dikarin nîşanîa xwe daynin. Malbeta mine jî bi dil û can qayîle.

Bekir – (*Dengekî şa, berbi Almastê dibe*). Xanima mine şase, pere, şereze. Îdî hîvya kêyî? Kêra çav dikî? Vê rojê şîrîntir rojên din hene? Rabe, deyl-hîçikên xwe hilde, derê meydanê. Şuxulê xwe biqedîne!

(*Almast ji berîka xwe gustîl û bexdaîkê derdixe, tevî Beso şa-şa diçe oda Narê. Dema nêzikî Narê dibe, Narê paşda vedikişê, hêsirên xwe paqij dike, dengekî bilind digirî. Nahêle Almast nêzikî wê bibe. Almast gustîlê û bexdaê bi hêrs davêje ser kraveta Narê. Dêmekî xeyîdî, posîde paşda vedigere. Dengê girîê Narê lap bilind dibe. Hemû çavên hevdu dinihêrin, guhên hevduda dikine piste-pist. Bedir zû ji cîê xwe radibe*).

Bedir – (*Dengekî pir xwe amin berbirî wan dibe*). Gelî mêvan, dost û pismamê mine hêja! Fikra xwe medîne wan. Tîqtên vik-valaye, bê hîm. Dilê xwe lap germ xweykin. Ew şîr-şepûlê mînanî tavîa barana baharêne. Ewe bê wedene, bê dawîne. Nişkêva gur tîn, derbekêva jî zû xilaz dibin. Piştî wêra taveke zêrîne bîna misk enperê jê hatî dertê. Dîsa erd û

ezman rûê merya dikenin. Keskesor dertê. Gul gazî gulê dike, bilbil gazî bilbilê dike. Ez mêrim. Min çi gilî daye, ewê jî bê qedandinê. Hûn dikarin sed selefî arxayîn herine malên xwe. Fikrên dine başqe serê xwe derxêrin. Qet nerihet nebin. Extîyar îdî ya weye. Hûn dikarin lap sibê jî, dusibe jî, yanê jî kêfa we kengê xwest, bên deweta xwe bikin, bûka xwe bivin. Îzna tu kesî tune wera bêje ser çavên we buru hene. Yanê jî kê-m-zêde xeber bidin. Kî jî gaveke usan bavêje, ewê hêla minda bersîveke usane sert bistîne, wekî heta hetayê ji bîra wî wê derneê - mêr be yanê jî kulfet be. "Xwedê yeke, gilî yeke". Hetanî nika tu kesî culet nekirye, wekî tiruşî ser qeleça min bike, we bihîst?! Aminim, nika jî kesê nikarbe tiruşke.

Melle Ehmed – (*Dengekî durû*). Bedirê birazî! Mala te sed cara ava be. Eme vir mala Xwedê ji te razîne. Ev qedir, qîmetê, ku te îro mera kir, serê me, serê hevtê hevt bavê me zêdetire. Bila Xwedê tu cara kerema xwe ser te kê-m meke. Berya rast gotye: "Gîha ser koka xwe şîn dibe". Welleh! Hema rehme lê bûyê bavê te jî nolî te bû, çi digot, wekî dinê xerab bibûya, serê wî jî biçûya, ew bê tirs, bê xof diqedand. Mineta xwe, Xwedê pêştir tu kesî nedikişand. Xwedanê gilîê xwe bû. Eferim! Kurê baş bavê baş diçin. Bi zana aqilê min, îdî her tişt çawa pêwîst bû, usan jî xilaz bû. Lê, bîr mekin: tişteki eseyî ferz hela maye. Gelî birazya, em musulmanin. Nikarin ji qanûna dînê xwe derên. Wekî hûn îzna min bidin, ezê bêjim, him jî hema vira wê biqedînim.

Bedir – (*Vedibişire*). Mellê meyî delal, keremke, Fikra xwe lap arxayîn bêje. Bê ev tiştê ferz çîye, wekî me hel nekire, sergirtî maye? Bi îzna Xwedê, wekî qeweta me bigihîje, emê elbêra wî jî hel bikin. Wê derheqêda tu tu şayîşa mekişîne (*Dubar dikene*). Tu gula ber bîna meyî. Bê te em kêra lazîmî?

Loma jî em ser sivra xwe berê ewil cîê herî jorîn te dine rûniştandinê.

Melle Ehmed – Bedir, Bekir, ez delîlê weme. Şikir Xwedê, bi gotina şerîeta dînê Îslamê, îdî herd gulêd me îroda bûne helalêd hevdu. Lê qanûneke dînê meyî herî ferz jî heye. Em gerekê wê qet bîr mekin. Ew jî eve, wekî îro şûnva bê mar bimînin, çavên hevdu jî binihêrin, wera gunekî gelekî mezinî ne baxişandî tê. Hûn, wekî extîyarî bidin, rewşa bibînin, ezê hema îro jî, vî erdî, yek car mara wan jî bibirim. "Serî birî, guh seqirî". Berya gotî: "Av çiqasî golada dimîne, ewqasî genî dibe". Bila her tişt carekêva kuta bibe. Hatina wan herd gulêd meye vira lazîm nîne. Hûn wekî ewledên xwene. Şikir Xwedê hela hûn herd jî saxê, silamete, huzûrê hazirin. Extarya wane destê wedaye. Hûn çawa dixwazin, extîyarîa we heye usan jî bikin.

Hemû mirovên hazir, gişk dengekî bi hevra – Rehma Xwedê gora dê, bavê te be. Tu rast dibêjî! (*Dikenin*). "Hesin germî, germî dha rind tê kutanê".

Bedir – (*Dikene*). Mellê meyî delalî, bê qusur. Ne min hinekî berê tera got. Tu him pêş Xwedê, him pêş Resûlê Ekrem, him jî pêş vê cimaetê cavdarîke mezin dikeve stuê te. Me hêla dînda hemû extîyarîê xwe dane te. Çawa rê dibînî, usan jî bike. Îzina tu tarî bendeyî tunene tevî şuxulê te bibe, bêje tuî şaşî yanê jî pirseke ne layîq tera bêje. (*Dîsa dikene. Radibe, milê wî digire*). De rabe. Îdî meydan ya teye. Hunerê xwe nîşan bide. Bila tew bibînin.

Melle Ehmed – (*Dengekî hêdî*). Bû, bû, birazîê minî delal. Lap arxayîn be. Apê teyî çawa lazîme, wê usan jî bike. (*Îtanî Bedir û Bekir dike. Pêş hevdu dide rûniştandinê. Herd pêçlên wane destaye mezin dikute hevdu, bin lêvava ayeta mar (Kebîn) birîne hêdî-hêdî dixwîne. Xilaz dike. Vedigere rûê*

cimaeta rûniştî dinihêre. Dengekî xwe bawer). Gelî cimaeta hazir. Şikir, min îdî şuxulê xwe qedand. Hûn gişk bibin şede. Min mar ser du zêrên deha birî. Gune stuê Bekirda dimîne. Xwedê bimbarek, pîrozek bike. Gelî birazîa, îdî hûn dizanin. Çawa dixwazin, usan bikin. Bila Xwedê şaya wa têxe ber derê we hemûya.

(Beso dilekî kulî, birîn, sinîkêda çend fîncan ça şîrîn tîne. Her mirovek fîncanekê weduxe. Xatirê xwe dixwazin, diçin. Bedir, Beso, Melle Ehmed û herd pîrejîn dimînin. Lê dengê girîê Narê çiqas diçe, lap bilind, zelal û şewat tê bihîstinê).

Bedir – *(Ser Besoda hêrs dibe). Qîza nemeriva, ne min tera got: “Here, aqilekî baş têxe serê wê cewrika xwe”. Bila îdî min teberê dernexe! Çiqasî zûye, bila dengê xwe bibire! Yanê na, ezî hetanî we wextê heyfî pakim, wekî teberê derneketime, haa..! Derketinê, ewê jî tu dizanî! Ezê ecêbeke usan bikim, wekî hetanî nika kesî ne kirî, ne jî bihîstî. (Milê Beso digre, berbi oda Narê didefîne. Beso diçe oda Narê).*

Pîrejina ewil (Meta Bedir) – Bedir, Bedir, metê qurbana te be, usan gelekî hêrs nebe. Em hemû vê rojêda noli wê giryane. Wextê rehme lebûê kalkê te ez dame Keleşê rehmetî, ez teze ketibûme sala panzda. Min destê xweyî rast, çepê hevdu naznedikir. Çavê meta te birêje, Keleş emirda hevalê apê minî Esed bû. Timê tevî hevdu şîvantî dikirin. Pîrgerê hevdu bûn. Bê hevdu parî ne dikirine devê xwe. Timê di hate mala me. Min jêra “apo” digot. Nişkêva kulfeta wî çû rehma Xwedê. Du zarên wîye min mestir hebûn. Rojêkî Keleş dîsa tevî biraê xweyî mezin hate mala me. Tevî bavê min, apê minî Esed xêleke xurt xebardan. Hiştin çûn. Sibetirê dayka min hine perçê gul-gulî teze anî. Gazî min kir. Ser min pîva, birî. Min qet tiştek fêm nekir. Tenê şa bûm ezê kincê teze li xwekim. Çendek derbaz bû,

Keleş dîsa tevî birê xwe hate mala me. Dîya min ew kinc zû-zû li min kirin, ez xemilandim. Tarî kete erdê. Bavê min destê min girt, kire destê Keleş. Wan ez hildam birin. Çend şev, roja giryam. Paşê xwexwa aşt bûm. Bextra Keleş jî zû çû rehma Xwedê. Pênc sêwîê bin bêjîng hîvya minva hiştin. Wexta çû rehma Xwedê, emrê wî hevtê derbaz bûbû, lê eze hela tere, can bûm. Nika meta xwe rind bibihê. Qet tu fikra meke. Girîê wê nenihêre. Ewê jî xwexwa aşt be. Cahilî, lao. Fikir merya zû kal dîkin.

Pîrejina duda (hevala dayka Bedire qîztîê. Bedir wêra xatî dibêje) – Bedir, Bedir, xatî qurbana serê te be. Welleh meta te rast dibêje. Xwe gelekî meêşîne. Hêrs nebe. Ewê xwexwa bigirî, xwexwa jî aşt bibe. Lao, me kîjanê bi dilê xwe mêr kirye? Kurxûşk, min bibaxşîne. Rind tê bîra min: eze çarde yanê jî panzde salî bûm. Rojêkê du mêr jineke navsereyê min nasnekirî hatine mala me. Wê şevê mala me man. Min dît, wekî ew bavê min hevdura şîrîn-şîrîn xeber didin. Carna jî hêla min dinihêrin, dikenin. Femê min nedigihîşt, wekî ez guhê xwe bidime ser xebardana wan. Lê gilîk min bihîst. Bavê min bîst pez got, wan panzde gotin. Sibetirê dayka min wê jinê ez xemilandim. Min kincê teze ku dîtî, gelekî şa bûm. Nîvro min hespekê syar kirin. Wan ez birim. Em evarê gihîştine oveke ne mezin. Ez kirme konekî çûçikî, kevin. Pêş min perdeke qirêj kişandin. Jinek tenê bal min ma. Xêlek derbaz bû, ew jinik jî çû. Nîvê şevê nişkêva mîrekî rûî rehman perê perda min vekir, kete hundur. Ez jê xof girtî bûm, rabûme ser pya. Berê xwe jê guhast. Ew kenya, got: “Bûkê can, berê xwe min meguhere. Ez – helalê teme. Tu boy min anîne”. Ez çend-çend roja, şeva giryam. Min dît, feydê girî tunene (*dikene*), paşê xwexwa aşt bûm. Zef xwe meêşîne, ewê jî bigirî, paşê xwexwa aşt be. Bimbarek-pîroz be. Bazareke rinde.

Melle Ehmed – (*Dengekî nerazî, berê xwe berbi wana dike*). Canim, ev çi pit-pitkin hûn dibêjin? Ez nizanîm, “em giriyane, em zêryane, ber hêwan bûne daykên sêwya. Nîv cî, nîvê rê mane...” Xwe kafir mekin! Ev edeta rehme lê bûyê pêxemberê meda maye. Resûlê Xwedê jî çil salî Ayîşê xanimê mestir bû. Besin, besin, rehme dê-bavê webe! Terka wan pit-pitke xweye vike-vala berdin! Bav-kala gotye: “Barê qîzayî girane, kê pişta xwe da ber. Mesekine, zû bide piştê, bila bibe”. Xilaz bû, çû. Xwedê bimbarek, pîrozek bike! Welleh Ezîm, bile Kerîm, vê bazarê rindtir tu bazar tunene. Bazareke usane başe, lap bîna gula, sosina jê tê. Kuta bû çû! Îdî ev çîrokên we kera lazîmin?

(*Herd pîrejin çavê hevdu diniherin, hêdî-hêdî dikine piste-pist. Lê dengê wana tê bihîstinê*).

Pîrejina ewil – (*Berxweda*). Heylê quzulqutê çûyî. Binê bê çawa tûje-tûj me dinihêre. Xeberdana me nevqa wî digire. Ewa jî feqîra Kewa rehmetî bîst sala zêdetir mestir bû. Belengazê heta roja mirinê jî wey dil, wey Hesên got. Merez girtî bû, ber hêwan çû ax berê sar. Kezav, zora pera ew sendi bû. Dinihêrî, melûm, roj bi roj cahal dibe, wê bibe zevzevîê ber devê cehnemê.

Pîrejina duda – (*Dengekî kasil*). Xûşka Senem, te lap ji kûraya dilê min xeberda. Tu zanî ev melûma çîye?! Wî bê murvetî ew êdik nemane, ne kirye. Wî zulm dihanî serê Kewa belengaz. Wê serî li wî dane danî. Wî jî ew şev, roj cîê sekinî davîte bin pehîna. Kutaî, kutaî emrê wê xar. Heyfa xwe jê derxist. Şande qebra sar. Tu bûyî şedê gunê wîyî îro! Kezav boy xêra xwe ev şuxula bê îsafe, bê ayîk, çawa hev simand. Av bê

şêlû kirî xwera mesî girtin. Wî gelek cahilê wa bedbext kirine. Hezar-hezar neleta Xwedê li wî bê. Ewê boy gunê wan cahila agirê cehnemêda bibe rijî. Cîê wî tenê cehnemeye.

(*Narê çavê hêsir ji oda xwe dertê. Dixwaze here. Beso nerm, hêdî milê wê digire*).

Beso – (*Dengekî nizmî, milahîm*). Lao, dayîk qurban, îdî girîê xwe xilaz bike. Bavê xwe bibihê. Gilîê wî erdê mexêre. Nav êlêda xelqî navekîye, bavê teyî du navane. Bêhurmet meke. (*Berxweda*). Lê, ez belengaza, ez qertala xwelya kîjan welatî ser xweda elekkim. Mecbûrim wa bêjim, ber dilê wêda bêm. Belkî hinekî aşt be. Dilê wê vepesire. Yanî baxirê wê biteqe! Yeke, ew dilkevir çawa bixwaze, wê usan jî bike. Xwe pêştir gilîê kesî nake, nabihê. Xwe gişka zanetir hesab dike. Qîza min, te bihîst? (*Hêsirê xwe paqîş dike*).

Narê – (*Kelogirî*). Êêêê, dayka mine belengaze, feqîre, çavgirtîye, ji emrê xwe tu tişt femnekirî... (*Kesereke kûr dikişîne*). Dinya boynet bavê min şevereşe, ew pêş çavên xwe pêştir tişteki navîne. Kesî ha ji derdê kesî tunene. (*Dengekî bilind digirî. Destê xwe ji destê dayîka xwe derdixe. Wê hemêz dike, diçe*).

Perde hêdî-hêdî berjêr dibe.

Dik nav tarîstanda minê dibe.

PERDA SISYA BEŞA PÊNCA

Perde vedibe.

Dik nav ronayêda zelal tê xanê. Xaliçeke mezine raxistîye. Stol, stûl, dîvan û du krêslöye danîne. Narê û Xezal dîvanêda rûniştine. Narê dengêkî bilind digirî, zû-zû hêsirên xwe paqij dike.

Narê – (Dike îske-îsk). Qîzê, ez nizanim, te nîma min gîhandî Nado yanê na? Ev xêlê wedeye ji wî tu deng-his tunene. Nizanim, ew bê îsaf çima usan dike? Diqewime ew jî?.. Şuxulê Xwedê kes nizane. (Dîsa hêsirên xwe paqij dike). Welleh, hindik dimîne dilê min lap biteqe. Qet carekê jî xwe nîşan nade. Xûçê can, qurbana teme, dîsa xwe bicerbîne. Belkî tu wî bibînî? Lê tu ezyetê min nekişînî, kê bikişîne? Qîzê, ez nav agirê cehenemêda dişewitim! Qet vêca te nîne? Em bûne xûşkên hevdu. Me bavê xwe kuştî, wekî gorê sond buxun?! Agir çiqasî dişuxule, helepêtia wî ewqasî bilind dibe. Îlac tenê tuyî. Xwe çalî-balya xe, belkî tişteki bikî! Tenê bila bê! Destê min bigire, kuda dixwaze, wêda jî bibe. Ew jî, ku bê îtbar derket!.. Îlaca min tenê tişteki dimîne. Seva pêşîra xwe bavê xwe ilaz bikim, gora sar minra diha başe, ne ku bibime jina wî eweneyê, heredîyî ser goveka gerîyaî. Mirine guh seqirîye. Qet nebe meriv wêda rihet radizê. Kesek ne te dileqîne, ne jî diêşîne. (Kesereke kûr dikişîne). Ax! Ax! Bavo! Bavo! Ev çi zulme tu tînî serê min?! Min ji te qet ev yeka bawer nedikir! (Digirî).

Xezal – (Wê hemêz dike, maç dike). Qîzê, dîn nebe. Ew çi xeberdane tu dikî? Na, na. Bila xuşûşîên usan qet nekevîne dilê te. Nado ne xortekî ewqasî bê îsafe, wekî te usan zû bîr bike. (Dikene). Ew te pêştir keseke din hiz nake. Gula ber bîna wî tenê tuyî. Welleh, min qet bawer nedikir, wekî tu ewqasî wî hiz bikî. Qîzê, havîne, mekteb hatine dadanê. Dersdarê dûr hatî tew çûne malê xwe. Nado ne gundê me, ne jî nehîya meda dijî. Ez çi bikim?! Min wê rojê nema te da Kerem. Wî got: “Nado çûye Lênîngradê. Akadêmîa dewletêda para kurdî heye. Wir întamê aspîrantûra dûreke dide. Wê zûtîrekê bê”. Delala min (dikene), qet ewqasî fikra meke. Ew çiqasî jî dereng bikeve, çawa bê, wê elbêra meselê hel bike. Ew ne kurekî ewqasî bê destî, bê pîyî feqîre. (Vedibişîre). Hûnê herine Lênîngradê, ezê qet nekevime bîra we jî. Kêfê bibe kêfa we. Tuê xwera hevalên daha baş bibînî.

Narê – (Dengêkî gazin). Êêê, xûşka mine delal. Ez çi difikirim, tu çi dibêjî? Berya gotye: “Bizîn ketîye heya ruhê xwe, qesav bez digere!” Qîzê, min qet bawer nedikir, wekî tuye ewqasî bê îsafî! Wekî ez herime serê wê dinê jî, Xwedê kim, qet te rokê jî bîra xwe dernaxim. Ew çiqasî dereng bê, şuxulê me ewqasî xirab dibe. Ber çavê min, xênji te, wî pêştir îdî tu kes naê kivşê. Ez tenê zû hatina wî dixwazim. Tenê bila çavên min çavên wî kebin, îdî tişteki minra lazim nîne. Ya Nado, ya! Wekî ew jî... Ezê xwexwa bextê xwe hel bikim. Gora sare hîvya min sekinîye. (Digirî). Wî wedeyî bavê mine bizanbe, wekî çi gune û şaşîkî mezin kirye. Lê îdî wê dereng be. Ax! Ax! Bavo! Bavo! Ev çi zulme tu tînî serê min! Çima nahêlî ez mirazê xwe şa bibim?!

(Vê demê Beso tê cem wan. Nav mitalada Narê maç dike û qirikê evraz dibêje).

Beso – Lao, ez qurbana bejin-bala teme, lê tuê hetanî kengê wan hêsirên şewat bibarînî, xwe birêncînî? Hinekî jî navbirîê bide! Qîza min, şuxulê Xwedê kes nizane. Bende ya xwe dike, Xwedê jî ya xwe. Xwedê xwe qet bîr meke. Rebbê Jorîn qismetê te kî nivisye, ewê jî bibe para te. Rabe! Îdî bese! (*Berê xwe difetlîne*). Dayîka te bimire. Xwezil min tu qet neanyayî, ev zulma te nedîta. Tuê xortekî wî baştir bikî? Bavê te timê dibêje, kurê mêrik mêrekî serê sed mêrane. Hevalên te timê xwezilya xwe te bînin. Tuê gişka rindtir bijîy.

(*Nişkêva derî vedibe, Têmir halekî pir perîşanda dikeve hundur*).

Têmir – (*Destê wî, dev-lêvên wî diricifn, zû-zû diaxve*). Daê! Daê! Tu dizanî... (*Navbirî*). Îro qezyake çawa mezin li me dest daye! (*Dîsa navbirî*). Nehîyêda dizîke gelekî mezin bûye. Diza mirovek jî giran birîndar kirine. Diqewime bimre jî. Wana çawa hevalên xwe navê Şemo jî dane. Îro mîlîsîa nav gund nişkeva Şemo girtin, destê wî qeyd kirin, birine nehîyê. Min elbêra caw da apo Bekir, ew ricifî. Lezo-bezo dû wî çû nehîyê. Welleh, gunê min usan wî hat. Elbêra dev, lêvên wî zingirîn, gewirya wî kire qurte-qurt, xeberdan pê ne bû.

Beso – (*Şa-şa cîê xwe radibe*). Kuro, lao! Bavê xwe bibîne. Vê cawa çav ronikaê zû bidêda. Şerme. Bila zû dû Bekir here nehîyê. Heta nika başqe, nika başqe. (*Lêvên xwe hildike*). Ew dil-hinavê bavê tene. Wê me bixeyde. Ez çi bikim. Ew jî wera hindike. We sîngê xwe vekiri bû, pesin ser pesna didanê. Kevirê wî diavîte hewaê, serê xwe dida ber. De nika cawê bidin! (*Narê, Xezal çavê hevdu dinihêrin, dikenin. Beso jî dikene. Lê ser vanda giva ku hêrs dibe*). Hey porkurno, lê hûn çima ewqasî şa dibin? Rûnê helandî ser dilê xwe dixînin? Şerme! Der-cînarê we bibînin! (*Xwe jî dikene*).

Narê – (*Bilind dikene. Wê hemêz dike, herdu rûên wê maç dike*). Daê can, minra vê cawê şirîntir tu cav tune. Ezê Xwedê gelekî razîme, dengê min bihîstye. Sed car şikir, wekî wa bûye. Ew bavora, Têmirra gelekî hindike. Ewê gele cara boy Şemoê xweyî “mêrxasî, aqilbend” wê ber derê mîlîsîa stuê xwe xar bikin, pirsên ne layîq bibihên. Lap wê herne ber derê kela jî. Çima wan ew beredîê, dizî, berdiz nas nedikirin?! Çavê xwe girtin, ez destê zorê avîtine agirê cehenemê.

Têmir – (*Ser Narêda diqîre*). Dengê xwe bibire! Pintîya mine neşûştîye, herame! Ezê rabim herdu çavên te rast qulekêra derxim. Hela tu min vê porgijika gemare, qulorekî binihêre! Lê, ew jî xwe meriv hesab dike! Îdî Şemo jî begem nake! Gunehkar bavê mine, wekî wedêda zimanê te jêkira, teê nika wa ne kira pile-pil. (*Hêrs radibe, piên xwe dêrî dixîne ji dikê diçe. Narê û Xezal jî pey wî kene-ken dikê dertên. Bedir halekî gelekî posîdeda tê dikê*).

Bedir – (*Tûje-tûj çavê Beso dinihêre*). Qîza nemeriva, tu dibînî yeke ne bûye çawa giran hate serê Bedirê belengaz? Bila îdî dilê te, cewrika te lap rihet, hêsa be! Tê kivşê, Xwedê ew şîn-çepûlên we, nifirên we bihîstin, loma... Qet nizamim, dawîê çawa bibe? Welleh, malê minî hinekî qalim hebûya, minê xwe bida pêşîê. Nedihişt ew xortê baş tu ezyetî bikişîne, têkeve kela. Xwedê rûê tunebûnê reşke! Wezna aqilê min, tevgerêdana Şemo gelekara hebûye. Kurê mêrik lap hetemekî teyra bû. Bila Xwedê alîkarîê bidêda. (*Dixwaze here. Beso destê wî digire*).

Beso – (*Kesereke kûr dikişîne, zelûl-zelûl çavê Bedir dinihêre*). Mêro, lê wedê min tera digot “Evdê Xwedê, hela cîê xweda hinekî rihet rûnê, her tiştî hilde, dayne, sed carî bipîve, hê bibire”, tu ser minda hêrs dibûyî. Ew dima, wekî min bikujî, ser nîgekî dilêistî. “Ez bavim, min çawa gotye, gerek usan bibe”. De

nika keremke, “were vî terşî vî buhurîra derbazke”! Bê tuê çawa derbaz bikî?

(Vê demê Bekir û Têmir nişkêva derî vedikin, gelekî posîde dikevine hundur. Mêr û jin elbêra dengê xwe dibirin, çavên Bekir dinihêrin. Derbara Şemoda jê dipirsin).

Bekir – *(Halekî kasilî, westîaî)*. Bedirê bira, welleh min lap serê xwe unda kirye. Qet nizanîm çi bikim. Hal çiqasî diçe, ewqasî giran dibe. *(Navbirî)*. Nizanim, kuda herim? Ku bigerim? Kê bipirsim? Derê kîjan îdarê, kîjan mirovî nas, nenas elbêra vedikim, devê minda lêdidin, nahêlin xeber bidim. Tenê Şemo, Şemo dibên, cîê xwe radibin, min holî devra dikin. Gelek mirovên nehîyê ku min dibînin, destê xwe berbi min dirêj dikin, “bavê Şemo ewe” dibên, dûr diçin. Bixwazin, nexwazin rya xwe ser min diguherin. Tenê hîvya min maye Rebbê Jorîn.

Bedir – *(Dengekî heîrî)*. Bira, lê axirîê çawa bibe? Lê qet îmkanek tunene? Disa valî-walî here. Qet nebe mirovekî nas bibîne, tişteki bavêje dêv, belkî ew hinekî arîkarîê te bike. Ser şuxulra bisekine. Yanî malda rûniştinê şuxul pêşda naçe. Ezê jî sibê herime nehîyê. Çend dostên mine rûmete kevin hebûn. Belkî yekî, duda bibînim, jê hîvî bikim. Ax, ax rojên çûyî! Dost hebûn, heval hebûn, hurmet hebû...

Bekir – *(Kesereke kûr dikişîne)*. Êh, Bedirê bira, te çi unda kirî, tu çi digerî?! Min devê xwe li kê vekir, kes li min nebû xweyî. Rastî jî, ev dinya – dinyake gelekî bê îtbare. Mirovên ku min tevî wana tonnava nan, av xwarî, ev nika min dibînin, selame nadine min. Rya xwe ser min diguherin. Êêê, vê şûnva îdî ez çi dikarim bikim? Dîsa hîvî, homit maye Xwedaê mezin. Belkî ew dergekî xêrê li rûê Şemoê min veke. *(Bekir ji dikê diçe. Bav û kur dimînin)*.

Bedir – *(Dengekî nizim)*. Kuro, lao, lê tu qet hinekî haj ji şuxulê Şemo heyî yanî na? Belengazê Bekir lap serê xwe unda kirye. Binihêre, bê cimaeta gund dereqa wîda çi xeber dide. Te ku dît kîderê du-sê merî kom bûne, dikine piste-pist, dizîkava zû here nêzîkî wan bisekine, guhê xwe bide ser axavtina wana. Belkî qet nebe, tişteki ji wan hîn bibî. Zû cawê bide min. Kal û bavên me gotye: “Gillê êlê zû, dereng rast dertê”. Ew qewmandina êl ku pê dizane, Xwedê pêştir kesek pê nizane. Lawo, ew hetanî nika gundîê me bûn, lê nika xînamîê mene. Gerekê em serya ser Bekir nebirin. Cimaetê me bikene, binelîne.

Têmir – *(Hêdî netika xwe miz dide, kesereke kûr dikişîne)*. Şemo... Şemo... Bavo can... *(Navbirî)*. Çend roja berî vî çaxî dewletê xwe sûda Şemo û hevalên wî kir. Eyan bû, wekî Şemo wanara zûda hevaltî kirye. Vê dizîê pêştir tevî wan gelek şuxulên xirab kirye. Dewletê her yekî heyşt, neh, deh sal gune danê, şandine Sîbîra sar. Şemo jî deh şal dane, ew jî şandine Sîbîrê. Boynet dilikê te, daê ne dihişt ez vê cawê bidime te. Bekir jî ji te vedişêre. Çima tu nabînî, mêrik lap nîvî bûye?!

Bedir – *(Serê xwe berjêr dike, xêleke xurt dikeve nav mitala)*. Lao, xwezil te vê sibê zû qet ew cawa neda min. Wekî min nizanbûya, wê dha baş bûya. *(Cîê xwe radibe, nav malêda valî-walî diçe, tê, evraz, berjêr dinihêre. Xwîya netika xwe paqij dike. Kesera ser kesera dikişîne)*. Heyf, sed heyfa wî xortê çapikî, çelexanî, comerdî, mêrxas. Welleh Ezîm, bile Kerîm, kurê mêrik serê sed mêrî bû. Lap xalê xweyî Hesên çûbû. *(Dîsa netika xwe miz dide)*. Lao, lê dû wî kî weê mezintaya cahalê gund bike? Kî weê derê pêşîa cahilên gundên din? Lao, tu xwe bide pêş. Navê min unda meke. Qencî, xiravîe timê cotin. Wî nedihîşt tu kesek tîrûşî ser gund bike. Qedrê wîyî bal min gelek pir bû. Boynet wan senetên wîye qenc min wî pir hiz dikir. Kurê

mêrik nav weda nolî beranekî kelî şîşme dihate xanê. Çavê merya jê têr dixwar. Boynet wê mêrxasîa wî min Narê da wî. Welleh, nolî qîzekê dilê min ketibûê. Xwedê mêrê mêrxase nolî wî kêmkê dixulqîne. (*Dengekî nizam*). De were, bê tuê nika ber tel-niçên wê qîza nemeriva, wê cewrika çawa teyax bikî? Çi cawê bidî?

Perde berjêr dibe.

PERDÊ SISYA BEŞA ŞEŞA

Perde vedibe.

Dik nav ronayêda rizma xweye berêda, bê guhestin zelal tê xanê. Nado û Kerem dîvanêda rûniştîne, şa-şa hevdu dinihêrin. Geh dikenin, geh jî hevdu hemêz dikin, şîrîn-şîrîn diaxivin.

Kerem – (*Dengekî nizam*). Bira, welleh ezî bê hesav şame, wekî şikir tu îdî qebûlî aspîrantûraê bûyî. Ev boynet min bextewarî û kubarîke pir mezine. Te îdî rêça min jî vekir. Îzna Xwedê, ezê jî saleke din hermêda. Lê, bê însaf, tu kengê hatî, li kuyî, ku digêrî? Me digot, yeqîn tuê îdî wir bimînî. Tê kivşê, te îdî bîr kiribû, wekî xênji min, Xezalê, vir dîsa çavniherîke teye din jî heye? Ew jî çi çavniherî, keweke çav nexşîne, nukul sore,

şase-per. (*Dikene*). Welleh qîza mêrik hindik dima deyil-pêşên me biqetîne. Seva te ne roja wê roj bû, ne jî şeva wê şev bû. Rojê bawer bike sed carî gelectir ew te ji min, Xezalê dipirsya. Kuro, pake wekî tu wededa hatî, derketî, yanê... Yanê na, Narê wê dinê xirav bikira. Ez nikarim kirinên ku wê dikirin, nolî şikilkêşekî bînime ber çavên te. Çetinaê dikişînim. Xwedê nîşan mede. (*Dikene*).

(*Vê demê Narê û Xezal kene-ken têne dikê. Her çar hevdu hiz kirî, dilekî pir kamçû, hevdu maç dikin, hemêz dikin. Dengê kenê wan bilind dibe. Narê cem Nado dîvanêda rûdinê. Xezal û Kerem krêsloda rûdinên. Ew jî hevdura kene-ken diaxivin*).

Xezal – (*Çavê Narê dinihêre, nerm dikene*). Xûşka mine bê sebire, bê tawet. (*Navbirî*). Ne te boynet demeke waye şîrîne, arxanî hindik dima dinê xirav bikî. Te roj, şev “Nado”, “Nado” digot. Kanê, kuye, kuda çûye, çima qet kivş nabe?! Dinê, alem beravî ser serê me dikir. De îdî keremke, destpêkê hetanî nika çi qewimîye, çi bûye, çi xwestekên te hene, tewî jêra şîrîn-şîrîn qal bike. Demên waye arxanî zû-zû nakevine destê we. Tişteki îdî bin berêda mehêle.

(*Kerem tevî axavtina Xezalê dibe*).

Kerem – (*Vedibîşire*). Narê can, xûşka mine bê bawere, bê sebîr. Serê bavokim, Xezal rast dibêje. Bextê teme. Dilê xwe heta kutasîê veke, şûrê xwe rast, çep bide xebatê. Tu tişteki paşda nehêvşîne. Ji aliyê minda arxayîn be. Min nema te îdî daye Nado. Ew haj hemûyî heye: çi qewimîye, çi bûye. “Dem, dema teye, xirebend jî xatya teye”. De, bi xatirê we. Çawa dixwazin, usan bikin. (*Dikene, destê Xezalê digre*). Bimînin silamet. Em çûn.

(*Xezal û Kerem ji dikê diçin. Nado û Narê tenê dimînin*).

Nado – (*Dengekî heyîrîyî, birçî, Narê hemêz dike, hevdu maç dîkin*). Delala min, dilê teda çi heye, gişkî arxanî bêje. Ez tuye îdî tenêne. Hêrsa xwe hevsa xweda xweyke. Bêje, wekî dilê te rihet bibe. Gilîê xweyî dawîê jî veneşêre. Ezî av-danê xweva bi dil û canî hîvya teme. Te dibihêm. Çawa dibêjî, ezî hazirim. Xwedê pêştir, ne tu kesî fedî dikim, ne jî ditirsim. Ev serîye, ev oxire. Emirke, ez biqedînim! (*Dîsa hevdu hemêz dîkin*). Bêjî rabe, ezê rabim, bêjî rûnê, ezê rûnê. Lê, bêjî here, welleh, ez naçim! (*Dikene*). Em gerekê xwexwa bextê xwe safî bikin. Hîvya tu kesî jî mesekinin. Kesekê usanî Xwedê hezê jî peyda nebe, wekî destê me têke destê hevdu, “wera oxirbe” bêje. Em gerekê serê xwe hildin, yek car ji wî welatî dûrkevin. Rya here heqe rast eve. Hîvya qîrarê teme.

Narê – (*Çavê Nado dinihêre, dengekî kasil*). Nado can, min qîrarê xweyî kutasîê nemêda nivisî. Qîrarê duda îdî nikare biqewime. Dilê te çawan dixwaze, usan jî bike. Min îzna xwe spartye te. Bêjî em herin, ezê berî te hazir bim. Bêjî sebir bike, ezê sebir bikim. Ezê tevî te herime wî serê dinê jî. Bila her tişt bi dilê te be. Ez kîderê jî tevî te bimînim, ezê xwe bextewara dinêye here hetev hesav bikim. Îdî ne ji kuştinê, ne jî tiştên din natirsim. Şikir Xwedê! Kes nikare bêje ew hevseneê kengê bê? Hatînê jî wê çawa bê? Kor bê, topal bê? Ewê jî Xwedê dizane. Min gotye: “Ya ezê bibime qîsmetê te, yanê jî bivime qîsmetê ax-berê sar”. (*Dixwaze rabe. Nado destê wê digire, berbi xwe kaş dike. Hevdu hemêz dîkin*).

Nado – (*Dikene*). Qîzê, min ev culet qet ji te bawer nedikir. Tu ji min qoçaxtirî. Berya gotî: “Ya dest dike, dê-bav nakin”. “Yan mirin, yan kirin!” De, wekî tuye usane hazirî, arxayîn be, îzna Xwedê, ez tuê şeveqa sibêye zêrîn li mala me safî bikin. Qet tu şayîşa mekişîne. Xwedê yek, gotin yek! “Ev

serîye, ev oxire”. De here îdî rind-rind karê xweyî rêwîtiê bike. (*Dikene*). Sîlahekê jî hilde. Kal-bava gotye: “Rewî gerekê rêda be, destê wî kirinêda be”. (*Herd hevdu dîsa hemêz dîkin, dikê diçin*).

(*Bedir, Beso têne dikê, dîvanêda rûdinên. Bedir valî-walî dinihêre*).

Bedir – (*Hêdî*). Keçê, keçê, hela here teselîa Narê bike. Ez nizanim, ew çima îro berî me ranebûye? Her sibê, ew berî me radibe, hewşê paqîş dike, derî bacîa dinihêre, çayê dafîne, mera çav dike. Lê nika çima kivş nabe? Zû here, teselya wê bike. Bê çi qewimye? Cawê zû bide min. Belkî tiştê lazîm bû.

(*Beso lez dikeve oda Narê. Lê Narê ne nav cîda, ne jî odêda nabîne. Halekî xirabda zû paşda vedigere. Diricîfe. Zimanê wê tê girtinê. Tîrse-tîrs destê xweva banî Bedir dike. Diwawqîne*).

Beso – Êêê, mala bavê te ava be! Narê odêda tunene! Kincên wêye ku herro xwedike, ew jî tunenin! Hela zû were, zû were! Bê ev çi emele?!

(*Bedir direve. Derê oda Narê vedike. Hêrse-hêrs nîvînên wê valî-walî weldigerîne. Bin belgîê wêda kaxetekî piçûkî hev pêçyayî dibîne. Kaxet lez herif-herif hêdî-hêdî dixwîne: “Bavo can. Te nexwest bextê min bi xwestina dilê min safî bikî. Zef te razîme. Îdî arxayîn be. Min bextê xwe bi destê xwe tewî Nadoê dersdar hel kir. De bi xatirê te. Bimînin silamet. Min negere!”*).

Bedir – (*Dengekî bilind ser Besoda diqîre*). Heyvana, qîza heyvana! Îdî dilê te rihet bû?! Çavê te ronik be! Te digot (*devê xwe xar dike*): “Qîze, guneye, sore, zere, ewleda teye! Lez mekeve. Bila xwendina xwe kutake. Paşê çawa dixwazî usan bike...” De were, cawê bide! Te zû-zû navê wî qurumsaxê, nizanim seyê kîjan kulînêye dikişand! (*Navbirî*). “Dersdare,

xortekî hêjaye. Mirovên gund tew hurmeta wî digirin! Nanê wîyî hazirî destê wîdaye". Bisekine, bê ezê nika serê te, serê wê nolî heyvana çawa qut bikim! Gormendîkim, wî çaxî cimaetê bê temaşa min, te!

Beso – (*Hêdî, tirse-tirs*). Mêro, Xwedê te qet qebûl meke, îja min çima dikuji?! Serê min çima qut dikî?! Virda gunê min çîye?! Çima gunê xwe davêjî stuê min?! Ne gune gunê teye! Sebebê vê qewmandinê tenê tuyî! Bi min bûya, qet wa nedibû. Min wextêda tera got, te ez nebihîstim. Te çima Şemo nas nedikir? Kevirê wî serê xwe dixist. Digot: "Cînare, em kal-bavê hevdu nas dikin. Kurê mêrik serekê sîyarane", nizanim çîye, çîye?! Te kirye, tu jî cawê bide! Çima min dikişînî meydanê? Roja ku ez dame te, wê rojêda serê min hate jêkirine. Gunê min stuê bavê min be. Hema ew jî yekî aqilê teda bû. Ez dame te – dînê, qulote! Rast gotine: "Wekî heval heval nebîne, roja wîya reş dimîne".

(*Têmir lez tê dikê. Çavê bavê xwe dinihêre, serê xwe berjêr dike, dikeve nav mitala*).

Bedir – (*Hêrse-hêrs*). Kuro, lao, te dît? Çepela xûşka te, zimanê min jî nagre xûşka te bêjim, nava êla giranda çi tiştekî nebûyî anî serê min, te?! Wê em kirne pînekî enîşka... De were vî derdî bikişîne?! Bê tuê çawa bikişînî? Vê bênamûsîê şûnva emê nava êlêda çawa serê xwe bilindkin?! Çavê xasa, nexasa binihêrin?! Na, na!!! (*Navbirî*). Ezê nikaribim vê bênamûsîê bikişînim! Ax, ax! Ewleda xirav! Te çi anî serê min! Welleh, dilê minê biteqe!

Têmir – (*Dengekî nizim*). Bavo can, qet usan gelekî fikra meke. Bê wê jî dilê teyî nexweşe. Boynet xwîna bilind tu temam salê nexaşxana, ber derê doxtira digerî. Çûye, bila cehmêda here, hevt kevir jî dû wê bin! Îdî wê çawa ewlêda xwe yek car

ji dilê xwe derxe. Tûyî ser wê bike. (*Berxweda*). Xwedê min wêra Kerîme. Usan bizani be, îdî wî navî da ewleda te qet tune bûye. Ne tu timê Xwedê Kerîme, Xwedê Kerîme dibêjî. Nika jî Xwedê Kerîme bêje. (*Navbirî*). (*Dîsa berxweda*). Xwedê min wêra jî Kerîme. Min kengê kir, ewê wê demê bizanbe ez kîme. Wê min rind-rind nas bike.

Çend roj dibuhurin. Rojekê Têmir nav gundda xortekî devbelara pev diçe. Êvarê Elîyê nemam kurê xwe hildide, tê ber derê Bedir.

Eliyê neman – (*Têmir dinihêre, dengê hucet*). Kuro, lao, wekî tuyî ewqasî qoçaxî, gurxenêqî, mesîgirî, kê destê te girtî? Maşella, tuyî ducara weke minî. Here boy namûsa xûşka xwe mêtantî bike. Ne ku serê kurê minî bê guneyî, pênc sala xwe çûktir bişkênî! Qeweta xwe ser me diceribînî?! Welleh Ezîm, bille Kerîm, ezî dewsa we bûma, minê bin şevêda, dizî cimaeta gund, serê xwe hilda ji vî gundî birevyama. Biçûyama cîkî usan, ne kesî ez naskirama, ne jî min xwe nîşanî kesekî nas kirî dida! Here heyfa xûşka xwe bistîne! Bila êl tera "eferim, eferim"- bêje!

(*Têmir tivingê tûşî wî dike, dixwaze bikuje. Bedir tivingê destê wî digire*).

Bedir – (*Halekî xirabda*). Lao, çi rast raste. Çima dixwazî mêrik bukuji? Naka jî min têkî xwedan neyar. Derdekî li min têkî duda, erê?! Dû van ten-nîça wê xeberdanê îdî jîna me kêra lazime?! Eger mêtantya te heye, dixwazî tim serbilind bigerî, here heyfa xwe ji wî seê kurê sa bistîne. Bila tew pêş te serê xwe xwar bikin, pate bidin, sed carî "eferim, eferim" bêjin.

Ew nebe, ji gund derketina me îdî ferze. Em nikarin vî gundîda bijîn.

Têmir çend roja şûnda sibekê zû radibe, berbi nehîya Nado têda dijî, diçe. Nîvro digihîje oxura xwe. Mala bavê Nado dibîne. Wê demê hewşa mala bavê Nadoda deweta Nado û Narê lêdikeve. Stranbêj kilama Evdalê Zeynikê “Gulê merûmê” distirê. Ev oda Narê dibîne, nişkeva dêrî vedike, dikeve hundur. Narê kincê bûktanîye sipîda dîvanêda rûniştîye. Ew ku Têmir dibîne, dike wîrîqînî, berbi wî direve, xwe davêje hemêza wî.

Narê – (*Dengekî eşqî, zelal*). Xûşka te qurbana tebe, tu hatî?! Ev çend rojin çavê min rya teye! Min dizanibû tuê bêy, xûşka xwe nav vê êla xerîbda tenê nahêlî. (*Dîsa wî hemêz dike, maç dike. Têmir hemêza xweda nişkêva xençerûkê dilê wêda çik dike*).

Narê – (*Çavê wî dinihêre, dengekî zelûlî, şewat*). Of, bê însaf! Te çima nehîşt, ez mirazê xwe şa bibim?! (*Dibêje, hêdî-hêdî dinya xwe diguheze. Xemla bûktanîye çîl-sipî elbêra nav xwînêda gevez dibe*).

Berbû – (*Şa-şa dikeve oda Narê. Ku vê ecêbê dibîne, direve devra. Dengekî bilind diqîre*). Hewar! Hewar! Zû bikin! Zû bikin! Werin! Werin! Xortekî nenas Narê kuşt! Werin! Bigirin! Bigirin! Mehêlin, wê bireve!

Xêla mirovên dewetê tijî oda Narê dibin. Dengê defê û sazbanda elbêra tê birîne. Bin mûsîqa zelûlda perde

hêdî-hêdî berjêr dibe. Dik nav tarîstanêda naê xanê. Dengê mûsîqa şînê çiqas diçe bilind dibe. Pişt perdêda kulfetek dengê zelûlî, şewat digêrîne. Ew dayîka Nadoye.

Ezê gora xezala xwe çekim devra, cîkî dûze,
Ter kulîlka daynime ser bahar, havîn, him payîze.
Bila xelqê têlî delal lê bisekin, fathê bide,
Bêjin: hezar rehme tebe, rozgar reşa, bê miraze.

DAWÎ (PROLOG)

Sibeye. Ro îdî bejneke zêdetir bilind bûye. Tîrêjên wêye zêrîne nazik hêdî-hêdî şûna xwe digirin, belayî rûê erdê dibin.

Xêla wedeye îdî hemû karkir ji xewa şîrîn hişyar bûne. Her yek boynet kara xwe lezo-bezo ber bi hêlekê dimeşe.

Dayîk tebyetê libasekî hezar-hezar rengî xemilî li xwe kirye. Kakîna kewa, qibe-qiba bilbila mînanî kakîna dengbêjekî sewdalî esmanê çîkî-zelal hilcinye. Dengê bilûra şivana, hêlê-hêla berxvana, kalîna berxa û mîa, şihîna menekê kihêle zîn-basûd kirye bê sebir, zinge-zinga dengê zengilî nêrîa hebûna valada dîdemeke nebîrkirîye rewş veçêkirine. Nêzîkva goristanê gundî xêlekê mezin tê xanê. Kenarê goristan goreke nûye nav kulîlkên reng-rengîda xemilî nolî koşkeke bedewe-cindî tê xanê. Xortekî nazikî, nazenînî, bejin bilindî, simêl reş, cilên şînêye reşe lê, pêş serkelka gorekê sekinye. Pê desmala cêva xweye dor

poxike bi morî, mircanava neqîşandî zû-zû hêsirên xwe paqij dike, çarhewardorê xwe dinihêre. Geh rûdinê, geh radiibe, carcarana jî xar dibe, wenê nav kêvirda cîbûyî dilekî kasilî, şewat maç dike. Destê xwe ser kêvir digêrîne. Derbazî pêş gorê dibe. Wê dubar mêze dike, vedigere cem kêvir.

Ew Nadoye. Hatye Nara xweye delal dubar bibîne, xatirê xwe jê bixwaze. Xêleke xurt wan kirinên xwe diweklîne. Derdora xwe dubar dinihêre. Ji berîka xwe kaxetekî hevpeçayî derdixe. Kaxet vedike, dengê bilindî zelûlî şewat dixwîne. Dike îske-îsk: “Narê can, delala min, bedbexte bêmiraz. Min efû bike. (*Dîsa hêsirên xwe paqij dike*). Erf û edetê gelê meyî kevnîarî wede buhurîyî qirêj, mirovên beyanî, ji dinya nû tu tişt femnekirî, nehîştin em mirazê xwe şa bibin. Qismetê te wede zûtir bû ax-berê sar. Ez bûme teyrekî per-bask şikestîyî, sergerdanî, ji hêlîna xweyî germ dûrketî. Ez bi mirazê meyî şîn girîyî, telî, şewatî nîvcî pêş gora te sond duxum, wekî hetanî dawya emrê xwe nan, av û hewa vî welatî îdî tem nekim. Gişk li min heram be. Îroda ezê serê xwe hildim, terka vî welatî bikim. Berê min têkeve kîjan hêlê, wê hêlêda jî herim. Pîê xwe îdî tucar daneynime ser vê axê. Naême nav mirovên vî welatî. Yekîra ne dostaê bikim, ne jî biaxivim. (*Dubar-dubar xar dibe. Wenê nav kêvirda hesreteke mezinva maç dike, kêvir hemêz dike, kûlîlken ser gorê valî-walî hildide, datîne. Hêsirên xwe paqij dike. Hêdî-hêdî ji gorê dûr dikeve*).

Wê rojêda heya nika mirovên wî gundî nizanin Nado kuda çûye û li kîjan welatîye. Heye yanê tune.

Berya gotye: “Şuxula bê feme destê zorê ku tene kirinê, dawya wan timê dibe poşmanî û mirina bê wede”.

Boynet wê jî ez li vir, vê demê dilekî pir pejmûrî êşyayî hewce dibînim, wekî vê gotina bavpîrên meye bahaqîmet dubar bînime ziman. Çawa şîret, xelat bidime xandevanên xwe, wekî ew vê gotina berîê meye lel-durva hilstrayî pir, pir cara bixwînin. Bê xof û bê tirs, wan bav û dayîkên dilkevire, ji emrê nû tu tişt fem nekirîra, culetekî mezinva gele cara biaxivin, qal bikin, wan bidine femkirinê, wekî ew nav emirda ewledê xwe bedbext û zelûl mekin. Gelek cara xastekê wanra qayîl bibin.

Bila dilî dil be,
Kiras cawê qul be.
Doşik erd be,
Lihêf ewir be.
Balgî kevir be,
Xarin nanê ceh be.
Rojekê hebe,
Hevtekî tune be,
Lê tenê bila dilî, dil be.

BILA DILÎ DILBE

Ez nav emrê xweyî ne ewqasî dirêjî, ne jî ewqasî kinda bûme şihed û tevgelên gelek bûyerên ne bîrkirîye, hime tel, hime şîrîn, hime mezin, hime piç'ûk. Pir caran wan ez kirime pejmûrekî tawet ne hatî. Nav mitalên dil, hinav sotîda mîna avjenekî xwe şaşkirî, nav behra mitalada valî-walî şûşilîme. Dawîê poşman, poşman, westyayî şûna xweda nolî mirovê bêkêr rûniştîme. Tenê neleta Xwedê baîsê sedemkarên bûyerê xirav anye. Kîn, kudereta xwe ser wanda barandye. Pir caran jî boynêt bûyerên qence, şîrîn şabûme, pîrozbaya xwe sedemkarên wan bûyer kiryara şandye. Usan jî bûye, wekî ez şabûna çûme cem wan, destên kal-pîrên wir maç kirye.

Bûyerên baş Xwedê jî jê hizdike. Bende jê qinyat hildidin. Ew bûyerên, ku temelên wan ser qetlê, xwînê têne avakirinê, dawya wan poşmanîke pir mezinva xilaz dibe. Sedemkarên bûyerên qenc rast orta qesreke cinnetêda rûdinên. Her kesê aqil rehmeta Xwedê li dê-bavên wan tîne.

Emir nîşan dide, wekî sedemkarên bûyerên xirav jî bêfemya xwe dikevne bin wî barê giranî nekişandî. Ew dawya wan bûyera nabînin, kirinên xwe ewil-ewil naînine ber ç'evên xwe. Hilnadin, danayînin, napîvin. Gendî gele diqedînin, xwe û ewledên xwe bi ç'evên korva davêjne nav agirê cehenemeyî şewatî, netemirî. Ew têda dişewitin, dibine rijî, nezanî, bêfemî, merezeke usane, wekî tu loxman, tebîb nikarin wê qenc bikin.

Dermanê wê tu cî peyda nabe. Mirovên zane kirinê xwe ewil-ewil tînine ber ç'evên xwe. Xêr, şera xwe dipîvin, dibînin, paşê diqedînin. Bûyerên qenc lel-dur bahatirin.

Xwendevanên mine delal! Min hûn hinekî westandin, ji armanca esas dûrketim. Ew jî behra agir, alava nav dilê mindaye. Loma usane kele-bîne, vanapsire. Nika ez dixwazim armanca, ku min nerehet dike, hûrgilî wera qal bikim.

Nav emirda her mirovekî qenc, xirab, pir-hindik çend-çend dost û hogirên wî dibin merîê bê dost, hogir, teyrê per-bask şikestîye. Çend hogir û dostên min jî hebûn û hene. Cem min her yekî şûn û sira wî hebû, heye ji wan gişka evzeltir. Dostekî min hebû. Sed heyf, dinya xwe guhastye. Me qedrê hevdu gelekî digirt. Çawa kal-bava gotye, "Nivîna meye şevêye hevdu cuda bû". Nolî min çend ewledên wî hebûn. Rojekê qasidek şandye cem min, ez banî şaya keç'a xwe kirim. Ez çûm. Piştî xoş-bêşê şûnva em derketine hewşa wî. Navê dostê min Reşîd bû. Min çawa destmikerim tenê pirsek daê:

- Bira, lê xînamîê te kîye?

Wî kene-ken ç'evê min nihêrî, got:

- Xînamîê min dîr menihêre, nêzîk binihêre. Xidirê biraî mine.

- Lê te keç'a xwera xeberdaye, ewê vê meselêye razîye yanê na?

Wî xêleke xurt ç'evê min nihêrî, qulapek cixara xwe da. Dengekî nerm kenya, got:

- Barîê bira, rehmeta Xwedê bav, dya tebe! Ça ku te lap hişê xwe unda kirye, - kenya. - Ew çi tiştê tezene tu ji xwe derdixî? Berya gotye: "Qîz sebeta gemarêye. Kê pişta

xwe da ber, “na” nebêje, zû bide piştê. Para holke, bidefine, bira here”. Kurin, keç’in, mezin bûne. Şikir Xwedê, gelekî. Gişka wedê wanî zewacêye. Wekî ez ber wan bixelim, bicelim, ber nazên wan bilîzim, ewê heta dawya emrê xwe bê jin, bê mêr bimînin. Ezê deynê xweyî bavtîê biqedînim. Paşwextîê ew çawa dixwazin, bira usan bikin. Tu ezê herim, lavaya wana bikim, bêjim: “Lawên min, aqil bin, hevdu hizbikin, hevdura rê herin”? Heta wî çaxî gorêda hestûê minê bibine xwelî. Kur, bavê wan çawa dixwazin, bila usan jî bikin. Çawa dixwazin, bila usan bijîn. Çima bavê te, bavê min em bi xwestina dilê me zewicandin, erê? Wekî ez jî wan bi xwestina dilê wan bizewicînim, ya me, kurda, kete bere. Kî hat, em gerekê erfedetên kal-bavên xweyî lel-durî, zêrîn qet bîr mekin. Ne jî miqabilî wan derên. Wan çawa kirye, eme jî mecbûrin usan bikin. Ev keç’a mine xase, merî malê xweyî xas nade xelqê.

Piştî vê xebardana Reşîd dawya vê zewaca bê dile, bê bingeye nolî bendikê fistoqê minva nolî neynikê zelal hate xanê. Çumku pêlên wê zewaca bêdile zexm hine pismamên min jî ketibû.

Me dewet bi ken, henek, eşq, şa, hêlê-hêleke pir bilindva derbaz kir. Bûk verêkire mala xezûrê wê. Ez jî nolî tew tevgelên dewetê vegeryame mala xwe. Lê dilê min tijî mitale û xuşûş bibû. Ezî gelekî ji vê bazara hevalê xweyî neqayîl bûm, nerazî bûm. Lê min nikaribû dilê xwe hetanî dawîê jêra vekira. Çumku îdî bûyî bibû. Çûyî jî çûbû. Diqewimî gotinên min qet xaşa wî nehatana. Min nexwest, wekî dilê wî ji min bimîne.

Wedekî ewqasî jî dirêj derbaz nebû, ez dîsa çûme mala Reşîd. Berê çiqasî diçûme mala Reşîd, Xidir elbêra dihate

cem min. Min jî gelekî qedrê Xidir digirt. Ew ber ç’evên min, Reşîd mezin bibû. Wê jî bêjim: Reşîd û Xidir birane pir hevdu hizkirî bûn, bê hevdu parî nan nedikirine devê xwe. Îjar min Xidir nedît. Nehat. Sivre hate danînê. Xidir nehate xanê. Dema nanxwarinê min ber xwe neda, got:

- Kuro, Reşîd, Xidir kuda çûye? Çima qet kivş nabe? Yeqînî ney male? Yanê jî nexweşe? Welleh, sibêda ç’evên min li rya wîda qerimîne, dîsa jî kivş nabe.

Reşîd nav mitalada ç’evê min nihêrî. Kesereke kûr kişand, got:

- Bira, nanê xwe rehet buxwe. Ezê tera her tiştî bêjim.

Sivre hate beravkirinê. Wî milê min girt, em derketne hewşê. Wî posîde-posîde ç’evên min nihêrî, dengekî merhemetî nizimva got:

- Barîê bira, min bi destî xwe mala xwe xirav kirye. Te got, min tu nebihîstî. Ev xêlê wedeye Xidir ji min xeyîdye, minra xebarnade. Naê mala min, naçe. Keç’ik, gede hevdu nabine xweyî. Ev çend carin keç’ik serê xwe hildide tê mal. Ez her car wê kutayî-kutayî didime pêşya xwe, dibim mala Xidir, dihêlim, têm. Ew berî min vedigere tê mal. Rast bêjî, ez îdî westyame. Lap bêzorîme, qet nizanim axirîê çawa bibe. Wê dya xwera gotye: “Em nikarin rûên hevdu, ç’evên hevdu binihêrin. Heta duh, pêr em çawa xûşk, biraê hevdu nav cîkîda radizan. Em xwe dîsa xûşk û bira nasdikin”. Ez metel mame, qet nizanim, çawa bikim. Dilê xwe kêra vekim, wekî qet nebe hinekî xema sivik bibim. Min wê rojê banî wê kir, gotê: “Qîza min, aqilê xwe beravî serê xweke, here mala apê xweda rehet

rûnê. Qulixa xezûr, xasya xweda bisekine. Kurê apê xwe hiz bike. Bila ew jî te hiz bike”. Wê vekirî got: “Bavo, rûnê min bin pê tebe, ez û ew heta îro çawa xûşk, bira hesav dikin. Em şerma rûnê hevdu nanihêrin. Car-caranê ew dîsa nolî berê minra “xûşka min” dibêje, ez jî “birako” dibêjim. Ez îdî bimrim jî, venagerime wira. Hizdikî vê deqîqê rabe, min bikuje”. Got, girya, hîşt çû. Ez hêrs bûm, gotê: “Tu bimrî, ya erdêyî! Bimînî, şûna te mala apê teye!” Ew çûnê şûnva welleh ez jî kelogirî bûm. Lê neç’arim! Ev çend rojin min ew dîsa birye mala Xidir. Hela ku tu denghis tunenin. Xwedê dawî xêrke. Min serê xwe kirye cuherekî valayî usanî teng. Dikim, nakim nikarim jê derxim. Berya rast gotye: “Aqilê sivik barê girane”.

Pişti vê xeberdanê min tûşe-tûş Reşîd nihêrî. Dît, ew mêrê nolanî ç’yakî nava wedekî kinda usan mehekîe, lap bûye pûnckekî. Nedihate naskirinê. Cixare ser cixara vêdixistin, netika xwe mizdida, giran-giran bîna xwe dikişand.

Ev halê wî ser min hukmekî giran hîşt. Min dilekî êşyayî gotê:

- Bira, îdî çi bûye bûye. Ez naxwazim ka kevin bidime bê. Hûn biraên hevdune. Dîsa rûnên, hevdu bişêwirin. Hevûu xeydandinê tu xêr dernaê. Werne ser qirarekî. Rya edlayê bijbêrin. Bila dawî nebe poşmanîke ne bûyî.

Ez halekî dilêşyayî ji Reşîd qetyam. Lê ew halê wî qet ber ç’evên min wêda nediçû.

Çend roj derbaz bûbûn. Kewkewa sivekêda derê me hatye kutanê. Min zû derî vekir. Kurê Reşîdî mezin Rizalî ber dêrî sekinî bû. Min ç’evê xwe bawer nekir. Wî çawa ez dîtîm,

bilind kire kûranî, xwe avîte hemêza min. Kire kûre-kûr, girya. Hindik ma dilê min bisekine. Wê deqîqê Reşîd hate ber ç’evên min. Nav tirsêda zû-zû jê pirsî:

- Kuro, çi qewimye? Çi bûye? Bavê teyî saxe?

Wî hêsrên xwe paqij kirin, got:

- Apo, Xezala xûşka min duh xwe gomêda dardakirye. Mirovên dewletê tijî him mala me, him mala apê Xidir bûne. Bavo got: here, zû cawê bide apê xweyî Barî. Bila mesekine, zû bê.

Dîsa kire kûre-kûr, girya.

Ez çûm...

Lê min ber ç’evên xwe ecêbeke ser ecêba dît. Malên wan cînarên hev bûn. Cimaet usan tijî ber derê herd mala bûbû, te xwelî bavîta hewaê, erdê nediket. Ji dengê girî, wêlewêla cimaetê tu tişt nedihate bihîstinê. Porê merya şûjîn-sûjinî dibû. Min halekî pir giranda xwe Reşîdra gîhand. Ew destê jorê posîde-posîde pêş cinyazê Xezalê rûniştibû. Cixare ser cixara dikişandin. Zû-zû netika xwe mizdida. Keserên kûr dikişandin. Du mirovên organê ew didane xeberdanê.

Wî ku ez dîtîm, bilind kire îskînî. Dengekî êşî, keder got:

- Biraê minî delal, tu hatî?! Wekî min vê rojêda bibînî, erê?!

Nêzikî wî bûm. Me hevdu hemêz kir. Me herda jî hêsrên xwe paqij kirin. Mirovên organê (mîlîsîa) hevpeywandina xwe tevî Reşîd kutakirin, çûn. Min îdî tu tişt Reşîd nepirsî. Her tişt eyan bû!

Nişkêva Xidir berbi min hate xanê. Hêsrên xwe paqij kirin. Xwest min hemêzke. Min fikra xwe nedaê. Wî dîsa zû-zû hêsrên xwe paqij kirin. Dengekî zelûlî, pir poşman got:

- Bira, tu dibînî, çi yeke nebûyî hatye serê me?!
Min qet dengê xwe nekir. Tenê bi awirên tûjva ew mêze
dikir.

Me bêmiraz bin ax kir.

Dîwanê şuxulê xwe qedand. Lê...

Du biraên hevhezîkirî hevdura bûne neyar.

Du ciwan bûne bedbext.

Yek wede zûtir çû ax-berê sar.

Yek jî bû girtî girtîgehayî çendik-çend sala.

Loma jî ev weyseta kal û bava qet gerekê neê bîr kirinê.

Wan zaravî zelal gotye: "Tu ku dixwazî şuxulekî bikî, lez
mekeve, sed carî hilde, dayne, bipîve, bikişîne, bişêwire, xêr
û şera xwe bîne ber ç'evên xwe, weke hevdu bike û kîjan tera
xêre, wê xwera hilde. Wekî paşwextîêda tu poşmanîê mekişînî".

Ez çawa rewşenbîrekî kurdî her cûre rûê dinê dîtî, rûspî,
dersdar û helbestvan, îzna min heye dilekî pir keserî, êşî, jan
berbîrî hemû bav û dayîkên gelê xweyî xwedî ewledên bermiraz
bibim, ji wan hîvî, minnet, rica û îltimas bikim, wekî îdî deme
dengê min û dengê dilê ewledên xwe baş bibihên. Gelek pirsada
ewledên xwera qayîl bibin, îlahî mesela zewacêda. Nebine dilê
erf û edetên wedê derbazbûyîye, qirêje, kevnîar, kîjan ku timê
bêhna xwînê, şîn-girî jê tê.

Dema zewaca ewledên xweda hinekî kûr, dûr bifikirin. Ji
şemîka mala xwe hevekî dûr herin. Vê meselêda gelê qazax û
çêçên rêke kardare herebaş bijartine. Qazax hevt bava dijbêrin,
paşê dizewicin. Çêçên pêş navê xwe dûr dizewicin. Wan ev
edeta zûda dûrî xwe xistine. Ne ew jî musulmanin! Ulmê doxtirî
zûda îzbat kirye, wekî keç' û xort çiqasî hevdu dûr bizewicin,
ewqasî ewledên wan aqil, saxlem, bedew û berbiç'ev dibin.
Çumku xwîn tê guhastinê.

Bi zanebûn û dîtina min, çiqas zarokên kestek
(annormal) hene, selefa herebilind behra wê zewaca bê feme,
bê mitalekirîye. Kesî ew rusqeta nedaye min, wekî ez bê serî
xwe, miqabilî erf û edetên gelê xweyî lel-durî û cewahir yekser
derêm. Lê hine edet hene gerekê ew îdî ji mejûê gel bêne
derxistinê. Ew bersiva emrê nû nadin. Erf û edet, dîrok û çanda
gele zêrîne. Gel pê wê tê naskirinê. Ez bi culetekî mêranîyî
bê xofî, bê tirs miqabilî wî edetî dertêm, kîjan ku keç'mam û
kurmam hevdura dizewicînin yanê jî pismamên here nêzîk. Vî
cûreyî belengaz û bedbext dîkin.

Dilekî keserî, êş dibê: "Gelî dayîk û bava! Bese, bese
nisla meye dûhatî bi destî hine mirovên nezane, bê fem bê
seqetkîrinê!"

Bawerim, wekî gelê minê vê rica minra qayîl bibe,
yekdengî bibe piştovanê min. Wê halê Reşîd û Xidir bînine ber
ç'evên xwe. Û wê rezîlîê dubar nakin.

EZ Û KEVOKÊ TENÊ

Dema ku şerê Qerebaxa ç'ya navbera azêrya û ermenyada destpê bû, girêdayî gelek bûyerên ç'ûk û mezine neeyanva ez mecbûr bûm, wekî ji Rêspûblîka Ermenîstanê derê û cîguhastî welatekî cuda bibim. Piştî xêlê çetinayên girane, nebîrkirî hatime Rêspûblîka Azîrbêcanê. Bajarê Bekûê avayîkî duqatêyî kevirîda mala xwe cîwar kir. Pêş avayî perç'ek erdê vala hebû. Bineliê wê taxê her cûre qirêj û gemarên malê xwe davîtnê wir. Rojê dest bîn-boxê, vizîna mêş û moza, şev jî dengê ewte-ewta kelbên kolanaye havî... Jîyan çiqas diçû, ewqasî giran dibû.

Rojekê, çawa dibêjin, min dil-dînê xwe tev anî. Çûme cem cînarên xweye hela ku minra nenas bûn. Wan hîvî kir, wekî ew îdî qirêj û gemara navêjne wir. Wan hîvîkirina min gelekî hurmeteke başva qebûl kirin. Nav wedekî kinda min û malxweya xwe Dîlbera Bala ew perç'a ji gemar û qirêjê paqij kir. Dora wî toreke (sêtkî) hesinî kişand. Derwazekî ewqasî jî ne mezin danî. Rex avayîra lûla avêye mezin derbaz dibû. Ji wê hinek av kişande ber mala xwe. Me erd kola, hazirî çandinya baharê kir.

Rojên baharê hatin.

Hema destpêbûna wan rojada me cûre-cûre (her çandinekî hinek) kûltûrên xwarinê û yêd mayîn reşandin. Xêlê kolên kulîlkên reng-reng û çend darikên mîwecat jî nikandin. Eyane, wekî bahara bajarê Bekûê gelekî zû tê. Pir xweş derbaz dibe. Nîvbaharêda çandinî şîn bûn. Hêdî-hêdî perê xwe ser erdê

raxistin. Kulîlka nolanî xalîçeke (malxweya min kulîlka pir hizdikir) destê çêkirîke merîfete, pîrzane derketî ew pirtîê erdê nav qirêj, gemarêda unda bûn. Çendik-çend rengên tebyetêva xemilandin. Dara rehê xwe adilandin. Berê ç'iqlê wan bişkok dan. Paşê kulîlk dan. Me çend kolên sorgula jî nikandibûn. Wan jî wedê xweda dêmê xweyî bedew dane kivşê.

Rojekê ez û malxweya xwe ser dîwana hewşêda rûniştibûn. Me dît bin berç'ikên sorgulêda du kevok melisîne. Nolanî du maşoqên zûda hevdu nedîtî ber hevdu dilîzyan. Nukulên xweva hevdu mehez dikirin. Geh dûhev dimeşyan, geh jî qirikên xwe evraz dikirin. Dikirne qinge-qing. Carana jî ser stuê xwe para vedigeryan, tirse-tirs me dinihêrîn. Çawa bêjî, dixwestin ji me hîvî bikin, wekî em destê xwe nedne wan, hevdu meqetînin, îznê bidin bila mirazê xwe şa bibin.

Wê dîdema wan ser dilê min hukmekî pir giranî nebîrkirî hîşt. Elbêra rojêd mine xortîê nolanî lênta kînoê ber ç'evên minra hêdî-hêdî derbaz bûn. Bixwazî-mexwazî min destpê kirin wan hizbikim, wê dîdema wan herro temaşekim.

Min rehmetîê hîvî kir, wekî kulme qût û fêraqeke piç'ûkda fire av nêzîkî wan dayne. Wê xwesteka min elbêra qedand.

Wê rojêda destpê bû hîmê dost û hevaltya me û kevoka hate danînê. Wê her sibe zû berî hatina kevoka qût û av dadanî bin kola sorgulê. Kevok dihatin, qût û av dixwarin, vedixwarin. Hetanî êvarê nolî her roj hevdura henek dikirin. Dilîstin. Dû hevdu diketin. Êvarê dilekî eşqî, şa berbi êwira xwe difiryan.

Du sala me û wan bahar, havîn û payîz bi vî cûrê dostaê tevî hevdu derbaz kir. Demsala baharêye sala sisya hat. Xwezila qet mehata.

Kevok dîsa bûne mêvanê me. Wê însana destemele, paqije, dilo van dîsa destbî xizmeta xwe salên buhurî kir. Çend rojên baharêye şîrîne, eşq, bêqezya buhurîn.

Êvarekê em û zarokên me dora sifra şîvê rûniştibûn, eşq û ken şîva xwe dikir. Nişkêva qezyake şewate nebîrkirî hate serê min. Cîê sekinî xwîna malxweya min bilind bû. Gihîste halê mirinê. Gazî çend heqîm û loxmanên pir zane kir. Ew pir çerçîrîn, lê yazix nikaribûn wê ji wî halê mirinê derxin. Melekê Mewtê bê îsafî, bannekirî ew ji destê me derxist. Wê çilhevt salya xweda berhêwan dinya xwe guhast. Ez û herdu lawên xwe – Elî û Anarê hela ku hewceyî mehezê destên dayîkê bûn, sêwî hîştin.

Çend rojên şîn û şepûlêye tele, giran buhurîn. Îdî kevok bîra min derketibûn. Sibekê ez dîsa ser dîwana hewşêda rûniştibûm. Nişkêva kola sorgulê kete ber ç’evên min. Dît – bin kolêda kevokekî tenê melisye, stuê xwe hêla minda xar kirye, feqîr-feqîr min dinihêre.

Elbêra dinya min hate guhastinê. Xêleke xurt ketime nav mitalên tele, şewate bê serobine ruhkuji. Min dîsa qût û av danî ber wî. Lê wî qût û avê qet nenihêrî. Min nihêrî – stuê xwe xar kir, ç’evên xwe girtin. Mîna mirovekî pir kul û merez, nav behra mitala bû. Çawa bêjî, ji min rica dikir, wekî ez hinekî wî bibihêrî, têkevme nav dilê wî, halê wî bipirsim. Bibime hemdemê wî.

Her sibe, berî ro derketinê dihat. Min qût û av nêzîkî wî dadanî. Ew gelek cara qet ji min nedirevî. Qût û avê qet nedinihêrî. Hetanî êvarê bin belç’ikên kola sorgulêda dimelisî. Car-carana ç’evê xwe vedikir, der-dorê xwe û min dinihêrî û dîsa ç’evên xwe digirt, dikete nav behra mitala. Ez û ew îdî bibûne hemderdên hevduye here nêzîk.

Min tê derxist, wekî wî ji mîna min hevala xweye emir unda kirye. Loma usan hundurê xweda dişewite, dikewgire, dihele. Dixwaze dilê xwe minra veke seva agirê dilê wî vêse. Kul û desrê xwe qal bike. Lê sed yazix – ne min zimanê wî, ne jî wî zimanê min zanibû. Me ax û keserên xweye tele, şewat tenê hevdu nihêrandinêva hevra qal dikir.

Êvarê ew berbi menzîla xwe diçû. Ez jî diketime menzîla xweye bê Dîlberêye vike-valaye sar.

* * *

Hal usan hate guhastinê, wekî ez mecbûr bûm dîsa têkevme rya koçberîê. Min avayê xwe firote mirovekî dem geşî, pir merîfet. Dema barkirinê min kevokê bin kolêda melisî nîşanî wî da. Jê hîvî kir, wekî ew xizmeta me wîra kirye ew jî bikin. Me nomêrê têtêfonê xwe dane hevdu. Ez bê çetînayî Rêspûblîka Qazaxstanê, bajarê Alma-Ataêda cîwar bûm.

Çend rojên xerîbêye ewqasî jî ne giran buhurîn. Min rojekê wî mirovîra têtêfon vekir. Jêra derbara xêlek kêmasî û zêdeyên, ku derketibûn holê, qal kir. Halê kevokê tenê dostê xwe jî pirsî. Wî got:

- Bira, piştî çend rojên çûyîna te şûnva îdî kevok nehate kivşê. Me çawa pêwîst bû jêra xizmet dikir. Çawa bêjî, wî jî nexwest bê te îdî mera hevaltîê bike.

Bê hewce, wê bersiva wî camêrê merîfet ez xêleke xurt posîde kirim, xistime nav mitalên kûr. Min xwexwa xwe rexne kir. Got: “Welleh, min şaşîke pir mezine, nebaxşandî kirye. Dema barkirinê min gerekê ew jî xwera bianya. Boynet xatirê wê îtbar û hevalhizya wîye baha qîmet vir jêra şûneke bedew çêkira. Heta hebû xizmeta wîda bisekinyama”.

Dawîê hatime ser wî qinyatî, wekî Xwedaê mezin dostaî, îtbar û hizkirina bê ç' ilke paqij tenê nekirye qismetê bendê xweye bi hişe, bi zar û ziman. Ew usan jî kirye qismetê hemû bînbêrên xweye bê hişe, bê zar û ziman jî. Her yek wan jî anegorî femkirina xwe dikare hiz bike û hevaltîya şîrîn bîdomînî. Nislê bidin, emrê xwe cîkî derbazkin, hûrikên xwe mezin bikin, firêxin. Deynê xweyî dê û bavtîê biqedînî.

* * *

Ez jî mîna wî kûraya dilê xweda dişewitîm, dihelyam. Nav behra mitalê xilaznebûyîda evraz, berjêr diçûm, dihatim. Dibûme xozneber, avjenê pirzane. Valî-walî dinihêrî, lê delavek nedidît, wekî têra derêm. Ji ax û keserên cansoz sivik bibim. Loma min ev helbesta "Ez û kevokê tenê" rewayî halê xwe û wîyî zelûl kir.

Car-carana ez nêzîkî wî disekinîm û min ev helbest bi dengêkî pejmûr hêdî-hêdî dixwend:

*Hey, kevokê şerpezeyî, birîndar,
Yeqîn te jî unda kirye delal yar.
Were, em tev biaxivin hûre-hûr,
Ax, keserên min û te tîn dilê kûr.*

Wî nolî mirovekî birîndar çawa bêjî dengê min dibihîst, ez femdikirim. Ç'evên min dinihêrî. Cîê xwe nedilipitî. Dawîê dîsa ç'evên xwe digirtin, stuê xwe xar dikir, bin kolêda dimelisya.

Me hemû rojên xwe wa derbaz dikirin. Êvarê ew diçû menzîla xwe, ez jî menzîla xweye valaye sar.

EZ Û KEVOKÊ TENÊ

Hey, kevokê şerpezeyî, birîndar,
Yeqîn te jî unda kirye delal yar.
Were, em tev biaxivin hûre-hûr,
Ax, keserên min û te tîn dilê kûr.

Pir mehele, mekewgire, bese, bes,
Çûn îdî paşda naên meke hes.
Ev telayî min û tera Rebb şandîye,
Ez bi zarim, tu bê zarî, firqî çîye.

Fermana wî me qebûle, deyax bike,
Feyde tune, şîn-şepûlê ewqas meke.
Dîtina me îdî çûye dinya heqe,
Em bengîne, jan û êşên min, te yeke.

Xwezil, xwezil bizanbûya min zarê te,
Veêsanda ew agirê nav dilê te.
Tu hildayî, bibirayî ser axa dê,
Em xilazbûna ji ezabê bê yarîê.

DERHEQA SPONSORÊ VÊ PIRTÛKÊ BAYREM-ELÎÊ DURSUNÊ MELEK DA



Sala 1937-a gundê Vêrtexanê nehya Aspînsîyê Rêspûblîka Gurcistanê hatye dinê. Dema ew tê dinê, bavê wî 103 salî, dayka wî Nena Xidire 57 salî bûye. Kalikê wî nav kurdên Gurcistanêye musulmanda mirovekî navûdengî, pir syanet bûye. Gûbêrnatorê Gurcistanê hatye mala bavê wî mêvan. Wî hespekî kihêl û çend xelatên baha qîmet baxîşandine gûbêrnator.

Dema Gurcistanêda prosêsa kolêktîvîzasîaê pêşda tê, dewlet gundê wanda kolxozê ser milkê bavê wî teşkîl dike. Biraê wî mezin Elîşan dikine sedrê kolxozê. Nîvê avayê wan dikine mekteba gund. Dema şerê cihanêyî duda ku destpê dibe, Elîşan bi hîvîkirina xwe diçe Ordya Sor. Çawa qumandarekî mêrxas pêşenîêda miqabilî faşîstên devxwîn şer dike, bi egîtî şehîd dikeve.

Sê xûşkên Bayrem-Elî hebûne: Çînar, Menemşa û Rosqet. Sala 1944-a mala wan jî bi emrê "Bavê millet" Stalîne devxwîn tevî malbetên kurdên musulmane din ji Rêspûblîka Gurcistanê nefî dîkin. Ew ewil têne oblata Oşê. Çend sala

şûnva têne bajarê Alma-Ataê. Sala 1954-a dibistana gunde hevtsale xilaz dike. Hevde salya xweda tevî Murbeta Silêman dizewice. Dibe bavê çar ewleda: Çînare, Mînare, Begalî, Mîralî.

Sala 1957-a bajarê Alma-Ataêda têxnîkûma hesabdarîê xilaz dike. Çend salên dirêj îdarên cûre-cûreda çawa hesabdarê sereke dişuxule. Ew usan jî sala 1971-ê Ûnîvêrsîtêta marksîzmê-lênînîzmê xilaz dike. Wê salêda destpêkirî hetanî dema derketina rihetîê (pênsîaê) serkarê Agêntstva bajarê Alma-Ataê dişuxule.

Ew kalikekî pir bexteware. Danzdeh nevî û bîst nevîç'irkên wî hene. Ew wan hemûya pir hiz dike. Nika jî bajarê Alma-Ataêda dijî. Nava êlêda xwedîê hurmet û sîyanetêke pir bilinde. Dema nav êlêda problêmeke ne layîq ku pêşda tê, ew zû wir amade dibe, bûyerê bi rya edîlayê hel dike. Rûspîên usane nolî wî gelê meda pir pêwîstin.

Em wîra sehet-qewet, saxlemya bê qezya dixwazin.

BIRAÊ MINÎ HÊJA

Berya mera hîştîye milkek,
Xezna tijî, gir-hûr gelek.
Gîha reha xwe şîn dibe,
Esilda xas unda nabe.

Xulam wekî bibe axa,
Wê nemeşe wek maqûla.
Eslê wîda ew reh tune,
Xêr dest naên xênî gune.

Axa tucar nabe milûk,
Cîda gire, nabe piç'ûk.
Kêr-kirnên wî başin, rindin,
Tew kêlmên wî hingiv, qendin.

Çiqasî bête ba û tofan,
Teyroka sar, berf û baran,
Ç'ya şûnê naguhêze,
Dara bête nade reze.

Bira, eslê te eyane,
Tu firq dibî ji tewane.
Çendik-çend sal bête û herin,
Mêr navê xwe naguherin.
Lawê Dursun, tornê Melek,
Sed sal boy te nebe gelek.

Bariê Bala.

NAVEROK

<i>Çend gilî derheqa xudan û efrandinê wîda (Nûrê Serdaryan)</i>	3
--	---

POÊZÎA

WETENHIZÎ

Ya Rebbê Jor	10
Helbestvan kîye	11
Ax, ax, bê welatî	12
Welatê dê	13
Merivê dinê, rica dikim, hemû werin!	14
Xwezil, xwezil	16
Welatê dê. Dihoka rengîn	17
Mirovên dinê	19
Dayîk	22
Dayîk, tu welatî	23

LÎRÎKA

Bedewa pir xwerazî	24
Ha Gulê	26
Bedewa, bedewa	27
Barana dev bahar	28
Tu ji gulê bedewtirî	30

Were cem min	32
Xilaz nabim ji mitala	34
Nazika bedew	35
Bedew, milahîmî, lel û dure	36
Berfa bê dem hatî	37

REWAKIRIN

Ezîzê Zîo	39
Eylazê Mehemedê Ûsivê Biro	41
Slêmanê Rostemê Hetemaî	42
Elî, kurê	43
Nûrê xanim	44
Loxmana hêja	45
Kek Nadir, zane, eyan	46
Dayka hêja – Helîma Emo	48
Ahmedê Hepo	50
Elîê Mehemedê Îbo	52
Tahirê Slêman	53
Ber gora serokê nemir	55
Qadirê kalko	57
Norhanê kalko	59
Medîna kalko	60
Celîlê piç'ûk	61
Farîz Fortûna	62
Mêvanên delal	65

ÇARXET.....66

POÊMA "ZERDEŞTÊ KAL".....70

FOLKLOR (7 BÛYER)

Bûyera I 79

Bûyera II..... 84

Bûyera III 92

Bûyera IV 97

Bûyera V..... 100

Bûyera VI 103

Bûyera VII..... 105

ŞÎRETNAME.....107

BOYNET ZAROKA

Hirç'ika min114

Kurik û qeşav115

Gul û Gulçîn.....117

NIVÎSARA VEKIRÎ

✓ Nado û Narê 120

✓ Bila dilî dilbe..... 166

Ez û kevokê tenê 174

Derheqa sponsorda..... 181

*Ez vê pirtûka xwe rewayî
ruhê biraê xwe EHMED
û herdu kurmamên xwe
EVDILÊ RZGO û TÎTALÊ TEÎFÛR dikim.*


BARÎÊ BALA
ZERDEŞTÊ KAL
(POÊZÎA Û NIVÎSARA VEKIRÎ)

ԲԱՐԻԵ ԲԱԼԱ
ԾԵՐ ԶՐԱԴԱՇՏՈՐ
(ՉԱՓԱԾՈՆ ԵՎ ԱՐՁԱԿ)

БАРИЕ БАЛА
СТАРЕЦ ЗАРДАШТ
(ПОЭЗИЯ И ПРОЗА)

Размер: 60x84, 1/16: Объем 11.75 п. л:

Отпечатано в типографии ООО "ВМВ-ПРИНТ"
Адрес: Ереван, пр. Азатутян 24/11, тел.: (+374 10) 28 54 28
E-mail: vmv_print@yahoo.com
www.vmv-print.am



PDF:

Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê

Web:

<https://www.ensiklopediyakurdi.com/>

Tel.:

+7 918 073 48 79

